Zeynel Abidîn Han

# Dîroka Felsefe

# I



Institut kurde de Paris

## Felsefeya Serdema Seretayî

## Ji Zeradeşt heta Demokrîtos

WeşanSORAN

Rêza pirtûkên felsefî-1

Institut kurde de Paris

Zeynel Abidîn Han

# Dîroka Felsefe - I

## *Felsefeya Serdema Seretayî*

*Ji Zeradeşt heta Demokrîtos*

Institut kurde de Paris

Weşan SORAN

**Zeynel Abidîn Han**
Dîroka Felsefe - I *Felsefeya Serdema Seretayî*
*Ji Zeradeşt heta Demokrîtos*

*Rêza Pirtûkên Felsefî - 1*
© Weşanên SORAN
Çapa 1.
Berlin / 21 Adar- 2016
Berg Design: Gazîn Han

Çap û Girêdan:
Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlin

zeynelabidinhan@hotmail.com

ISBN: 978-3-945956-11-3

Institut kurde de Paris

*Ji bi dayka min, dilsoza Kurd Şîrê Xan*

*Ji bo bavê min, zanayê Kurd Eliyê Zozan*

Institut kurde de Paris



*Min ji vê zanînê tiştek fêm nekir, ku hemî nûbûnên wê dijberên min in û ne jî vî serê şûrê tûj, yê ku dikare filekî tam ji nav re bibire û şan û şoreta me derxîne asîmanan... û min ji wê tema serxweşiya lêvên ajdarî yên evîndaran tiştek fêm nekir û ciwaniya min wisa vemirî û çû, bê berhem û wek lambeyek di xaniyekî vala de...*

# Bhartrihari

**Hozan û Fêylesofê Sanskrît**

*Wergera ji Îngîlîzî bo Kurdî:*
*Evra Zozan Han  Zeynel Abidîn Han*

# *Naverok*

***Destpêkirina Bizava Felsefî*** **7**
Axifîn, Ziman û Çand 7
Destpêka çand û şaristaniyê 25

***Beşa Yekem*** **29**
Felsefe çi ye? 29
Dîsîplînên Felsefê yên Bingehîn 36
Çanda Helenî 43
Çanda Helenîzmê 45

***Beşa Duyem*** **47**
Ramanên Kevin di Dîroka Felsefê de 47
Felsefeya Kurd - Zeradeştî - Mazdeîzm 48
Jiyana Zeradeştî 51
Prensîbên Mazdeîzmê 59
Felsefeya Çîn - Konfûçyûs 75

***Beşa Sêyem*** **81**
Felsefeya Yewnanî ya Kevin 81
Dibistana Miledî 85
Thales 85
Anaxîmandros 94
Anaximenes 102
Pîsagoras 106
Herakleîtosê Efesî 117
Parmenîdes 124
Empedokles 129
Anaxagoras 133
Demokrîtos 140

Institut Kurde de Paris

Çend hilbijarde ji Aforîzmayên Demokrîtosî 147
Ferhengoka Têgehên Felsefî 148
Nexşeya çanda destpêkê ya li Kurdistanê 150
Berhemên jêderî 151

Institut kurde de Paris

## *Destpêkirina Bizava Felsefî*

*Axifîn, Ziman û Çand*

Mirov xwedî zimanekî rêkûpêk e. Mafê me heye, ku bes ji ber vê jî em bêjin, ew heyîneyeke bi taybet e. *Bila ev peyîv bibe bingeha mijara me.* Belkî di destpêkê de mirov dikare ji vê bingehê hin berencamên newekhev derbixîne, lê dîsa jî rastiya vê gotinê ji vê berencamê çi zirarekê nabîne.

Fêylesofê mezin yê serdema seretayî Arîstoteles gotibû; *Mirov ajalek axiftêr e.* Wî, hebûna mirov di nava pergala *çîna ajalan* de dabû nîşankirin. Bi aliyekî ve mirov bi taybetiyên xwe yên, ku ji koka heyîneya zindeyên bi tevger dihên, hatibû diyardekirin; lê di aliyê din de jî taybetiya herî girîng û balkêş ya mirov bi sînoreke diyarkirî, ji heyîneyên din yên zindetiyê, (ji ajalan) bi vî aweyî cûda kiribû.

Ev yek jiber jêhatiya mirov ya ji hêla axifînî bû, ku di heman demê de ev taybetiya berz û serkeftî ya çîneke ji nav ajalan, ya mirov bû. Jiber ku mirov li gel hin kêmasî û zeafiyetiyên xwe yên jiyanî, ya ku ji wê hêlê ve, ji hemî ajalên cîhanê zeyîftir û bêparastin bû, dikaribû biaxife û xwedî zimanekî rêkûpêk yê axifînî be.

*Ev dihête çi wateyê?*
*Gelo zimanekî bêaxifînî heye?*
Bi gotineke din mirov dikare vê pirsiyarê bike:

Institut kurde de Paris

*Axifîn û ziman bi çi rengî dûr û nêzîkî hev in? Gelo ev herdu têgeh ji heman naverokê pêk hatine yan na?*

Yeqîn bersiva vê pirsiyarê dê erênî be, jiber ku axifîn û ziman hem pir nêzikî hev in û hem jî wek pêvajoyeke bizava ramanî ya dîroka mirovahiyê ye. Lê dîsa jî em xwe hinek bigrin û berî ku li ser bersivên vê mijarê rawestin, em dikarin hin têgehên wek *ziman* û *axifîn* bihînin ber hev û belkî jî bi vê berhevanînê ve di mejiyê xwe de wêneyekî zelal bihafirînin ku ew bersiv di hizra me de cîhê xwe baş çê bikin.

*Bo mînak, têgehên çand û şaristanî yek ji wan e.*

Di destpêka hebûna mirov û pê de her kiryarên, ku bi destê mirov hatine kirin, xwe wek *çand* didin diyarkirin. Her wisa di vê cîhanê de her tiştên ku ji aliyê mirov hatine pêkanîn û bûne sedema guherîna xweza û jiyanê, ew hemî jî berhemên şaristaniyê ne. Her tiştê ku ew ji aliyê mirov hatiye avakirin, ew di heman demê de berhemeke mirov ya xwe bi xwe ye. Li gel vê yekê jî, ew tişt, ew berhem bi tenê serê xwe nikare bibe *çand*. Ew bi hebûna berhemên din û bi kombûna van berheman yên li ser hev û di nava pergalekê de dikare têgeha *çandê* ji bo me bihemberîne.

Li vê derê divê em navbereke kurt bidin û li ser têgeha *şar û şaristanê* hinekî birawestin.

Di herdu zaravên bingehîn yên zimanê me de (Kirmanckî û Kurmanciya jêrîn-Soranî) ev peyva *şar* xwedî taybetiyeke hevbeş e. Di Kirmanckî de *şar* bi wateya *gel* (wek polî ya Yewnanî) û *civaka em jê hatîne* dihête bikaranîn. Bo mînak, *Şarê ma, Şarê Dêrsim...* Di



Institut kurde de Paris

Kurmanciya jêrîn de jî ev heman peyîv wek *bajar* (polîs) dihête bikaranîn. *Şarî Silêmanî, Şarî Dêrsim...* Faris jî jê re dibêjin *şehr*. Zarava Kirmanckî wek serdema *zimanê axifînî* ji zarava Soranî kevnetir e û di kevnedîroka berê zayînê de, peyvên gel û bajar îhtîmal e ku pir caran pêkve hatine bikaranîn; jiber ku têkeliyeke mezin di navbera wan herdu têgehan de heye; mîna ku em dikarin bêjin "gel" elementa bingehîn ya bajar e. Peyva *şaristanî* jî, ji "gel" yanê ji "şar"avzê dibe û ev kombîneya têgehên di nav hev de, di Kurmanciya navendî de bi peyva "bajar" jî biencam bûye. Ez dixwezim di derbarê peyva *şar û şaristaniyê* de, balê bikişînin ser vê diyalektîka xurt ya zimanê me. Bi vegotineke zelaltir, em dikarin destnîşan bikin ku têkeliya şaristaniyê bêhtir bi jiyan û prensîbên jiyana şarî (bajarî) re heye; lê têkeliya peyva "çand" şar, şax, gund û deşt... hemî pêkve dibersivîne û jiber vê jî ev têgeh berfirehtir e.

Bo mînak; diyalektîka van hersê peyvên Kurdî di vê babetê de, dê mejiyê me ronîtir bike: *derzî, ta û pişkok,*

*Derzî, ta û pişkok,* her yek bi tenê serê xwe û di dem û mercên cûda de hatine îcad kirin. Dîsa her yek bi tenê serê xwe berhemên *şaristaniyê* ne, lê ew bi tenê sere xwe ne *çand* in. Ew bi şert û mercên bi têkeliyeke ya bi destê mirov û bikaranîna bi armancekê ve dikarin *çandekê* nîşan bikin. Berî hezar salan dirûtina pîneyekê ya bi derziyê hestî, tayê ji çermê ya bi destê mirov *şaristaniyeke mezin* û *pêşkeftî* bû. Lê îro ev pêkanîn ne bizaveke şaristaniyê ye, berevajî berhemdaneke seretayî (primitiv-*îptîdayî*) yanê *paşkeftî* ye. Ji ber ku îro bi *kardigerên* (makîneyên) ku qet destê



Institut kurde de Paris

mirov lê nakevin û otomotîk ev karê han pêk dihînin, temsîla şaristaniyê dikin. *Berhemdana bi derziyê hestî, tayê ji çermê û dirûtina bi destê mirov êdî şaristaniyê temsîl nake,* lê ev her yek îro jî temsîla *çandekê* dikin. Yanê çand ji şaristaniyê kevintir, berfirehtir û kûrtir e. Jiber vê jî mirov dikare bêje, her berhemên şaristaniyê di heman demê de di nav çandekê de hatiye afirandin, lê her têgeh û dezgehên çandê, bi tenê serê xwe ne mînakeke şaristaniyê ye.

*Têkeliya ziman û axifînê jî wisa ye.*

Her rê û rêbazên ku têkeliya hebûnan bi hevdu re diafirîne, di heman demê de berhemeke zimanî ye, lê zimanê herî pêşkeftî, yê ku bes mirov dikare bikar bîne, *zimanê axifînê* ye. Bo mînak, di her reng, kiryar û reaksiyonê de zimanekî veşartî heye û her hebûnên zîndeyî dikarin vî *zimanê veşartî* bikar bînin. Lê bes zimanekî rêkûpêk yê ji aliyê mirov hatiye avakirin heye û ev jî zimanê axifînê ye. Zimanê ku bi bandora xwe mirovên bi ax û armancekê ve kombûyî ava dike, zimanê axifînê ye. Jixwe em dikarin bêjin, destpêka şaristaniyê di heman demê de destpêka zimanê axifînî ye. Ev yek bi avabûna qewman destnîşan bûye û zimanê axifînê jî yekemîn û girîngtirîn bandora vê avabûnê ye.

Bi mînakeke din em dikarin vê nihêrîna xwe bidin berdewam kirin:

Bikaranîna *desting* (hacêt) ya ji layê mirov destpêka avabûna çînên cîhanê ye, her wiha bikaranîna zimanê axifînê jî (ku ev yek di heman demê de ji bo zimanê nivîsînê asteke nû çêdike) destpêka avabûna qewmên

cîhanê ye. Bi pêşbirîna vê boçûnê, em dikarin gavek din jî bihavêjin; *bi bikaranîna destingan ya ji aliyê mirov, zanîna seretayî; bi zimanê axifînê jî felsefe dest pê kir.*

Ji bo destpêkirina "zanistî û teknolijiya seretayî" girîngî û jiyandariya bikaranîna destingan çi be, ji bo destpêka felsefe jî zimanê axifînê ew tişt e. Eger em pirsiyareke wisa ji vê gotina xwe derbixînin û bêjin; gelo felsefe yan zanistî berî dest pê kir? Wê çaxê jî divê em li bersiva vê pirsiyarê bigerin:

*Gelo mirov, berî zimanê axifînî keşif kir, yan bikaranîna destingan?*

Di derbarê van herdu pirsiyaran de bersivên ji hev cûda hene, lê heta niha jî ev bersiv nehatine zelalkirin û belkî ti caran jî wê nehête zelalkirin. Jiber ku bi rastî di navbera bikaranîna destingan û pêywendiya bi zimanê axifînê de hevgirêdaneke pir zirav heye û eger em ji wan kîjanî têxin pêş jî, em dikarin bi têra xwe argûmanên pesendkirina gotina xwe peyda bikin. Lê niha tiştekî zelal di hizra me de heye:

*Zimanê axifînê bingeha felsefê ye*

Ji ber vê hindê, gava em ji nû ve bala xwe bidin ser Arîstoyî, em dê bibînin ku bi rastî gotina vî fêylesofî mezin bi her aliyê ve wate û cîhekî mezin dadigre.

*"Mirov ajalek axiftêr e."*

Bi gotineke din, eger em vê peyva Arîstoyî bi aweyekî din wergerînin, em dikarin weha bêjin:

Institut Kurde de Paris

*Felsefe li wan axên ku zimanê axifînî tê de yekemîn car hatiye bikaranîn, dest pêkiriye. Bi binavkirineke din, avzêya felsefeya kevnetirîn ya cîhanê axa zimanê axifînî ye.*

Eger em astên zimanê axifînî bihînin ber çavên xwe, em dikarin tabloyeke wisa li hev bisazînin.

***Tabloya pêvajoya ramanê***

* *tevger - kiryar - zimanê tevgerî*
* *bikaranîna destingan - zanistî û teknolojiya seretayî*
* *axifîn - zimanê axifînê - felsefe*
* *zanistiya bi pergal - teknolojî*

Axifîn zimanekî pir bi bandor dihafirîne; ziman, mejî û hizra mirov pêş dixîne. Zimanekî ku mirov bikaribe pê gengeşî bike ava dike û ev ziman jî, ji bo bizava mirov ya ramanî û felsefî dibe erdbereke (zemîneyeke) xweş û guncal.

Gelek balkêş e, hatiye destnîşan kirin ku di rûyê erdê de cara ewil di beşeke ji axa Kurdistanê, ji gundekî bi navê *Jarmo* (Germo/Cermo/ Germiyan) ya ku di navbera sînora dewletên Îran û Iraqê de ye (lê îro êdî di nav sînorên xwe yên xwezayî de, di nav axên Kurdistana Federal de ye) zimanê axifînê hatiye bikaranîn.(2)

Di pirtûka bi navê *A Hîstory of Technology* ya beşa *Speak and Speech(Axifîn û Ziman)* behsa bûyereke gelek balkêş dihête kirin:

*"Li devera gundê Jarmo ya ku îro di nav sînorên Iraqê û di bin çiya û şikeftên Zagrosê de bi cîh e û tê de hîna jî heman gel dijî,(Kurd dijîn) ji aliyê paşkolînasan (arkeologan) hatiye dîtin, ku di vî gundê seretayiya mirovayetiyê de*

*cîhên nanpij (tendûr) hene û hemî gund bi germkirina malbendekê ve (ku ev peyva hanê bi Kurmanciya jêr dihête wateya navendî, lê eslen malbendî rasttir e, jiber ku hemî malên gundekî bi girêdayî malekê ne û ev malbenda wî gundî îfade dike. Cîhê malbendî (navendî-central-merkezî) nanpijan bi carek ve dihatine germkirin û ji bo vê yekê jî di binê xaniyên hemî gund de dezgeheke seretayî ya germkirina malbendî ava kirine, ku ev dezge ji aliyê bîrnasiya pergalî ve pir nêzîkî pergala îroyîn e. Ev bûyera balkêş bi me dide destnîşankirin ku ev kiryar û sîstema mezin ya germkirina navendî, bi tenê, bi bikaranîna zimanekî axifînê, yanê bi pêywendiyeke bi deng û sembolên rêkûpêk bi derfet e. Yanê zimanê axifînê (speech) belkî di cîhanê de ewilî di vê deverê de hatiye bikaranîn."*(3)

Institut kurde de Paris

### *Peyv û têgehên mijarê*

Her çi qas di vê babetê de gelek keşif û delîlên mezin hatibin diyarkirin jî, em dixwezin di vê nivîsa xwe de bi rê û rêbazên bîrnasî, ziman û fêylesofiyê ve bikaribin hevpariya zimanê Kurdî ya di çand û felsefeya cîhanê de destnîşan bikin. Ji bo vî karê dijwar jî dîsa em dê bi rêbazên ramanî û têgehên wê ve dest pê bikin.

Gelek normal e, ku mirov vê nihêrînê rast yan jî nerast binirxîne, destekê bide yan jî dij derkeve, jiber ku bi peşkeftina *zanistiya paşkolînasî* (arkeolojî) û *mirovbernasî* (antropolojiyê) ve gelek pêşniyaz, diyarde û tesbîtên ku heta niha hatine kirin, dihêtin guhertin, serrastkirin yan jî pûçkirin. Lê ev yek nahête înkarkirin, yan jî em bêjin, înkarkirina vê tesbîtê ne bi derfet

e, ku ev bikaranîna dezgeha germkirina malbendî ya berî dehhezar salan û destpêka cîhê çand û şaristaniyê, çiyayên Zagros û navbera herdu çemên Firat û Diclê, yanê *Mezopotamiya Jorîn* (Kurdistan) yeqîn xwedî hevpariyeke mezin ya di destpêka bikaranîna zimanê axifînê, çand û felsefê de heye.

Ziman serperiştiya pêywendiya komemirovî, şarî, kesanî û berencamdariya "netewan"e. Danûstandina komemirovan bi tenê bi vê esntrûmanê ve pêk dihê. Lê zimanê axifînê, bes ji bo mirovan bi derfet e. Danûsitandina bi zimanê axifînê dikare layên têkeliyê li hev bide bi bandorkirin. Ev yek di nav sînora gengeşiyê de ye; hizra mirov bi gengeşiyê ve xwedî helsengirin, nirxandin, darizandin û biryardanê dibe. Darizandin û biryardan, dijbûn yan jî pejirandin, pêşexalên (prensîbên) pêşkeftinê ne û navê vê pergala pêşexalan jî *dualîtiya* (dualizma) her hebûnê destnîşan dike. Bi gotineke din em dikarin bêjin, ziman, axifîn, zimanê axifînê, gengeşî û felsefe asta pêşkeftina hizra mirovayetiyê ne, ku ev yek bes bi vê pergala „tilsimî" bi derfet bûye.

Institut kurde de Paris

*Baş e, wê çaxê ev pirsiyar dikare me di rêya me ya lêgerînê de ronî bike: Gelo ziman (bi her aweyî ziman, bi tevger, bi reng, bi jest û mîmîkan) çawa dikaribû dest pê bike?*

Wekî ku me di destpêkê de diyar kiribû, têkeliya zimanî, bi tevger û kiryarên mirov re heye û ev têkelî bi tevger, deng, tîp, *peyvik* (hece), *bêjeng*, peyîv, hevok û axifînê ve xwe dibersivîne. Bi piranî jî bingeha bi dengî ve bi têkel e; ji ber ku kevirên bingehîn yên zimanê axifînî deng in: *Deng hembersiva* tîpan, tîp

*peyvikan,* peyvik jî *bêjeng* û *peyvan* ava dike. Peyîv *têgehan,* têgeh jî hest û hizran dibersivîne û di dawiyê de mirov bi van hêzên xwe yên hestiyarî û hizrî dibe xwedî *hevokan,* ku di xwevegotina herî xurt ya bizava mirov de *hevok* cîhekî pir girîng digire. Eger hevok nebûya, em dikarin bêjin ku mirov nedikarî xwe bigîhîne zimanekî rêkûpêk û ev yek jî dihate vê wateyê:

*Eger hevok nebûya, zimanê rêkûpêk nedibû; eger zimanê rêkûpêk jî nebûya, felsefe bi derfet nedibû.*

Bi vî aweyî zimanekî rêkûpêk yê axifînî derket holê û felsefe bi derfet bû.

Mirov bes bi tevgerên xwe û hin diyardeyên taybet dikare hin karan pêk bihîne. Bo mînak, mirov dikaribû bi destingekê ve û bes bi rêya tevger yan jî bi nîşanekê ve bi kesek din erd bide kolandin. Lê ji kolandina axê, derxistin û bikaranîna avê, ajotina bax û baxçe, zevî û bi berhemkirina genim û piştre avakirina aşê, hêrandina genimê û pê avakirina arê, dîsa di teştan de hevirandina ar û avê, meyakirina hevîrê (wermandina hevîrê), piştre çêkirina bi çêşîdên nan, dadana tendûrê, pijandina hevîrê ya bi qerera xwe (ne xav û ne jî bi şewitandin), piştre, bêyî ku kartû bin, parastina ew nan û xwerinên ji wan hatine pijandin ya bi rojan... hemî ev kiryarên bi dem û pîvanên rast diviyabû ku bi pergaleke diyarkirî û bi aweyekî rêkûpêk hebe û ev yek jî helbet *zimanekî axifînî* dixweze. Yanê mirov bes bi hin tevger û zimanê *çavûdest* (jest û mîmîk) nedikarîbû gelek problemên *tevgirîft* (kompleks) yên jiyana rojane bimeşîne û berheman bihafirîne. Jiber vê hindê jî zimanê axifînî di pêşkeftina mirovan û jiyana wan

Institut kurde de Paris

de bandoreke sereke dikişîne û heta îro jî ev sereketî xwe dide berdewam kirin.

Di her kiryarên (agirpêxistin, nan pijandin, genim ajotin) xwe de mirov hem ji van kiryarên xwe û hem jî li ser *kirdarên* (failên) xwe û di dewr û berên xwe de (agir, av, ar, genim, rê, ax, zevî...) bandoran çêdike û ji wan bi bandor dibe.

Bo mînak, li gor kiryarên xwe û kirdeyan (mefûlên xwe, tiştên ku pê dihên çêkirin), navan lêdike, taybetiyan pê dide barkirin, caran jî navan diguherîne. Ev hemi jî hem zimanekî axifînê divên û hem jî di heman demê de di jiyana mirov de sîstemeke axifînê ava dikin. Bi vî aweyî jî, mirov her roj, her meh, her demsal û her sal nav û taybetiyên nû dide û distîne, qezenc û winda dike.

Dîsa em bi mînakan berdewama meşa ramana xwe bikin:

Di jiyana rênçber û cotkaran de peyva "pirêz" pir girîng e, ji ber ku di rojê de belkî dehan car dihête bikar anîn. Lê di jiyana bajarvaniyê de ev peyîv pir nahête bikaranîn, belkî di bajarên pir pêşkeftî de bi tevayî winda dibe, lê peyveke nû di dewsa wê de dihê û cîhê xwe digre. Bo mînak, peyva "zincîr" yan jî "kordon" di bajaran de dikeve dêlva "pirêz" lê li gundan ev herdu peyîv ev car bi reng û wateyên zengîntir bi dest dixînin û berdewam dibin. Ji ber ku erka pirêz di bajaran de winda dibe û di cîhê wê de erkên nû ava dibin û erkên nû jî bi navkirinê ve dibin sedema afirandin û geşkirina têgeh û peyvên nû.

Institut kurde de Paris

Ji ber vê yekê, binavkirin (nomînalîzm) bi sîstemeke sereke ya zimanê axifînê ye û bingeha binavkirinê jî bi têkeliya mirov û kiryarên mirov di têkeliya kiryar-kirdar-dem-cîh de xwe dike nav pêvajoya nûkirina ziman û ramanên xwe.

*Bi vî awayî em xwe digîhinin encameke girîng:*

Felsefe bi hevsazbûna ziman û ramanê ve derketiye asoya mirovayetiyê û ji lêkolînên ta niha hatine kirin, me ronî dikin ku Mezopotamiya Jorîn, yanê Kurdistan di dunyayê de yek ji wan asoyan e. Bi diyardeyên zelal û vekirî di vê asoya bi birqîn de pêşkeftinên mezin pêk hatine..

Niha em pirsiyareke din bikin, ku hêdî hêdî gavên xwe berev mijara me ya esil, mijara ziman û felsefe bihavêjin:

*Yekemîn hebûna ku bingeha gerdûnê avakirî çi ye?*

Baş e, cîhê ku bizav û hewildanên felsefî tê de dest pê kiriye, gelo kîjan pirsiyar di mejiyê mirov de xwe zelal kiriye, kîjan pirsiyar bûye mereqa mijarên felsefê? Wekî ku em di *disîplîna heyînasî* (ontolojî) de dibînin, zana û fêylesofên ewil ev pirsiyar dane pêş û li bersivên wê pirsiyarê geriyane:

*Yekemîn hebûna ku bingeha gerdûnê avakirî çi ye?*

Ji bo ku em bikaribin bersiveke *mejîkî* (maqûl) û bi *bîrnasî* (mantikî) bidin, em dê pirsiyareke din bikin:

*Em gaveke din bavêjin; fêylesofê Kurd Zeradeşt, yê ku ew di heman demê de yek ji fêylesofên sereke ye û gelek fêylesofên Yewnanî, wek Herakleîtos, Pîsagoras, Demokrî-*



Institut kurde de Paris

*tos, Empedokles ûwd. jê bi bandor bûne û di pirsiyar û bersivên vê mijarê de jê sûd wergirtine. Bo mînak: Pirsiyara bingehîn ya wê serdemê ev bû:*

*Gelo yekemîn heyî ya bingeha gerdûnê avakirî çi ye?* Bersiva Thalesê Miledî *av,* ya Anaxamandros *bêdawîtî* (apeiron), ya Anaxîmenes as(hewa), ya Pîsagoras û Herakleitos jî agir e û di dawiyê de Empedokles axê jî dixe nava van madeyan û her çar heyînên bingehîn wek madeyên sereta(arke) yên gerdûnê dihêne pesend kirin:

*"Di binhega avabûna gerdûnê de çar hebûnên bingehîn hene; ax, av, as, ar."*

Ev destnîşana girîng ya felsefî bi heman şêweyî, dused sal berî Empedokles, ji aliyê Zeradeşt hatibû vegotin û bibingehkirin. Lê cûdahiyeke girîng hebû: Li gor Zeradeşt ar (agir) her yekem aferîner bû û piştî du hezar salan bi teoriya Kant-Laplace ev pêşdîtina mezin ya Zeradeşt bi rêbazeke zanistî hate piştrast kirin.

*Lê di eslê xwe de îşaretên vê pêşexalê di felsefeya Zeradeştî de hebû û ar (agir) mina afirinêrê sê hebûnên din dihate qebûl kirin. Piştî du mîlenyuman bi teoriya Kant-Laplace hate îsbadkirin ku hebûna gerdûnê bi goga agirekî mezin dest pê kiriye û bi teqîna vê goga ji agir, sarbûn, tevger û guherîn qewimiye. Di dawiya van tevgeran de jî agir bûye sedema afirandina as, av û ax û piştre hemî hebûnan.*

Eger em carek din werin ser mijara sîstema avabûna *gerdûnê* ya Arîstoyî; ew dîbêje gerdûn ji van çar hebûnên bingehîn avabûye, ax *giran* e û *bê tevger* e, di malbendê de cîhê xwe digre, agir *sivik* e û cîhê xwe li



Institut kurde de Paris

herî jor e, as (hewa-asîman) li gel agir e û sivik e, av jî li ser axê daîm di tevgerê de ne. Yanê bi dîtîna wê rojê, eger em bala xwe bidin vê hizrê, em dibînin ku hemî hebûnên di navbera axa cîhanê û agirê rojê de bi nihêrîneke bîrnasî hatiye şêrove kirin.

*Ev sîstem û bingehkirina çîroka hebûn û avabûna gerdûnê li ser ziman û felsefeya Yewnanî de bandorên mezin çêkir û êdî dîroka Felsefeya Yewnanî li ser vê gengeşiyê, xwe da geşkirin.*

Niha em gavên xwe hinek bavêjin paş û vegerin têkeliya nihêrîna fêylesofê Kurd Zeradeşt û taybetiyê zimanê Kurd û piştre em dê bibînin ku ew prensîbên zimanê axifînê û avabûna hizra felsefî bi her aweyî di têkeliya ziman û felsefeya Kurdî de xwe destnîşan dike, yan na?

*Belê, destnîşan dike...*

Hem jî ewende bi rengekî vekirî û bi mînakên balkêş xwe dide destnîşankirin ku em dikarin bêjin ev hesasiyet û parelelî ya di navbera ziman û felsefê de heye, di gelek zimanên din de yan tune ye, yan jî pir zeyîf e.

Bi gotineke vekirî mirov dikare bêje ku têkeliya ziman û felsefeya Kurdî yek bi yek xwe dide pejirandin û ev yek di gelek zimanên din de nahête dîtin:

Em bi hin mînakên balkêş, ev hizra xwe bidin meşandin:

Di hemî alfabeyan de (Erebî, Latinî, Kirîlî, Romenî) tîpa yekemîn *A* ye. Di Erebî de wek *Elif* bihête xwendin jî bersiva vê herfê di zimanên din de (di trans-

kirîpê de) tîpa *A* ye. Gelek balkêş e, ku di zimanê me de *her çar heyîneyên sereke û bingehîn* (bi Yewnanî arke) yên ku *li gor nihîrên fêylesofan* gerdûn ji wan dihête avzêkirin (yanê berî du hezar û şeş sed sal di felsefeya Serdema Seretayî de wisa dihate hizirkirin), gelo bes rastberhatin (tesadûf) e ku di her sê zaravên Kurdî de jî (belkî yên din de jî wisa ye, lê mixabin ez nizanim, bo nimûne di zarava Hewremî de) ev *her çar heyîneyên bingehîn bi tîpa yekemîn ya alfabeyê, bi tîpa A ve dest pê dike?* Ez bawer nakim ku ev yek bes rastberhatin be: Ev rastî bîrûboçûna me ya ku li jor me ew anîbûn ser ziman, bi hêz dike, ku binavkirina van *her çar heyîne-yên arkeyî* di çand û zimanê axifînî ya Kurdan de ha-tiye binavkirin û di vê de du tişt yekser xwe didin zelalkirin:

*Jiyana bicîhbûna li dewr û berên avê, ajotina zeviyan û her wiha taybetiyên jiyana şaristaniyê di dîroka ramanê de desthilatdar e.*

*Ya yekemîn ev e:* Jiyana bicîhbûna li dewr û berên avê, ajotina zeviyan û her wiha gelek taybetiyên jiyana şaristaniyê ya di axa Kurdistanê de pirsgirêka binav-kirina tiştan li nav komên mirovan yên di navbera *Firat û Dijlê* de dijiyan de, xwe dabû diyarkirin û bersivandibû. Ji ber ku ax, agir, as (aso-asîman) û av hem ji layê fêylesofî û hem jî layê jiyana rojane pirsgirêka yekemîn bû, ku diviyabû ku ev heyîneyên bingehîn û pirsên di derbarê wan de, bi cara ewil hatibana çareserkirin û binavkirin.

Mîna têkeliyeke zindeyî di navbera binavkirin, peyîv û hizr û felsefê de gelek nîmûneyên din jî, di

Institut kurde de Paris

zimanê me de hene: Divê li ser van mînakan hem bi nihêrîneke zimanzanî û hem jî bi rêbazên bîrnasî û felsefî bihête rawestandin.

*Bo mînak; di felsefê de rast û rastî...* Peyva rast û rastî gelek balkêş e. Peyva rast di zimanê Kurdî de xwedî du wateyê ye: Wateya yekemîn *rast be rast*, ya erdên bê girde, erdên rast, cîhê ku wek meydan e, dûz e, ev navkirin carina mîna *rastber* jî dihête bikaranîn. Wateya din jî, dîsa ji wateya yekemîn avzê bûye, lê wateyeke din afirandiye: *Layê rast,* milê rast, gotina rast, mirovên rast...

Peyva *Rastî* jî, ji van herdu wateyan peyveke nû ya felsefî ava kiriye û wateya heqîqet, heqqaniyet, bi zimanê Almanî Wahrheit, *Richtigkeit;* bi Erebî, *Heqîqet* avakiriye. Bi Îngîlizî *Right,* bi Almanî *Recht...* Ez bawer dikim di gelek zimanan de ev yek dihête bikaranîn. Peyva *rastiyê* têgeheke bingehîn ya fêylesofiyê ye û di pir zimanên cîhanê de bi rengî cûdabûyî xwe dayê berdewam kirin. Em dê bi rêbazeke bîrnasî nav û girîngiya van peyvên bingehîn bidin û piştre jî wan şêrove bikin:

*Xweda: Di hemî dînan de hêza yekemîn ew e,*
*ku gerdûnê dayê afirandin. Nêr e.*
*Xweza: Şirûşt, yanê her hebûn ji wê dizên. Mê ye.*
*Xwedî: Ew ew e ku her tişt yên wî ne. Nêr e*
*Xweşî: Ew ew e ku bi tevayî xweşik e. Mê ye*

Institut kurde de Paris

| | | |
|---|---|---|
| ***Kurdî*** | ***Xwe-za (mê)*** | ***Xwe-şî (mê)*** |
| *Almanî* | *Natur* | *Schönheit* |
| *Îngîlîzî* | *Nature* | *Beauty* |
| *Erebî* | *Tabiat* | *Cemîle* |
| *Tirkî* | *Doga* | *Güzellik...* |
| | | |
| ***Kurdî*** | ***Xwe-da (nêr)*** | ***Xwe-dî (nêr)*** |
| *Almanî* | *Gott* | *Besitzer* |
| *Îngîlîzî* | *God* | *Owner* |
| *Erebî* | *Allah* | *Malîk* |
| *Tirkî* | *Tanri* | *Sahip* |
| | | |
| ***Kurdî*** | ***Ar(Agir) nêr*** | ***As (Asîman) nêr*** |
| *Alman* | *Feuer* | *Luft* |
| *Îngîlîzî* | *Fire* | *Air* |
| *Tirkî* | *Ates* | *Hava* |
| | | |
| ***Kurdî*** | ***Av (mê)*** | ***Ax (mê)*** |
| *Almanî* | *Wasser* | *Erde* |
| *Îngîlîzî* | *Water* | *Earth* |
| *Tirkî* | *Su* | *Toprak* |

Institut kurde de Paris

Niha em van her çar têgehên li gel û li hember hev dikarin binirxînin. *Xweda* û *Xwedî* wî tiştî dihemberîne, yê dayî, yê xwedîbûyî dide, û di hemî dînan de ev, *Xwedê* bi xwe ye. Eger em bi zimanê din bifikirin; bi Erebî; *Allah û Malîk,* bi Tirkî; *Tanri ve Sahip,* bi Îngîlîzî; *God and Owner,* bi Almanî *Gott und Besitzer,* bi Farsî; *Xoda we Sahib...*

*Gava ku mirov bala xwe dide li ser van her du têgeh û têkeliyan di navbera hev du de, cûdatî û kûraniya têgehên Kurdî xwe didin destnîşan kirin.*

Li gel vê yekê, *Xweza* û *Xweşî* jî hevdu tevav dikin. Xweza dizê, xwe zêde dike û heta ku xweşiya wê hebe (di vê de xweşî hem wek bi bedewbûn û hem jî wek bi wateya jîndebûn dihête bikaranîn. Bo nimûne, di Kurmancî de *xweşî,* di Kirmanckî de jî *weşî* car carina di wateya *sax û silametiyê de* jî dihête bikaranîn). Heta ku Xweza xweşikî û jîndebûna xwe berdewam bike ew *Xweza* ye.

Bi tarîfeke din, Xweda bi dayîn û xwedîbûna xwe dikare *xwedatiya* xwe bide berdewamkirin û ev taybetiyên serdestiyê, taybetiyên nêraniyê bar dikin û jiber vê yekê jî *Xweda* wek nav, û *Xwedî* jî wek bernav (adjectiv) peyvên nêr in. Lê Xweza û Xweşî jî bileksê vê ne; Yanê *Xweza* wek nav û *Xweşî* jî wek bernav taybetiyên mêyîniyê bar dikin û peyvên mê ne.

Ji ber ku di hemî ol, bawerî, tevgerên ramanî û fêylesofiyê de peyva *Xweda* wek nêr hatiye binavkirin. Her çiqas di ol û ramana Zeradeştiyê de mêr û jin wek prensîb wekhev hatibin qebulkirin jî, dîsa jî mêr gavek pêş e. Xweda mîna nêr dihête hizir kirin û ji layê rêzimanî jî peyvên wek navê *Xweda,* diyardeya nêratiyê digrin.

Di gelek felsefeyên serdema seretayî de jî *Xweda* ew qudret e ku yekemîn tovê jiyan û hebûnê avêtiye nava Xwezayê û piştre her hebûn hatine jiyanê.

Yanê hebûn bi dayîna yekemîn tov û di hin felsefeyan de bi wateya tov û hêzek ewil dihête bikaranîn (5) ku ev hêz bi tenê ya Xwedayî ye, lê naveroka vê hêzê jî bes ji layê Xwezayê dihête bersivandin.

Institut kurde de Paris

Xweda nêr, Xweza jî mê ye, yanê Xwedî taybetiya nêraniyê, Xweşî jî taybetiya mêyatiyê ye. Her wisa *ar*(agir) nêr e, *av* mê ye; *as* (asîman) nêr e, *ax* mê ye... Jiber ku agir û av, as (asîman) û ax wek dijberiyên hevûdu, dîsa hebûna hevûdu dibersivînin. Agir avê dikelîne û vedigerîne tiştekî din(bûhar), av jî agir vedimirîne. As tovên xwe davêje nav axê (baran dibarîne) û ax jî rihma xwe wek berhemên xweşitî (şînatiya xwezayê) dizêne û dibe sedema pirbûna tovên asîmanî.

Ev têkeliya balkêş ya bîrnasî û hevgirêdayî ya nav hev de ya her çar heyîneyên bingehîn yeqîn destnîşaneke pir girîng e ku hem ji layê afirandin û bikaranîna zimanê axifînî û hem jî bi vî aweyî destpêkirina bizavên çandinî, zanyariya jiyana rojane û ramankirina pirsgirêka hebûna gerdûnê de rêberiyeke girîng e, ku em bêjin axên Kurdistanê yek ji wan waran e ku bûye hevpareke destpêka çand û şaristaniyê; her wisa bûye hevpareke destpêka Felsefe û zanyariyê.

Institut kurde de Paris

## *Destpêka çand û şaristaniyê*

Di lêkolînên dîroka zanistiyê de gelek lêkolînerên mezin yên cîhanê pesend dikin, ku destpêka çand û şaristanyê di welatê navbera herdu çem, Firat û Dijlê de rû daye. Ajotina axê, çandinî, karê bi her cûreyî, xebatên li ser erdjimêrî (hendese), bîrkarî (matematîk), xwezanasî û şirûştzanî (fîzîk) û felsefe di vê axê de zaye, pêş ketiye û piştre li hemî cîhanê belav bûye. (6)

Têkeliya astên ziman û çand, têkeliyeke heyînde û zayende ye, li hev vedigere û hevdû dijîne. Têgeh û peyvên di zimanî de cîhê xwe digrin, dihête wê wateya ku di heman demê de wek çand jî cîhê xwe di dîroka wî qewmî de girtiye. Felsefe jî têgehên xwe di vê avzêya bi adan de diafirîne. Zimanê Kurd bi vî rengî ye, dewlemend e, bi derfet e û xwedî hêzeke bîrkarî û rêbazî ya ji bo pêkanîna felsefê ye.

Gelek mînakên balkêş dikare vê nihêrîna me piştrast bike. Bo nimûne, di navbera zimanzan (fîlolog) û dîrokzanên piraniya cîhanê de hatiye qebûlkirin ku têkeliya konaxên *ziman* û *çand* de têkeliyeke erênî heye, têgeh û peyvên di zimanî de cîhê xwe girtî, dihête wê wateya ku di eynî demê de wek çand jî cîhê xwe di dîroka wî gelî de digre.

Institut kurde de Paris

***Pergalên Bîrkariyê***
*(Sîstemên Matematîkê)*
*Di zimanê bîrkariyê de sê **pergalên girîng û sereke hene:***

### ***Dezîmal System (Pergala Dehîmal):***

Wateya wê jî, ew bîrkariya ku îro em di bijmêrkarî (arîtmetîk) ya rojane de pêk tînin, yanê jimareyên (0 1 2 3 4 5 6 7 8 9) sîstema *dezîmal* ava dikin. Peyva dezîmal ji Latînî dihê û wateya vê têgehê weha ye: Sîstema ku ji deh jimareyan hatiye avakirin. Îro em di bîrkariya mo-dern ya beşa arîtmetîkê de vê sîstemê bikar dihînin.

Institut kurde de Paris

### ***Duodezimal System (Pergala Duwanzdehîmal):***

Sîstema ku ji 12 *jimareyan* ava dibe. Di hesabkirina demsal û mehên salekê de ev sîstem dihête bikaranîn. Bi Kurmancî *duwenzdehîmal,* di Kirmanckî jî *desûdimal* sîstem e.

### ***Sexagesîmal System (Pergala Şêstîmal):***

Ev sîstem bingeha xwe ji Mezopotamiya digre. *Sexîgesimal System,* wateya wê jî bingeha bîrkariya ku ji jimarên 60 (şêştî) pêk hatî ye. Ev sîstem di erdjimêrî (geometrî) û di derece, lez û demjimêran de dihête bikaranîn. Bo mînak demjimêrekê 60 lez e, lezekê 60 lezîng(saniye) e. Eger em vê peyvê wergerînin Kurdî, wateya wê wisa dikare bihête berhevkirin:

Hemî zimanên cîhanê yên pêşketî di têgehên bîrkariyê de ev herdu peyiv wisa bi esasiya Latînî girtine û di zimanê xwe de bi cîh kirine, lê di zimanê me de wateya peyvên ku ev têgeh avakirîne, bi heman wateya Kurdî jî dibersivîne. Hewce nîne ku em van peyvan bigrin nav zimanê xwe. Jixwe ev peyîv di zimanê Kurdî de yan eynî, yan jî hinek bi cûdatî cîhê xwe digre: Bo nimûne, *Dezîmal* (bi Kirmanckî *Desîmal,* bi Kurmancî *Dehîmal*) û *Sexigesimal System* jî di Kurdî de wek *Pergala Şêstîmal* dihête binavkirin.

Sîstema bîrkariya îroyîn ji deh jimar, û bîrkariya asîmannasî (astronomî) û ya demjimêran 12 û 60 *(1 lez (deqe) 60 lezîng (saniye)* ji şêşt (60) jimar (reqem) dihête avakirin.

| | |
|---|---|
| **Kurdî** | **Kurdî** |
| ***Kurmancî*** | ***Kirmanckî*** |
| *Dehî-malSîstem* | *Desî-mal Sîstem (0-9:10 Mal Sîstem)* |
| *Duwanzdehî-mal* | *Desûdu-mal S. (1-12 Mal Sîstem)* |
| *Şêstî-mal Sîstem* | *Şêstî-mal Sîstem(0-59: 60Mal Sîstem)* |
| | |
| **Latînî** | |
| *Dezî-mal System* | |
| *Duodezi-mal System* | |
| *Sexagesî-mal System* | |

Em dê di rûpelên pêş de jî behsa vê rastiyê bikin û di her şêveya felsefeya ku tê de kok û şaxên zimanê me yê dewlemend û bi bingeh xwe dide diyarkirin, em dê pêda biçin. Bi rastî gelek mînakên wisa balkêş û

Institut kurde de Paris

girîng yên wekî ku me li jor ew vegotin, hene. Zimanê Kurd û Mazdeîzm dewra xwe di dîroka felsefê de bi kîjan rengî lêyîstiye, bandoreke çawa daniye, em dê bikevin nav hewildana ronîkirina vê rastiya veşartî.

Bi vî aweyî em hem pêywendiya ziman û felsefê bi gelemperî ronî bikin û hem jî dewra zimanê me di dîroka bizava ramanî de çi bûye, vebêjin.

Wekî dihête zanîn, di dunyayê de gelek zimanên bêxwedî û bêdewlet tune dibin. Eger ji du hezar û pêncsed sal vir de, zimanê miletekî bindest û qedîm hîna jî tune nebûbe û di serde jî ew taybetiya xwe ya felsefî û ramanî kûrtir û berfirehtir kiribe, divê her lêkolîner û felsefedar vê rewşa balkêş mereq bike û sedem û encamên wê yekê derxîne meydanê. Ev yek berî her tiştî erkeke mezin e, etîka zanatiyê ye.

Di vî warî de zimanê me rastî neheqiyeke pir mezin hatiye û sedema vê neheqiyê jî, her hemin nebûna dewleteke me ya serbixwe ye. Wekî ku fêylesofê Alman Heim Zött dibêje, *fêylesofî berî her tiştî jiyan û helwesteke li gor felsefya xwe destnîşan kirine.* Eve em jî bi vê kiryarê ve belkî bikaribin vê erkê û helwestê pêk bînin.

Institut kurde de Paris

## Beşa Yekem
### *Felsefe çi ye?*

*Zanyarî çi ye? Felsefe Çi ye?*
*Warên Felsefê çi ne?*
*Disîplînên Bingehîn yêne Felsefe çi ne?*

*Zanyarî çi ye?*

Em vê jiyanê bi zanyariyan ve dikarin bijîn. Bêyî zanyarî qet lezekê jî derbas nabe. Lê gava em behsa zanyariyê dikin, ji xwe seh dikin ku ev bizav ji zanînê peyda dibe. Yanê em hin tiştan dibihîsin, ewê di hizra xwe de dixebitînin û di encamê de zanîna me ya di wî warî de rind û xirab xwe tevav dike û em jê re dibêjin zanyarî. Lê ev zanyarî ne mecbûr e ku rast be.

Ji bûyereke li dewr û berê qewimî bigre heta her bûyereke ku bes me ew bihîstî ye, di hizra me de ewê astê derbas dike. Jiber ku wek her jiyandaran em jî di dema jiyana xwe de hin tiştan seh dikin, dibînin, dibihîsîn yan jî texmîn dikin. Evna hemî bizavên zanînê ne û di dawiyê de xwe digîhinin zanyariyê.

Eve em di destpêkê dikarin bêjin ku her mirov dizane. Bo mînak, ji mirovek zanist bigre heta zarokek her mirov rojane bi zanyariyên kevin û nû mijûl e û di vê mijûlayiyê de ew kes bivê nevê zanyariyên xwe zêdetir dike. Bo mînak, zanistek jî dikare bizane, ku piştî şevê roj tê, piştî biharê havîn tê, zarokek jî...

Institut kurde de Paris

Mirovên herî nezan jî dikarin hin hejmaran bihesibînin û bi vê yekê ve jiyana xwe ya rojane berdewam bikin, mamosteyek jî... Nexwe em dikarin bêjin ku zanîn bizaveke bingehîn ya mirov e û her wisa zanyarî jî ji vê bizavê encam dibe.

Lê zaniyarî ne hemî wek hev in. Di destpêkê de em dikarin bi rengekî asan ewê kategor (kategorîze kirin, li gor hin taybetiyan ji hev kirin) bikin.

Ev jî di destpêkê de wisa dikare bibe:

- *Zanyariya rojane*
- *Zanyariya zanistî*
- *Zanyariya felsefî*

Institut kurde de Paris

*Zanyariya rojane*

Zanyariya rojane, ew e ku me li jor hinekî behis kiribû. Eger em dixwezin wê bizavê binav bikin, em dikarin bêjin ku zanyariyên rojana ew tişt e ku em di jiyanê de û bêyî hemdê xwe wan fêr dibin. Ji bo fêrbûna wan zanyariyan ne pêwîst e, ku rêbazekê bihête bikaranîn û her wisa bizaveke pergalî ya zanînê lê bihête bingehkirin. Bo mînak, em ji jiyanê fêr dibin ku zivistan sar e û eger em cilûbergên saxlem û qalind lixwe nekin em dê nexweş bikevin. Lê ev yek ne yasa ye, yanê hin mirov yan jî di hin deveran de mirov zirav lixwe bikin jî nexweş nakevin. Yan jî em bêjin, em bi hêsanî dizanin ku gava em destê xwe li sobê vedikeve din, ew dê bişewite. Lê ev yek jî ne yasa ye, caran dikare bişewite lê caran jî qet tiştekî pê nayê. Di dawiyê de wisa binavkirinekê dikarin peyda bikin:

Zanyariya rojane ew tişt e ku em wan dizanin û pê dijîn, kar û barên xwe yên rojane pê dimeşînin lê em nikarin yeqîn bikin ku ew hemî rast yan jî xelet in.

*Zanyariya Zanistî*

Tam di vê astê de sînora zanyariyên zanistî û rojane ji hev cûda dibin. Zanyariyên zanistî ew tişt in ku em ji wan bi bawer in û encamên wan yeqîn wek hev in. Bo mînak, gava av di sed derecê de bikele û ev yek yasayeke rewşa avê be, em nikarin bêjin, av di sed derecê de dikele lê ew dê bûharê bide hewayê yan nede, ew ne diyar e. Na xêr, em vê yekê nikarin bêjin; av gava sed derece keliya, ew mecbûr e ku bûharên xwe bide hewayê. Jiber ku ev zanyarî di ceribandineke bi pergalî hatiye îsbat kirin. Her wisa zanyariyên rojane jî ji ceribandinan dihête fêrbûn, lê ev ceribandin jixwe ye, xwezayî ye û ne girêdayî sîstemekê ye, jiber vê yekê jî encamên wê dikarin xelet yan jî rast bin. Lê ceribandinên zanyariya zanistî bi pîvan, prensîb û rêbazeke diyarkirî dihêtin kirin û encamên wan êdî bi bawerî dihête qebûl kirin û nayê gengeşî kirin.

Di dawiyê de em dikarin bêjin ku cûdahiya herî mezin ya di navbera zanyariyên zanistî û rojane de ew e, ku zanyariyên zansitiyê rast in û em bi dilrihetî dikarin bi wan bawer bin: Bo mînak, av di sed derece kelanê de bûharê dide hewayê û rewşa xwe digûherîne. Şeklên ku ji *sêkenar* xet hatine avakirin, sêkenar in; 2+2= 4 e. Lê zanyariyên rojane ne ew qas saxlem in ku em bêyî gengeşî yan jî hizirkirinê wan hemiyan

Institut kurde de Paris

qebûl bikin. Em dikarin encamên wan qebûl jî bikin, red jî bikin. Lê di zanyariya zanistî de ew azadiya me nîn e, jiber ku rastî yan jî nerastiya zanyariya zanistî dihête îsbad kirin.

*Zanyariya Felsefî*

Zanyariya felsefî ji hin aliyan ve, ji wan herdu zanyariyan jî cûdatir e û berfirehtir e. Herdu zanîn jî dikarin bikevin nav mijara felsefê û dikarin bibin sedem yan jî encameke zanyariya felsefî. Ji aliyekî ve zanyariyên felsefî wek yên rojane ne û ew jî her çi qas gelek rêbaz û gengeşî bikar anîbin jî, di dawiyê de hûn dikarin ecama zanyariyeke felsefî bipejîrînin yan jî red bikin.

*Jiber ku di zanyariyên felsefî de îsbad ne mûmkûn e.*

Jiber vê aliyê ve em dikarin zanyariyên felsefî û rojane li hev bişivînin. Lê ji aliyekî ve jî ev herdu zanyarî bi tevayî ji hev vediqetin. Ev jî di peydabûnên xwe de diyar dibin. Jiber ku zanyariyên felsefî wek yên rojane nayên fêrkirin. Belkî di destpêkê de felsefedarek dikare zanyariyên rojane bi kar bihîne; lê yeqîn di fêrbûna zanyariyên felsefî de felsefedar mecbûr e ku rêbazeke bîrnasî û felsefî, heta caran jî rêbazdariyeke zanistî bikar bîne.

Institut kurde de Paris

*Felsefe çi ye?*

Têgeha felsefê, wek nav ji Yewnanî dihê û heman bingeha xwe ve lê bi hin guhertinên ji layê deng û fonetîka zimanê Erebî, peyva „philosophia" ya Yewnanî ya resen, bûye „felsefe" û êdî di zimanên din yên dewr û berên Erebî de jî ev peyîv bi wî halî hatiye bikar anîn.

Têgeha felsefê, di zimanê Yewnanî de bi yekgiritina du peyvên cûda yên „philo" û „sophia" pêk hatiye û bi binavkirineke tevayî dihête wateya „evîna zanatiyê".

Peyva *philo* di zimanê Yewnanî de evîn e û *sophia* jî zanîna bilind, hikmet, zanyariya herî jor û rast, zanyariyeke ku mirov ti caran nikare xwe bigîhîne wan, rastiya herî bilind û evrayî.

Bi şêrovekirineke bes rêbazên mejiyê, Yewnaniyên wê serdemê wisa bawerî dikirin ku zanîn, zanîna bê şik û guman bizaveke Xwedayî ye, yanê bes Xweda dikare her tiştî bi rast, bê kêmayî û bi rêkûpêkiyeke mûkemmel bizane. Jiber vê yekê, mirov jî incax bikaribe bikeve nav bizava lêgerîna wê hikmetî, yanê mirov dikare bes bibe evîndarê vê bizava zanyariyê. Jiber vê hindê dihête riwayetkirin ku di cara ewil de fêylesofê Yewnanî yê bi navê Pîsagoras, ku ew yek ji *heft feyelsofên Xwezayî* yên destpêka Felsefeya Yewnanî ye, wisa gotiye:

*„Ez fêylesof im!"*Yanê ez evîndarê rastiyê û zanînê me. Helbet ev binavkirina berî 2500 salan, her çi qas heta îroyîn jî, ji gelek layan ve xwe dabe gengeşîkirin



Institut kurde de Paris

û hin caran qebûlkirin jî, wisa wek xwe nemaye û ji aliyê gelek fêylesofên cûda bi şêweyên dîtir jî hatiye tarîfkirin. Bo nimûne, Hegel di felsefeya xwe de tarîfeke nû aniye û ev binavkirina ya Pîsagorasî red kiriye. Li gor Fredrich Hegel, *felsefe nikare bibe evîna rastiyê, jiber ku rastî êşdar e û mirov nikare ji êşê hez bike.* Lê li gel vê rêddiyeya xwe, wî jî nirx û hizreke *rûmetî* û *evrayî* li bizava felsefê kiriye û wek tekoşîneke *sûfiyane* ya lêgerîna rastiyê bi nav kiriye.

Fêylesofe Alman Karl Marks jî binavkirineke nû û cûda aniye û ew jî li ser dewra felsefe ya di mijara mirov, aborî û civakiyê de sekiniye û ewê wek hacêteke nihêrîna cîhanî ya kes û çînên dijber bi nav kiriye.

Helbet naveroka felsefê û her wiha binavkirina wê ya ji layê bûnwarî (heyînasî) bîrdoziya zanînê û bîrnasî (epîstemelojîk), sincdarî (exlaqî) û ciwandarî (estetîkî) mijareke din e û ew dê di beşên pêş me û bi taybet ya di beşa *Felsefeya bi rêkûpêk (Felsefeya Sîstematîk)* de wê bihête gengeşîkirin. Lê em niha bi kurtayî dikarin bêjin di hemî binavkirinên têgeha felsefê de nihêrîneke hevbeş ya hemî layan heye û ev jî wisa ye: „Di felsefê de îcbariyeke helwesta li gor nihêrîna gerdûnî heye û xeta ku têgeha felsefê ji bizavên din yên ramanî vediqetîne jî ev e. Her wiha beşeke din ya şirîkdariya binavkirina felsefê jî heye:

*Felsefe bingeha hemî bizavên siyasî, exlaqî, hûnerî, dînî, îdeolojîk, aborî û zanistî ye.*

Eger em dîsa vegerin li ser tarîfa felsefê ya Pîsagorasî, ku wî gotubû, *ez fêylesof im,* li gor naveroka mijarên wê demê û pirsgirêkên felsefî yên destpêka

felsefeya Klasîk, ev binavkirin gelek îhtiyadî ye. Heta gelek rast e jî. Jiber ku di felsefeya destpêkê de mijarên wisa hene, ku bi rastî kesên ku bêjin em xwediyên zanînê ne û bi vî aweyî mijarên xwe dest bi şêrovekirinê bikin, nikarin wek fêylesof bihêtin naskirin.

*Jiber ku mijarên felsefî yên wê demê di destpêkê de pisriyar in, yanê ne bersiv in.*

Yek jî heman di vê serdemê de mirovahî ji xûrafe û baweriyên bêserûber dest bi rizgarbûnê dikin û jiber vê jî, divê şik hebe, lêkolîn û lêpirsiyarkirin dê bibe bingeha hemî helwest û rêbazên felsefî. Jixwe ev yek mecbûrên baweriya zanînê vala derdixîne û gengeşiyeke nû ya li ser zanîn û nezanînê dide destpêkirin. Jiber vê yekê em binavkirina felsefê wek „evîndariya rastiyê, yan jî evîndariya zanîna rastiya jor û bilind" bo wê demê rast qebûl dikin. Ev qebûl ne pejirandineke bê şert û merc û heta hetayî ye; ev qebûl bes ji bo bidestxistina derfeteke hizrî ye ku em bikaribin pê dest bi pirsiyarkirina mijarên felsefê bikin û gav bi gav bikevin nav têgehên felsefî. Jiber ku wek em dê di felsefeya sîstematîk û bi taybet di felsefeya Platonî de bibinîn ku yek ji bingehên herî girîng û resen ya felsefê têgeh in û jiber vê yekê pejirandina tarîfa felsefeyê ya wê demê, ji bo avakirina derfeta nifûza nav têgehên dîtir yên ronîkirina felsefê ye.

Helbet wek her mijarên felsefî, pejirî (qebûl) çi caran xwe nagîhînin konaxa îsbatê, ew dê her dem pêdiviyeke mezin bo îqnakirinê bi me bide hîs kirin.

Institut kurde de Paris

***Dîsîplînên Felsefê yên Bingehîn***

Di jiyanê de qet tiştekî tune ye ku hebe û têkeliya xwe mijareke felsefê re tune be. Ji azadî heta berhemdana rojane, ji xebateke zanistî heta hûnereke plastîk, ji psîkolojiya zarok heta yasayên welatekî û sîstema mafnasî (hiqûq) heta rêbazên perwerdeya zarokan, ajotina zeviyan û kevneşopiya bazaran... her tişt bi aweyekî dikeve nav mijareke felsefî û li wir xwe dide gengeşîkirin. Jiber vê yekê me wek sernivîs peyva *dîsîplînên bingehîn* bikar anî. Ev jî dihête vê wateyê; ev dîsîplînên bingehîn bi aweyekî hemî di nav nihêrîneke felsefê de cîhe xwe girtibe, em dikarin ji wê nihêrînê wek felsefe bi nav bikin, wekî din ew nihêrîn dikare bibe dîn, zanistî, îdeolojî, wêje... ûwd. lê nikare bibe felsefe. Ji derveyî dîsîplînên bingehîn, gelek dîsîplîn û mijar jî dikarin xwe di nav felsefê de bi cîh bikin û navê xwe jî li wê felsefê ve bikin: Felsefya zanistî, felsefeya siyasetê, felsefeya perwerdeyê, felsefeya wêjê, felsefeya dewletê...

Lê wekî ku me li jor jî diyar kir, hin mijar hene ku ew eger di nav wê nihêrînê de cîhê xwe negre, ew nihêrin nikare bibe nihêrîneke felsefî. Eve, em ji wan dîsîplînan re dibêjin dîsîplînên bingehîn yên felsefê.

**1. *Ontolojî - Metafîzîk*** (*Heyînasî - Felsefeya Heyînî*)

Dîsîplîna yekem li ser mijara destpêka felsefê ye; mijara hebûnê, yanê ew tiştî ku he ye û felsefe ew ji

xwe re dike mijara destpêkî. Onto, peyveke Yewnanî ye û di wateya heyî de ye. Dîsîplîna yekem naskirina heyî ye. Di vê dîsîplînê de pirsiyara esas ev e; heyî çi ye? Arkeya, yanê paşheyî ya ku bûye bingeha hebûna gerdûnê çi ye? Di Thalesî de av, Pîsagorî de hejmar, Herakleîtosî de agir... Eve destpêka felsefe di heman demê de destpêka ontolojî ye ku em dê ji vê û pê ve jê re bêjin *heyînasî*, yan jî *felsefeya heyînê*.

### 2. *Epîstemolojî û Logîk*

*(Zanyarnasî û Bîrnasî - Felsefeya Zanyarî)*

Dîsîplîna duyem ya felsefê pirsgirêka zanîn û zanyariyê ye. Avzêya zanînên me ji kû tên, em çawa û bi kîjan rêbazan xwedî zanînên di derbarê gerdûne de dibin? Zanînên me çi qas rast û nerast in? Ji bo ku zanîn û zanyariyên xwe bibawer bikin divê em çawa û kîjan rêbazan bikar bînin? Ev jî bi du xalan ve derdikeve pêşberî me; yek ji wan bîrdoziya zanînê û jê re bi Yewnanî epîstemolojî dihête gotin û di zimanê me de jî em dikarin bêjin *zanyarnasî*. Ya din jî *logîk* (mantik) e ku di zimanê me de ev peyîv bi peyva *bîrnasî* dihête bersivandin.

### 3. *Aksiyoloji (Nirxnasî)*

Sêyemîn dîsîplîna bingehîn ya felsefê aksiyolojî ye. Mijarên wê li ser nirxê dihête avakirin. Her çi qas ev mijar di dema Sokrates û Sofîstan jî hatibe genge-şîkirin, ziyatir piştî felsefeya nûdem ya Ronesanê bêhtir ev dîsîplîn ketiya nav gengeşiya felsefî. Em dikarin bêjin di dema Arîstoyî de wek sîstem di felsefê de bi cîh bûye, lê di felsefeya nûdem de berfirehtir cîh

Institut kurde de Paris

wergirtiye. Di hin cereyanên modern yên felsefê de em dikarin bêjin mora xwe daniye ser navenda wê jî. Felsefeya nirxê du beş in:

***a- Etîk** - Sincdarî - Felsefeya Sincî*

Nirxa ku di vê dîsîplînê de dihête mijarkirin, exlaq e, jiyana civak, erk û berpirisyariya mirov di nav civak de û her wisa mirov çawa dikare bibe baş, çawa dikare li hember xirabî xwe biparêze, yan jî em bi formeke din pirsiyar bikin; rindî û xirabî çi ye? Etîk ev pirsiyaran dibersivîne.

***b- Estetîk** - Ciwandarî - Felsefeya Hûnerî*

Ev dîsîplîn jî ziyartir di nav mijarên hûner û wêjeyê de xwe didin diyardekirin. Ciwanî çi ye, ciwan wek dîmeneke ji xweza, ciwan wek kedeke ji destê mirov, ew nirxên ku mirov pê dikare jiyanê xweşiktir bike, yan jî dikare rêya dilşadiyê ji mibo mirovatiyê bihafirîne çi ye? Estetîk, yanê ciwandarî bi van pirsiyaran ve hewil dide ku nihêrîneke felsefî di jiyana mirov de wek hûnereke kûr û bi hêz cîhê xwe bigre.

Institut kurde de Paris

*Heyî-n:*

Berî ku em hin binavkirinan vebikolin, divê em zelal bikin ku di Kurdî de peyvên *heyîn* û *hebûnê* gelek nêzikî hev in. Heyîn û hebûn, bi tenê yek nokteyê de ji hev vediqetin û ev jî cûdahiyeke girîng e. Lê di zimanê me de caran di axiftina rojane de tevlîhev dibin.

Koka vê têgehê he-ye. He, yanê belê, ev tişt bêyî ku ez wê bifikirim, yan jî bêyî ku ez wê hîs bikim yan jî têbigîhîjim, ew he ye. Heyî, rewşa navbûna vê tegehê ye.

***Bo mînak xweza:*** Ev bê min he ye, heyî ye. Bêrî jî hebû, a niha jî he ye û wê he-be jî. Yanê di nav peyva heyî de pêvajoyeke bisînorkirî tune ye. Hê hebûn pêvajoya derketin û berdewamkirina tiştekî ye ku ez dikarim wê seh bikim, yan jî têbigîhîjim. Jiber ku ev mijara girîng di hin fêylesofên nûdemê de derdikevin pêşberî me, divê em ev herdu termên girîng ji hev cûda bikin.

Bo mînak, em dê bibînin ku di ontolojiya felsefeya Jean Paul Sartre yê fêylesofê Fransî de di dêlva *heyîn* de *hebûn* dê bibe esil mijar, yanê pêvajoya çêbûn û berdewamkirina tiştî girîngtir û bingehtir e ji *heyîna* xwe ya bixwe.

Nexwe, vê gave bêjenga me ya *heyînasiyê heyî* ye, ne *hebûn*. Jiber ku heyînasî wek dîsîplîneke sereta û bingeh ya felsefê, li dû wî tiştî ye ku gelo heyî ya sereta û bingeh çi ye? Ew bi hemî derfet û hincetên felsefê ji bo tesbîtkirina heyî ya esil û ewil ya ku her

Institut kurde de Paris

tişt ji bo hebûna xwe mecbûr in ku pala xwe pê bidin. Belki jî bes jiber vê yekê ye ku fêylesof Arîsto *heyînasiyê* wek *felsefeya sereta* bi nav kiriye û her hal bi qasî xwe jî mafdar bûye. Jiber ku bêyî vê pirsiyarê mirov nikare bes gavekê jî bavêje pêş û da bikeve nav pirsgirêkên felsefê.

Arîsto dibêje, *"Felsefeya sereta ew bizav e ku mirov bikaribe ew tiştê ku he ye, wek xwe û bi sere xwe ew he ye, bi wî hale xwe yê saf û bêlêkirî bihête vegotin."*

Jixwe hem di zimanê me de û hem jî di zimanên din de jî mijara heyî û hebûnê, jiber ku di axiftina rojane de pir dihête tevlîhevkirin, di felsefê de û bi taybet di dîsîplîna wê ya yekem ya heyenasiyê de pir dihête tevlîhevkirin. Di jiyana rojane de ev yek hem normal e û hem jî telefiya wê kêmasî yan jî xeletiya wê tevlîheviyê bi derfet e. Lê di felsefê de ev yek her gav ne bi derfet e û dikare bibe sedemên xeletiyên mezintir û bi xetertir.

Jiber ku di xebatên felsefê de pêşî li ber van xeletî û kêmasiyan bihête girtin, her mijar û meram yek bi yek bi rêya tanzîmkirina peyvên zelalkirî û termên bisînorkirî dihête şêrovekirin. Bi vê hewildanê ve ancax em dikarin xwe bigîhînin naveroka heyî ya ewil. Jiber vê jî, me tiştekî wisa dive ku em ji bo ku em bikaribin bêjin "Belê ev tişt he ye" û ev tişt di felsefê de wek "cewer" dihête binavkirin. Cewer ew tişt e ku, ew ji bo heyîna xwe çi pêwîstî bi tiştekî din nabîne. Jiber vê yekê gava me xwe gîhand navînga(cewer) heyînekê, êdî em dikarin qanî bin ku ew tiştê em îdîa



Institut Kurde de Paris

dikin ku heye, bi rastî *ew* wek tiştekî sereta û bingehîn ji xwe û di xwe de heye:

*Heyîna sereta ew e. Cewer (naving-tîn-toz)*

Cewer hem di heyîna xwe de seranser serbixwe ye û pêwîstî bi hebûna tiştekî din nabîne, hem jî ew tiştekî wisa ye ku daîm e, bêdawî we. Jiber vê jî, di felsefê de ji bo ku ev taybetî ya heyînê bihête zelalkirin, heyî wek du beş dihête binavkirin.

1. Heyî ya rastî: Çiyayê Cûdî, dara hinarê, Behra Wanê, Deşta Mûşê heyî yên rastî ne.

2. Heyî ya dihête hizirkirin: Çiyayê Qef, perî, xewin, dêvê çar mil jî heyî yên hizirkirinê ne.

Em dikarin bêjin ku Felsefeya Serdema Seretayî *(Felsefeya Klasîk)* di heman demê de felsefeyeke ontolojîk e. Hemin mirov nikare felsefeyeke weha berfireh bi tenê mijarekê ve bi sînor bike, lê qe nebe heta dema Sofîstan û Sokrates, ya ku em dê yek bi yek wan vebêjin, mijara sereta û bingehîn ya fêylesofan *heyîn û arke* bû, ku ev yek jî mijareke eslî ya ontolojiyê ye.

Gava em behsa felsefeya Serdema Seretayî (Qirneya Ewil - Çaxa Ewil) dikin, bi wateya xwe ya tevayî, em dê behsa çand û felsefeya Kurdistan-Îran, Çîn-Hînd, Anatolya-Yewnanî û Helenîstîk-Romayî bikin. Têgeha Felsefeya Serdema Seretayî, rewşeke çandî û dîrokî ya bisînorkirî bi nav dike û ev serdem di dîroka felsefê de bi yekemîn belgeyên nivîskî xwe dide diyarkirin.

Baş e, madem weha ye, gava behsa felsefeya Serdema Seretayî dihête kirin, çima bi taybet felsefeya

Institut kurde de Paris

Yewnanî û felsefeyên ku ji wê zayîne dihête fêm kirin? Jiber çi em serkeftina ji layê felsefî ya vê serdemê di çandeya Yewnanî de digerin? Gelo ya rast ne ew dibû, ku mirov felsefeya Qirna Ewil bi tevayî bi vî rengî bi nav kiriba?

Na xêr, rast ne dibû, jiber ku em dê bibînin ku, ew felsefeya em bi wateya îroyîn behsê dikin, cara yekemîn ji aliyê fêylesofên Yewnanî hatiye pêşxistin. Ev felsefe, bi felsefeya Qirneya Klasîk yan jî Serdema Kevin dihête binavkirin û berhema serdemeke ji hezar salan zêdetir e, ku felsefeya Yewnanî ji xwe re dike navend û di sedsala 6. ya B.Z. de dest pê dike û heta hilweşana Împeratoriya Roma berdewam dike. Jiber ku ev felsefeya vê serdemê, zêdetirî hezar sal digre hundirê xwe, em bi tengkirina wateyekê ve dikarin jê re bêjin *Felsefeya Antîk*. Li gor vê tesbîtê, eger em behsa vê felsefê bikin, em mecbûr dimînin ku Felsefeya Yewananî bigrin navendê. Lê divê nehête jibîrkirin ku di cîhanê de çi çande saf nemayîne û bi taybet rengên çand û felsefeyên Misir, Mezopotamiya (Kurdistan-Îran) û Çîn-Hînd di vê navenda felsefê de bi her aweyî xwe daye diyarkir.

Her wiha em dê di beşên pêş me de gelek behsa vê mijarê bikin, lê em dikarin ev beşên çandeyan wisa şêrove bikin:

Institut kurde de Paris

*Çanda Helenî:*

Navenda vê çandê Yewnanîstan e, bajarê Atîna di dest-pêkê de lê gelek bajar û giravên Yewnanî yên wek Mîled, Kos, Girît, Rodos, Efes û koloniyên din yên Yewnan û Îtalî cîh û wargehên vê felsefê ne. Her wiha di avabûna felsefeya Yewnanî de bandorên mezin yên çand û şaristaniya Misir û Mezopotamyayî heye. Bi taybet li layê bîrkarî, çandinî, asîmannasî (astronomî) û dîn de ev bandor xwe dide xûyakirin. Di bîrkariya Thales û Pîsagorasî de tesîra erdjimêriya Misrî, di felsefeya Herakleîtosî de jî bandoreke vekirî ya ramana Zeradeştî heye. Bo mînak, yasaya tevgera bê sînor û şerê dijberan yên wek tarî û ronî, rind û xirav, rast û nerast seranser di ramana Zeradeştî de heye û gelek gotûbêjên dîrokî jî hene ku fêylesofên ewil yên dema Helenî yên wek Pîsagoras û Herakleîtos, di şopa Zeradeştî de meşiyane. Her çi qas ev yek bes bi gotinên fêylesofên vê demê de mabe jî, di bajarên Medyayê de bizaveke girîng rû daye, gelê Med Împaratoriya Asûr hilweşandiye û împeratoriya xwe ava kirine. Yekîn di vê *şoreşa mezin* de bandora felse-feyeke mezin hebûye û ev yek îhtîmaleke mezin felsefeya Zeradeştiyê ye. Jiber ku ji gelek aliyan ve di hilweşandina împeratoriya Asûr de em tekoşîneke dij zulmê dibînin, her wisa di vê tekoşînê de rimzên ji agir wek rimzeke evrayî hatiye bikaranîn û Newroz jî jiber vê pîroziya ronahiya agirî hatiye pîrozandin. Dîsa dihête texmînkirin ku di vê serdemê de (B.Z. sedsala 6.) felsefeya Zeradeştî jî di rojevê de ye û di navbera bajarên çandî wek Edesa, Ekbatan, Ur, Babîl û

Institut kurde de Paris

Nînewa wek cereyaneke siyasî, exlaqî û olî her diçe berev revaçbûnê diçe. Wekî ku dihête zanîn Zeradeşt wek kurê Arîstokratekî ji Urmiyê dihête dunyayê û gelek deveran jî geriyanan dike. Îdîayek jî heye ku ew li Bexdayê ders dane hin fêylesofên biyanî yên ku ji aliyê welatê Yewnan hatine.

Bi avabîna Împeratoriya Medan, li Mezopotamya, bi navendiya Medya, ji aliyekî li welatên Îran û ji aliyekî jî Anatolya û heta giravên Yewnanîstanê *dewletên nû yên „fedaratîf"* ava bûn. Dîsa bi vê pêşkeftinê ve jî nemaye û ev car jî di navbera sedsalên 6. û 5. ya B.Z. de jî li Yewnanîstanê, ev *Polîsên Fedaretîf* (sîteyên fedaretîf) hatine avakirin û felsefeya Yewnanî jî wek *mûcîzeyeke* bê mînak ketiye dîroka çand û ramana mirovayetiyê. Bi kurtayî em dikarin bêjin di çande û felsefeya Helenî de bandoreke mezin ya „zanistiya" Misir û Mezopotamya û bi taybet jî tesîra „Ramana dînî-felsefî ya Zeradeştî" wergirtiye, lê dîsa jî em divê bêjin ku di dawiyê de warê felsefeya bi rêkûpêk û bi pergal, welatê Yewnan bûye.

Institut kurde de Paris

*Çanda Helenîzmê:*

Ev jî beşek ji felsefeya Antîk e û ji dema Aleksandrê Mezin dest pê dike û heta hêrişên Romayiyan ya B.Z. 30 berdewam dike. Di vê serdemê de jî ev car çande û zanistiya Yewnanî di Misrê de belav bûye û ev çande, hemî welatê Misrê xistibû bin bandora xwe. Di vê serdemê de navenda felsefê ji bajarên Yewnanî û bi taybet ji Atînayê berev bajarên welatên rojhilatî yên Misrê şiqitî û mijarên felsefeya bîr û bawerî hêdî hêdî cîhê xwe da mijarên felsefeyeke ku li ser dîmengeha mijarên zanyariya *xwezayî, bîrnasî û bîrkariyê* dide jiyandin. Gava em vê serdema felsefeya Helenîzmê lêdikolin, bi hêsanî dihête dîtin ku mijarên zanistiyê ketiye pêş mijarên felsefî ya mûcerret û her wiha di cîhên *Xwendegeh* û *Akademiyên Felsefî* jî, cîhên xwe hîştina *Xwendegehên Zanistî û Mekanîkî*. Bo nimûne di serdema Helenî de *Bazara Agora* ya felsefî ya Sokratesî, *Akademiya Platonî, Lîseya Arîstoyî* cîh û wargehên girîng û sereke yên felsefê bûn, lê di serdema Helenîzmê de em dibînin êdî Xwendegehên Zanistî bûne revaç û bo mînak, *Xwendingeha Mekanîk ya Îskenderiyê* (Misir) li ser raman û felsefeya Helenîzmê dewreke mezin dîtiye.

Cûdahiyeke girîng ya di navbera felsefeya Helen û Helenîstîkî de ev e:

*Di felsefeya Helenî de bingeh mijarên felsefî bûn û fêylesofên wê di heman demê de mijarên zanistiyê jî li gor xwe şêrove dikirin.*

Institut Kurde de Paris

*Lê di felsefeya Helenîstîkî de ev yek berevajî ye,* yanê akterên bingehîn yên wê zanist in û mijarên bingehîn jî mejiarên zanistî yên wek fizîk, mekanîk, bîrkarî û erdjimêrî bûn û her wiha fêylesofên Helenîstîkî jî, li gor xebatên xwe yên zansitî carina mijarên felsefî şêrove dikirin.

*Yanê bi kurtayî di Helenî de bingeh felsefe ye û zanistî li gor wê dihête şêrove kirin, di Helenîstîkî de jî bingeh zansitî ye û felsefe li gor zanistî dihête şêrovekirin.*

*Felsefeya Romayê* jî bi dagirkirina Misrê ya ji layên Romayê dest pê dike û heta hilweşana Romayê ya berdewam dike. Ev hersê serdem jî, di warê şaristanî, çandî û felsefî de gelek gûhertin û cûdabûnên di navbeyna xwe de didin diyarkirin. Lê li gel van guhertin û cûdabûnan, bi tevayî em bizava raman û felsefeya van hersê serdeman wek *felsefeyeke klasîk* ya Qirna Ewil yan jî *felsefeya serdema seretayî* bi nav dikin.

Institut kurde de Paris

## Beşa Duyem

### *Ramanên Kevin di Dîroka Felsefê de*

Wekî ku bi gelemperî nihêrîna dîroknasên felsefê digîhîne hev û di yek bingehîn de dike xwedî ramaneke hevbeş ev e: Her çi qas bi wateya xwe ya rasteqîn felsefe bi Serdema Sereta ya Yewnanî ve bihête destpêkirin jî, li ser felsefeya Yewnanî ya kevin de jî bandorên mezin hatine pêkanîn. Gerçê di vî warî de jî hin nihêrîn hene ku dijberên hev in. Bo mînak hin fêylesof û bi piranî jî yên Ewrûpa destnîşan dikin ku di serdema B.Z. 600-500 de bi yekcarî, li gelek erdên qewmên cûda nihêrînên felsefî hatiye çirûsandin. Wekî rûdaneke tesadûfî ne mûmkûn e ku di heman sedsalê de li erdnîgariyên cûda cûda yên wek li Mezopotamya Jorîn Zeradeşt, li Helenyayê Thales, li welatê Hîndî Bûda, li Çîn Konfûçyûs bi heman qesawetê ve dest bi hewildana fêmkirina dunya, xweza û gerdûnê bikin û bizaveke berfireh û kûr ya felsefî di heman sedsalan (B.Z. 6. û 5.) de, lê erdên qewmên cûda cûda de dest pê bike. Bi rastî ev yek bi serê xwe mijare lêkolîn û xebateke giran e ku sedemên vê yekê bihête şêrovekirin û hin encam jê bihêtin derxistin.


Institut kurde de Paris

*Zeradeştî - Mazdeîzm*

Raman, destpêka serenca mirovbûnê ye. Mirov, ji bo avakirina hacetên xwe, çawa dest bi karê xwe kiriye, da ku jiyana xwe pê bidomîne, em dikarîn bêjin ku raman jî pê re dest pê kiriye.

***Rind bihizre***
***Rind bibêje***
***Rind bike***

**Zeradeşt**



Institut kurde de Paris

Le berê her tiştî, kî bixweze xebatekê li ser fikir û ramana seretayî çêbike, divê têkliya raman û jiyana xwedî ramanê, derbixîne holê û ji wê û pê de dest bi nacihkirina armanca xwe bike. Eger ev metode baş nehête şopandin, ti encameke zanistî, rêkûpêkî û mejiyî nayê sitandin. Bes karekî bê sîstem û bê bingeh tê çêkirin, ku ev jî me nagîhîne armanca me. Jiber vê yekê jî, em, xwe wek berpirsiyariya peyvên xwe

dibînin û dixwezin, berî her tiştî ji bo zelalkirina vê têkeliya seretayî hewil bidin

Dema fêylesofê Helen yê bi navûdeng û destkêşê Felsefeya Xezayî (Felsefeya Tabiî), Thales, pênc sed sal berî Îsa, gotibû ku "Cevherê Hebuna Girse (yanê Gerdûnê), *av* e. Eger hêzeke me ya ji bo guherandin û jihevkirina ev heyiyên gerdûnî hebûya, me dikaribû ev hemî vegerandibana Avê, ya ku ew jiyandara hemî tiştan e." (1)

Thales di bajarê Mîledê nêzikî Anatolîayê de dijiya. Mirov dikare bifikire ku ev tesbîta Thales, jiber bandora cihê jiyana wî bûye; ev jî, her çiqasî li me tiştek wisa ihtiyadî xûya be jî, rastiyeke bi serê xwe ye. Jiber ku mirov wek xwedî hêzeke bizavî û viyanparêzî (îradexwezî), dest li ser ferweriya xwezayî daniye, ji bo şekildana bîrûbaweriya wê jî divê sedemeke xwe û ya forma hizra xwe jî hebe.

*Ev sedem jiyan bixwe ye.*

Lê ev tesbîte, bes destpêkekê dide me ku em bikevin nav pirsgirêka mijara me û li ser wê bikaribin, ku hîn bêjengên seretayî bikar bihînin. Jiber ku me destpêkeke rast û bi bîrnasî divê. Jiber vê jî, em dixwezin vekolîneke bikin, da bizanin ku ji bilî jiyanê, kîj bandorên din hebûn li ser vê tesbîta Thales de? Gava me vê yekê ji xwe pirsiyar kir, em dibînin ku hewildanên Thalesî yên li ser xalên din yên zanyarî û felsefeya xwe de, gelek bandorên derweyî ji Helenîkî jî hene û li ser raman û baweriya wî de bandora çanda Misir û Mezopotamyayê, cîhekî zor mezin digire. Ji wan yek û herî balkêş ev e:

Institut kurde de Paris

Ev formula bîrkarî (matematîk) ya ji hêla Thales hatiye afirandin, bingeha xwe ji bîrkariya Misrê staniye. Dîsa bi zimanê bîrkarî dema mirov bide îfadekirin; eger A//B ye û B//C ye, wê çaxê A//C dibe. Ev formûla hanê, hê jî di *bîrnasî*(mantiq) û bîrkariya hemdem de derbas dibe.

Eger em bixwezin, ji van gotin û pêşberdanên (idiayên) xwe tiştekî berbiçav derbixînin; her çend gelek mînak hebin jî, ku me mecal nedî wan di vê mijarê de bînîn xwarê, em dikarin bêjin, ku Zanyarî û Felsefeya Helenîkî, ji her aliyê ve ji çanda Misrê û Mezopotamyê pir bandorên mezin wergirtine. Ya bi rastî, Thales *pergala* (sîstema) xwe ya zanyarî û felsefî ya seretayî li ser van çandên kûr saz kiriye(2).

Ji hêla din bandorekê jî, ya ji çanda Mezopotamiya bi taybet jî, bandora Mezopotamiya Jorîn (Kurdistan), li ser Ramana Helenîkî de çêbûye. Wekê ku me di destpêka vê nivîsê de diyar kiribû, ji seretaya Felsefeya Xwezayî, mîna Thales, fêylesofên din jî ketin binê bandorê vê çandê.

Ji van fêylesofên herî girîng, Herakleitos e. Ev fêylesof, di pirsgirêka cevherê gerdûnê de, bandoreke mezin ji Mazdeîzme werdigre û "Agir" ê wek yekemîn hebûnê dipejîrîne. Bi taybet,wî zayîn û berdevama jiyan û gerdûnê mîna rewşa agir teswîr kiriye, ku her tişt lez bi lez wekî agir, pêşdiçe û diguhere. Ev tesbîte, hem bi bîrnasî hatiye pesend kirin û hem bi rengekî olî (dînî) hatiye pîrozandin.

Institut kurde de Paris

Li gor felsefeya Herakleitosî, her tişt, daim diguhere û jiyan ji guherina reş (tarîtî) û spî (ronahî) avadibe(3). Bi gotineke din, cewherê hebûna gerdûnê ji guherinê ve hatiye avakirin. Bi gotina Herakleitos, "Tiştî ku naguhere, ew tişt e ku her dem diguhere." Jiyan ew qas bi lez û ji naveroka cewerê ve diguhere ku, "Kesek nikare du caran bikeve li heman çemî." (4)

Jiber ku ew kes, heta dest bi ketina avê ya duyemîn dike, zû ve guheriye û çem jî bi ew kes re guheriye.

Bi kurtî dema mirov dikare bibêje, di felsefeya Herakleitosê de jiyan daim diherike û diguhere. Ev raman bûye bingeha diyalektîkê; lê neyê ji bîrkirin, ku bingeha vê nêrînê, ji ramana Zeradeşt avzê dibe. Yekîtî û şerê nakokiyan, wek *reş û spî, rast û çewt, baş û xirab, rind û nerind;* ev nakokiyan hemî bûne bingeha hebûna gerdûnê û jiber vê jî jiyan daîm di nav şerekî bêdûmahîk de berdewam e.

Ev berdewamî, jiyanê dimeşîne û bizavendekê (dînamîzmekê) dixe nava jiyanê. Bi rastî jî, em dê xalên di pêş me de bibînîn, ku wek despêkeke giranbûha ramana Zeradeştî, di bingeha felsefeya diyalektîkî de xwe bi cîh kiriye.

### *Jiyana Zeradeştî*

Di dîroka nivîskî de navên Zeradeşt (*Zarathustra, Zaroastra, Zarasthor)* bi çend şêweyan hatine gotin û her hal li gor ziman û çandên cûda ev nav jî hin guhertin dîtine. Bi her aweyî dihête fêmkirin ev nav navekî bi zimanê Mediyayî ye. Û dîsa li gor gelek

Institut kurde de Paris

lêkolînan hatiye dîtin ku avzêya vî navî jî, di nav zimanên dunyayê de herî nêzik di nava Kurdî û zaravên Kurdî de xwe dide diyarkirin. Bo mînak, Kirmanckî, Zarya-astare, zimanê stêrka; Zeryaastare, yanê *zêra stêrk*. Bi menayeke din jî, di Kirmanckî û Kurmancî de zare, zar, tê wateya qêrîn, gotin, texlîd, jiber girtin û esil jî, *zarave*. Zareastare, tê wateya *zarava stêran*, bo mînak "Zarastêr"(6). Bi zarava Kirmanckî *astare*, tê mena stêrê. Lê tiştekî heye ku, mijara li ser avzê û menayên navê Zeradeşt dûr û direj e û ev yek bi serê xwe babeteke cûda û bi taybet e. Lê di derbarê jiyana wî de, em dikarin hin tiştan bibêjin.

Tê pejirandin ku hem weke felsefeya mîtolojik, hem jî wek oleke bi sistema di nava hev de, wî bingeha ramana *Mazdeîzmê* ava kiriye. Mazdeizm jî, hem ji hêla pergala ramanî, hem jî biryarên yên etîk û pîroziya zagonên *Xwezayê* de, wek konaxa herî bilind ya raman û ola Mediyan dihemberîne. Hin felsefedarên dunyayê, Zeradeşt bes wek pêxemberek dihesibînin. Bi rastî ev idia, hem kêm e û hem jî, ji layê dîroka raman û felsefe de wek nirxandineke zeyîf dixûye.(7) Jiber ku *Mazdeizm* ji bilî olekê û ji wê jî pêştetir, bi *şêwazeke ramanî û felsefî* avakirina jiyaneke nû ye. *Di vê jiyana nû de ji aliyekî ve jî daxweza vegereke paş ve berev jiyana komûnalîzma seretayî heye.* Û ji bo dîroknasek felsefî ev daxwez bi tenê serê xwe jî dikare bibe sedema lêkolîneke kûr ya felsefî û zanistî...

*Jixwe em dê di dîroka felsefê de jî bibînin ku piştî felsefeya Mazdeîzmê, tesîra wê ramanê li ser felsefeya Yewnanî wisa kûr û bi rengîn çêbûye ku heman heman piranî fêylesofên Yewnanî; çi hizirpersit (îdealîst) çi jî madeperist, di bingeha*



Institut kurde de Paris

*sîstema xwe ya felsefî de peyvên girîng û hûmanîstî, yên wek "dadwerî, wekhevî, azadî, exlaq û ahengî" bikar anîne û ev yek bi serê xwe jî dikare bi me bide destnîşankirin ku Mazdeîzm vegereke aqlî û felsefî ya berev jiyaneke "wekhev" e û her wisa dîroka felsefe jî bi lêgerîna van peyvan bûye sehneyeke girîng ya vê hewildana fêylesofan.*

Em dikarin bêjin di vê warî de Mazdeîzm dijberiyeke jiyana *bajariyan* (dewletên wek bajar, sîte-dewlet) e, ku ew dewletan bi xwe temsîla *pergala Koledariyê dikir*. Em dizanin ku gelek ramanêr ji bo vê nihêrîna han negatîv bifikrin û bi wê aweyî bixwezin ku hizra me birîzînin:

*"Eger Mazdeizm, di dijberiya jiyana koledariyê de carna dixweze pevajoyê paşve, berbi jiyana Komûnalîzmê bibe; ji bo çi bûye bingeha olên yekxwedayî? Jiber ku Olên Yekxwedayî di heman demê de bûne îdeolojiyeke miqedes di bingeha sîstema koledariya nû (feodalîzmê) de."*

Bi rastî ev pirsiyare, gelek di cîh de ye û mafê her kes heye ku rêça vê nakokiyê bişopîne. Lê em dikarin vê pirsiyarê bibersîvînin.

Berî em hinek nihêrînên xwe yên li ser naveroka Mazdeîzmê kûr bikin, da ku ji bo vê pirsiyara li jor, bi rengekî zanistî û bîrnasî zelal bikin.

Berî her tiştî, em dixwezin bêjin ku zanyarî, çîrokên efsaneyî, sîstemên zagonî û ramanên "felsefî" di çaxên Beriya Îsayê de, bi gelemperî xwedî taybetiyekê ne, ku ev ji vê dema me gelek cûda ye. Ev xalên ramanî yên me li jor diyar kirin ne zelal bûn, tevlîhev bûn. Yanê;



Institut kurde de Paris

zanyarî, hûner, ramana olî, sihêr, tib û felsefe tevlîhev dihatin meşandin(8).

Ev rewşa hanê heta dema Helenîkî berdewam e û ji vê pê de ji hev cûdabûn dest pê dike, ku sedemeke girîng ya *Mûcîzeya Yewnanî* jî ev e. Nexwe, em eger behsa felsefe, zanistî, hûnerên yekem (destan, şano, poetîka, tragedya ûwd) bikin, yekser serdema Helenîkî dihête bîra me. Lê ev nahête vê wateyê, ku berî Helenîkî ti car ev mijarên çandî nehatine zanîn. Belê hatine zanîn, lê bi aweyî jihev zelalkirî û xalên cûrbecûr wek dema şaristaniya Helenîkî, nehatiye meşandin, eger hatibe jî, îsbad û delîlên îro di destê me de hene, têra vê gotinê nakin.

*Felsefeya Yewnanî sentezeke bi pergal ya ji felsefe û çandên dewr û ber e.*

Felsefeya Yewnanî ev xalên çandî bi rengekî cewerî berhev kirine û bandoreke mezin li ser raman, fikir, zanistî û olên yekxwedayî (Xirîstiyanî û Îslamiyet) de çêkiriye. Em dê, beşeke din de behsa vê jî bikin, lê bes bi nirxandineke kurt,em dikarin nimûneyekê bidin; ku li ser Xiristiyanî zêdetir felsefeya û bîrnasiya Arîsto, li ser Îslamiyet jî felsefeya Platon bi bandor bûye.

*Zeradeşt kîjan dem jiyaye?*

Gelek dîrokzanên ramanî îdîa dikin, ku Zeradeşt di navbera salên 660-577 ya B.Z. de jiyaye û ol û ramana xwe belav kiriye.

Hin dîroknûsên kevin jî dibêjin Zeradeşt, 5000 sal berê Şerên Trovayê (şerên Pers û Helen) jiyaye, yanê di salên B.Î. 5500-5600'an de. (Xwediyên ev tezên



Institut kurde de Paris

hanê, Dîogenes, Hermodorê Platonist, û destana dîrokî yen bi navê Isis û Osiris, ku ev ji hêla Pline û Plutarkos hatiye nivîsandin yan jî berhev kirin(9). Di kevrenûsên (tabletên) Asûriyan de jî dihête destnîşan kirin ku ew gelek berê jiyaye, lê em zêdetir mêla xwe didin li ser teza Edward Meyer, ku ev dibêje:

*"Mazdeîzm B.Z. di navbera sedsalûn 6. û 5. de di nav Midyayiyan de bi bandor bû. Îhhtîmaleke pir mezin e ku Zeradeşt di van deman de jiyabe."(10)*

Balkêş e, wekî ku Meyer gotiye, dema belavbûna bandora ramana Mazdeîzmê li ser Mediyayiyan û gelên din yên Mediyayî berî şoreşa yekem e ku, ramana Mazdeîzmê di nav gelên hindestan de bûye wek *bîrdoziyeke evrayî* ya serhildanê û weke dihête zanîn, bi vî aweyî împaratoriyeke zulimkar (Asûr), bi pêşengiya Medan û ji hêla van gelan hatiye hilweşandin.

Hin dîrokzanên felsefê jî, pêşberdanê dikin ku, Zeradeşt berî perwerdeya xwe li Hîndîstanê, li cem keşeyên Brahmaniyan wergirtiye. Lê piştre, di derheqê newekheviya çînên nav mirovan de, bi wan re ketiye nakokiyê; jiber ku Zeradeşt li dij sîstema koledariya Pergala Qastê ya Brahmaniyan derketiye, ji wan reviyaye û hatiye welatê Mediya.

Ev îdîayên li jor, bi gelemperî rast bin jî, derfeta îsbadên wan nîn e. Lê bi rastî em hewceyê wê îsbadê jî nîn in. Jiber ku, ew paraleliya di navbera ramana Mazdeîzm û hin fêylesofên Yewnanî (Pîsagoras, Herakleîtos, Demokrîtos, Empedokles ûwd), li ber çavan e û me di vî warî de îqna dike ku bandoreke

Institut kurde de Paris

mezin ya ramana Zeradeşt li ser felsefeya Yewnanî de hebûye. Jixwe dîroka felsefê de aşîkar e ku heta çi fêylesofek tune ye ku bêyî ku bi Herakleitos û Pîsagoras bide û bistîne, nikare di derbarê hebûn û zanînê de ramaneke felsefî biafirîne. Bandora Zeradeşt li ser van herdu fêylesofan wisa pir e ku em dikarin bêjin herdu jî hem di avakirina bingeha metafîzîka xwe û hem jî prensîbên nirxedarî û pîroziyên felsefeyên xwe de ji Zeradeşt gelek tişt wergirtine, lê li gor xwe jî guhertinan pêk anîne.

Bi çi rengî dibe bila bibe, em dibînîn ku bandora ramana Zeradeşt li ser van fêylesofan heye. Herdu jî cewerê yekem ji Zeradeşt wergirtine. Lê bi taybet felsefeya Herakleitos û rêbaza felsefeya wî ya "dijberî û şerê wan" (prensîba yekem ya tevgera diyalektîkê) seranser ji ramana Mazdeîzmê hatiye wergirtin.

*Zeradeşt weha dibêje:*

*"Hêy Hom! (Di Kirrmanckî de jî Hom, mena Xwedê ye) Ez duayên xwe dişînim ji te re ku, tu feqîr û dewlemendan dikî mînahev û di nav jiyaneke xwetêr de didî jiyandin!" (11).*

Û cîhekî din jî wisa destûr dide qewmê xwe:

*"Ew Şahê ku ne bi dilê we ye, daxînin jêr."*

Jixwe hin dîrokzan jî dibêjin, Zeradeşt jiber vê gotinên xwe yên şoreşgerî, di dijberiya koledariyê de bi Brahmaniyan ve ket nakokiyan û wan, Zeradeşt wek xayîn îlan kir û bi salan ji bo kuştina wî, hicûmê ser welatê wî kirin, lê ser ne ketin. Hin jî dibêjin Zeradeşt bi destê Brahmaniyan hatiye kuştin (12).

Herakleitos ji, wekheviyê wek zagoneke bingeha xwezayê qebûl dike û bi nêrîna wî, eger kesek ji bo vê wekheviyê tekoşîn neke û binkeve, ew ne mirov e, ew "birr" e.

Hemin gelek tiştên cûda di vê derbarê de dikare bihête diyarkirin û jixwe hem ji layê felsefe û raman, hem jî ji layê prensîbên ramana ku di jiyana rojane de hatine pêşxistin, bi rastî bi me dikare bide ronîkirin ku Zeradeşt bandoreke dûr û dirêj li ser dîroka felsefe û fêylesofan de hîştiye. Çend xalên ku em dê di rûpelên pêş de şêrove bikin, ew dê bixwe vê nihêrîna me piştrast bikin.

Bo mînak, di fêylesofên ewilî yên destpêka felsefeya Yewnanî de mijarên etîk, jiyan, exlaq, azadî, wekhevî yan qet nehatiye gengeşîkirin yan jî di nav sîstema wan felsefeyan de cîhekî pir biçûk dagirtiye ku bala mirova nekişandiye. Di mijarên wan de (Ji Thales û pêve heta Empedokles) giraniya mercên gengeşiyê li ser made, hebûn, arke, tevger û guherîn, yek û pir ûwd. hatiye avakirin. Lê ramana Mazdeîzmê de li gel van mijarên bingehîn ya felsefê, mijarên etîk, perwerde, exlaq û dîn jî gelek cîh girtiye û heta di jiyana rojane de wek kevneşopî û pir caran wek yasa xwe dane diyarkirin. Jixwe hem di avabûna împeratoriya Mediya û hem jî dû hilweşana wê ya ji layê Persiyan û avabûna împeratoriya Persî de yeqîn bandoreke mezin ya vê felsefe û ramana Kurd heye. Belê, me ev felsefe wek felsefeya Kurd binav kir, jiber ku jixwe ew ramaneke felsefî ye, ku ji layê fêylesofê Kurd (Zeradeşt) û ji nav axên (Urmiye) Kurdistanê hatiye zayendin û weşandin.

Institut kurde de Paris

Eslen felsefeya Mazdeîzmê yek bi yek şoreşa Med ya li hember împeratoriya Asûr dihemberîne û wek bîrdoziyeke qewmî û pîrozî ya şerê azadiyê ye. Lê jiber ku ew serdema bêhtir bîrdozî û ramaneke wek hacêta fetihkirin û dagirkirinê dixwest, ramaneke wek Mazdeîzm, ya ku ew heta *jin û mêran* jî *wekhev* dibîne û wek seretayî be jî *sîstema federalî* dixe pêş xwe, gelê Med nedikarîn ku wê împeratoriyê bimeşînin. Her wisa di hilweşana Mediya de jî axiftineke balkêş ya di navbera Astyages û Harpagosî derbas dibe: Jiber ku Harpagos zulma şahê Mediyan Astyages ya li hember vî wezîrê xwe kirî û goştên zarokê wî bi wî daye xwerin, Harpagos jî bi serperiştiya Kûroj (neviyê Astyages yê ji eşîreke Persî) tevlî îsyana dij Astyages dike û wî bin dixîne. Wê demê Astyages ji Harpagosê wezîrê xwe re wisa dibêje:

*"Kûroj neviyê min e, lê bavê wî Pers e û tu dê niha ji yekî Persî re xizmetkarî bikî. Madem te li hember min ev xiyanet bikar anî, ez ji pişta xwe ve birîndar kirim, qe nebe tu bûbayî şahê Medan û qewmê xwe nexistibaya bin lingên xizmetkarên me yên berê." Û Harpagos jê re dibêje, "Ev xizmetkarî ji şahiya te ewlatir e."*

Ev diyaloga trajîk diyar dike ku di bingeha vê ramanê de toleranseke li hember zulmê tune ye û eger ev zulim ji şahê qewmê xwe jî bibe, divê dij derkeve û wê hilweşîne. Jixwe miletê Kurd ji Medan û pê ve ev prensîb di giynanê xwe de dane jiyandin ku qet dîn û îdeolojiyeke nû jî nekariye hizra wan ya di vî warî de biguherîne û jiber vê jî li ser axa xwe de nekarîne bibin xwedî dewleteke serbixwe.

Institut kurde de Paris

*Prensîbên Mazdeîzmê*

Ji aliyê din, di Ramana Mazdeîzmê de insan wek jiyanbijek bi giyan, bi sê beşê ve dihête dîmenandin (tesvîr kirin): Mirov bala xwe bide ser; ev prensîbên bingehîn ji hêla ramaniyê de yekem in û ji vê û pêda heya îroyîn jî, hemî felsefe û dînên seretayî û nûdemî, ji vê bandorên Mazdeîzmê rizgar nebûne. Gelek cûdabûn û pêşketin dibe ku çêbibin û ev jî xwezayî ye. Lê ji hêla cewerê prensîban de em dikarîn bêjin ku ta îro jî gelek xalên wan prensîban carî ne.

*Can (Prensîba Jiyanê)*

Ev ji bo hêzgirtin û parastina berdewama jiyana mirov e. Ev prensîbe, di nav laşê mirov de bicîh bûye û erka wê ya herî giring damezrandin û parastina ahenga qismên laşê mirov e. Eger ev prensîbe, ji holê rabe, mirov nexweş dikeve û dimre. Ji bo vê jî Zeradeşt dijê rocîgirtinê ye. Wisa dibêje:

*Divê em ji nemetên Xweza baş fayde werbigirin, ku em cotên rind bajon û xwedî zarokên bi tendirûstî bin.*

Eve, li ser nêrîna tendûrîstiyê ya Hîpokratos de baş dihête xûya kirin, ku rêbazên zanistiya tendûrîstî yên ji bo dermankirina bi nemetên xwezayî û prensîba jiyanê, yek bi yek ji Zaradeşt wergirtiye. Ev prensîbe ji hêla Hîpokratos wek prensîba hemî jiyanbijan (hemî zîndeyan), bi wekhev û ahengiya rewşên jiyanê ve xwe didin jiyandin. Di laşê jiyanbijan de ji her elementên xwezayê li gor pîvana pêdiviya xwe hene; eger ji vê zêde yan jî kêmtir be, ev dibe sedema



Institut kurde de Paris

nexweşî, yan jî mirinê. Jiber ku mirov ji ber nexweşî nemire û jiyana xwe berdewam bike, ew mecbûr e ku hevdektin an jî têkçûna ahenga laşê xwe carna bîne ser rewşa xwe yê berê, xwe dirûst bike. Ji bo vê yekê jî, hemî derman di nav xwezayê de amede ne.

Ev nihêrina hanê dema ji zanistiya tendrûstiyê de derbasê felsefê dibe, *prensîba jiyanê* dibe *prensîbên birayetiya jiyanbijan.* Yanê birayetiya însan û heywanan. Di gelek ol û mezheban de jî (ji ola Bûdîzm bigre heta di ramana Pîsagorî de) ev nihêrîna evrayî û îlahî wek "derbasbûna giyan" xwe diyar dike, ev yek bingeha xwe ji Mazdeîzme digire ku jiber vê ji xwerina goştên heywana demeke dirêj, di nav gelên Mezopotamiyan de hatibû qedexe kirin. Her çi qasî sedemên olî li ser vê de bandoreke mezin kiribe jî, esil sedem ew e ku Mazdeîstan, bi vê qedexekirinê dixwest ku ahenga xwezayê xirav nebe. Yanê di kultura gîhaxwiran de (vejiteryan) de, bandora vê nêrîna „destpêka vejîteryanîzmê" gelek giring e. Di dawiyê de ev qedexe, jiber ku rê li pêş birçîbûnê were girtin, nehatiye berdewam kirin, lê di dewsa wê de qedexeyên cûda hatiye ferz kirin. Ev jî, di hîn cîhan de bi qedexeyên xwarina goştên heywanên mê, di hîn cîhan de jî yên nêr de xwe diyar kiriye.

Dîsa di Mazdeîstan de serjêkirina dewarên nêr (bi taybet gayên kotanê) qedexe bûye, jiber ku ew ajalên berhemdananê ne û bi mirovan re tevlî berhemê dibin û di saya wan de zevî têne acotin, genim serî didin û mirovayetî xwe di jiyanê de her tim pêş dixe. Sedemeke din jî ajotina zeviyan, mirovan têr dike û bi vî

aweyî hem pirsgirêka birçîbûna mirov hatiye çareser kirin, hem jî berdewama jîyan û xwezayê parastin.

*Jiber ku "mê" bûye bingehekê ji bo zêdebûna jiyanê.*

*Di vî warî de diyalektîkeke ji Zeradeşt ta Protogoras û ji wir jî heta îroyîn ya di aheng û parastina xweza ya devereke Kurdistanê, devera Barzan bi rastî pir balkêş e.*

Protogoras, fêylesofekî girîng û mezin yên fêylesofên *sofîst* yên Yewnanî ku ew di dîroka felsefê de dewreke sereke dilîzin, di derbarê gîhaxwerin û goştxwerinê de aforîzmayeke pir xweşik pêk aniye.

*Protogoras weha dibêje:*

"Gelî mirovan, hûn bi xwerinên gunehkar pîroziya laşê xwe bi gemar dikin, êdî dawî li vê kiryara xwe bînin. Binihêrin, genimên me hene, di baxên me de tiriyên me yên gehîştî hene, gelek gîhayên me yên bi tahm yên ku hinekan ji wan di agirî de dihên pijandin hene. Hûn ji şîr mehrûm nîn in, ji hingivê jî, ku ew li ser pelên çîçekên pûng de bêhneke ewende xweş dihêlin. Dunya bi dewlemendî û comerdiya xwe ya bêdawî dikare hemî pêdiviyên we bibersivîne û bêyî ku hûn hewceyî kuştin û xwînrijandinê bin, dikare ji we re her cûre xwerin û vexwerinan bide. Goşt bi tenê birçîtiya ajalên dirinde têr dike. Hesp, mî û heywanên çewlikan bi çêre ve xwedî dibin. Lê heywanên jakav û hêrişkar, wek şêr, piling, gur û hirç xwerinên xwe bi halê xwînkirî hez dikin. Ax ev yek çi qas xelet e, laşên ji goşt bi goşt xwedîkirin ma hûn dizanin çi qas xelet e... Qelewkirina laşekî çavbirçî bi xwerina laşek din... Girêdana jiyana jîndeyekê bi mirina jîndeyek din...

Institut kurde de Paris

Çek berî bi tenê xwîna heywanên dirinde dihatin lewtandin û diviyabû bi vê lewtê ve bima ev dunya. Ez dizanim, kuştina heywanên ku ew ji bo jiyana me bi xeter in ne gunehkarî ye, lê çi dibe bila bibe, divê goştên heywanan nehête xwerin..."

Protogoras vê nihêrîna xwe ji feylesofê Kurd Zeradeşt, werdigre: Lê li gor ramana Zeradeşt kuştina heywanên dirinde jî (bi armanca nêçîrvaniyê) tiştekî xirab e. Heta, mirov divê miriyên xwe jî li ser bircên bilind dayne, ji bo ku bila ji heywanên jakav re bibin xwerin. Jiber ku ax bi miriya mirovan diherime û şîvbûna miriyan bo heywanên jakav jiyana gelek jiyanbijên mesûm û bikêr diparêze.

Piştî hezaran sal ev qedexe ji aliyê Mela Mustefa Barzanî hate berdewamkirin û a niha li devera Barzan jiyaneke wisa bi aheng û aşîtiyane di xwezaya wê ya ku di axên xwe de hezaran enfalkiriyan vedişêre de dimeşe. Ev jiyana ku li dever û navçêya Barzan ya ku ji bo parastina dar û daristan û hemî ajalên di daristanê de hatiye hevdesazkirin, bi dilaşdiya mirov, xweza û hemî ajalên vê deverê, wisa balkêş e ku bi rastî hêjayî lêkolînan e.

Di felsefeya Mazdeîzmê de ji bo jinan nirxeke mezin heye û sedama vê jî, nêrîna Mazdeîstan ya li *prensîba jiyanê* ye. Bo mînak, di vê sîstema raman û baweriyê de zevaca mêrekî bi gelek jinan, bi destûreke evrayî hatiye qedexe kirin. Jiber ku ev forma zevaca hanê, ahenga jiyana seksûalîtêt têk dixe. Ji layê tendûrîstî, exlaqî, aborî û hestyarî û li ser jin û mêr û li ser hemî jiyana civakî bandorên xirab dihêle.

Ji bilî Hîpokratos; Arîstoteles, Lucretius, Galenos jî, ev prensîba hanê xistine bingeha felsefeya xwe û em bala xwe didin ku ev hizir ji Aristo derbasî fêylesofên Îslamî yen wekî Îbnî Sîna, El Kîndî û Farabî jî bûye. Di felsefeya Îslam de ji bo vê prensîbê, têgeha *nefsê heyatî* hatiye bikar banîn(13).

*Akko - hizra sincî (hizra exlaqî)*

Bi binavkirineke din em dikarin ji vê rê bêjin *aqlê sincî*. Bi saya vê şiyane(meleke) ve em bi vê dikarin başî û xirabî ji hev cûda bikin, xwe ji xirabî diparêzin û fêm dikin ku bi tenê, bi vê helwestê ve em dikarin jiyaneke baştir û dilşadtir bijîn. Eger em jidil bixwezin, em dikarin vê jiyanê bi vî rengî xweşik û bi nirxên sincê ve tijî ava bikin.

Peyva *hizra sincî* ji hêla gelek fêylesofên û hem-dem de hatiye bikar anîn. Platon, Descartes, Kant ji van fêylesofan yên girîng in.

*Kant têgeha mejiyê kiryarî, yanê ew hêza ku sinca erkê(14) ava dike bikar aniye.* Ev hizir, taybetiyên jiyanê bi me dide nasîn û em bi vê kiryarên hizrî, dikarin biryara baş û kiyarên bi feyde werbigrin û bi cîh bînîn. Wekê tê zanîn di wan mijaran de Kant gelek kûr çûye û bandoreke wî ya mezin li ser fêylesofên hemdemî ya cîhanê de heye. Wî hemî biryarên mejiyî, wek bizaveke serbixwe û taybet û bi pîvanî (tercîha sûbjektîf) nirxandiye û ew ji xwe re kiriye wek zagonên mirov yên *di xwe de û ji bo xwe bikar tê*, li ser fêylesofên Îslamî jî ev bandor xwe daye diyarkirin. Bo mînak, Eşarî, El Kîndî û Farabî ji wan fêylesofan in.

Institut kurde de Paris

Li gor vê şîroveya Mazdeîzmê di derbarê mejî yan jî hizra exlaqî de, em dikarin bêjin ku bandoreke giring li ser felsefeya serdemên 17. û 18. ê de jî çêkiriye.

Wekê tê zanîn, li ser *Şoreşa Fransî* ya 1789'de, bandura herî mezin, ji hêla serkeşê felsefeya Ronahiyê ya Fransî, fêylesofê romantîst, Jean Jeaques Rousseau çêbûye. Di di bîrdoza wî de jî, ya herî balkêş û giranbiha, ew ramana wî ye ku bi navê, *"Peymana Civakî"* dihête zanîn. Di derbarê parastina jiyana xwezayî û ahenga di navbera jiyanbijan de, bi tevayî parastina jiyana xwezayî de Rousseau ew qas pêş çûye ku ew jî em dikarin bêjin seranser wek Mazdeîstên berî şoreşa li dij împeratoriya Asûr, di vî warî de felsefeyeke "paşve vegerê" parastiye. Fêylesofê Fransî wisa dibêje;

*"Dewlet û Şaristanî, yanê gav bi gav dûrketina mirov jixwe û ji xwezaya xwe, yanê zulim û zordarî..."*

Jiber ku di vê nihêrîna hanê de, rola "Aqlê Wîcdanî" gelek bi cih e. Li gor ramana Jean Jacques Rousseau, her insanek, ku ji hêla vê mejiyê xwe yê "sade" (safî) de were îdare kirin, bi mirovên din yên ku bi wan re di civakê de dijîn, divê têkeliyeke bi dadwerî û başbûnî çêbike. Jiber ku ev mejî, di pêşveçûna mirovayetiyê de ji bo meşa însan şîreta başî û wekheviyê dide. Em dikarin bêjin ku *hizra wêjdanî* di destpêkê de di giyanê her însan de xwe bi cîh dike û paşê ew yek bi yek di navbera giyanên mirovên din de ew li cîhê xwe digere û di dawiyê de, wekhevî û dadwerî wek prensîbeke bingehîn di navbera wan însana de dibe biryareke giştî; ji bo ku kes bi kesî neheqiyan neke û di têkeliya mirovan de nakokiya serdestî û bindestî ava



Institut kurde de Paris

nebe; yan ji eger avabûye jî, bi vê prensîbê ve ji holê rabe.

Dijberî û şerê navbera serdest û bindestan bi dest-hilatdariya ser xwezayê dest pê kiriye. Jiber ku guherîna xweza bi ked û kiryara mirov, têkeliyên serdestî û bindestî ava kiriye. Di dawiyê de; pêvajoyên bi *mirovkirina* Xweza û *nemirovkirina* mirov ya xwe bi xwe, bi hev re meşiyaye. Sedem ew e, ku mirov dema di rêya *şaristaniyê* de pêş dikeve û hemî derfetên xwezayê ji bo berjewendiya xwe bikar dihîne, bi tenê tiştekî difikire: *Qezençkirina daîm û bikarînana zulma li ser mirovên bindest, ku ev serdestiya xwe berdewam bike.*

Bi vî aweyî jî, mirov her çend, jiyana xwe dixe konaxeke *rihetî û xweşî* jî, di eslê xwe de, ferweriya gerdûnî ya hizra xwe ya ji hêla hizra wêjdanî tê avakirin, xirav dike û ji xweyaza xwe jî bi dûr dikeve. Yanê çî qasî berev *şaristaniyê* ve diçe, ev qasî jî, ji xwe dur dikeve. Ev rewşa trajîk ya ku ji ber newekhevî ya navbera mirovan dihête avzêkirin, ji aliyê Rousseau gelek baş hatiye şîrove kirin(16).

Çawa ku Rousseau bi têgeha *Peymana Civakî* ve dawa damezrandina sistemeke nêzîkî mirov dike û bi vî aweyî jî, dijberiyeke tundî dimeşîne li dij zordariyê, du hezar û pêncsed sal berê jî Zeradeşt bi têgeha *hizra sincî* dest bi mudexelekirina pergala koma mirov dike û di vî warî de em dikarin bêjin, Mazdeîzm *yekemîn felsefe* ye ku di heman demê de mudaxeleyeke tevgera jiyanê û sîstema jiyanê bike û formekê bide wan. Ev têgeh di felsefeya Rousseau de wek *dadyariya xwezayî* (hiqûqa tabiî) dihête binavkirin.



Institut kurde de Paris

Mirov dikare bêje, ev ramana Zeradeşt, ji hêla aborî de dîmeneke komûnizmê ya seretayî ye û ji hêla civakî de jî ceribandineke demokrasî ya ewil e. Jiber ku ew di avzêya mirovayetiyê de "wekheviyekê" pêşniyaz dike û vê jî dixîne konaxa jiyanê. Eger avzê yek bû û hemî hebûna mirovayetî ji hêla *tovekî* mezintirîn yê heyîna gerdûnî ve hatibe holê, ev dem newekheviya aborî, dîktatorî û dagirkerî ya ku mirov li ser mirov bi kar dihîne, êdî tiştekî ne nêzikê xwezaya mirov e û hemin ne meşrû ye jî.

Her wşsa, li gor dîn û baweriya Brahmaniyê, çar qest hebûn û mirov ji van çar beşan ve dihatine dunyayê. Mirov bi hatina xwe ya dunyayê ve, xwedî çîneke mutleq dibû û nedikarî vê çîna xwe biguherîne. Ev hevbeşkirina bi newekhevî û nedadwerî ji aliyê dîn ve dihate fermandin û hêza çi kes têrê nedikir ku vê fermanê red bike.

Ev *qestên çînî* wek *rûhbanî* (serkirdeyên hevdesaziya dînî), *keyserî* (kes, malbat û çîna desthilatdar), *leşkerî* (artêşa van herdu çînan) û *bendegeyî* (çîna kole) hatibûn dabeşkirin. Di navbera van çînan de çûn û hatin, li hev derbasbûn ne bi derfet bû. Bo mînak, serbazek ji çîna leşkerî nikare bikeve nav çîna rûhbanan, ji nav rûhbanan jî kesek nikare derbasî çîna keyserî bibe û her wisa daketina ya ji van çînan berev jêr jî nedihate kirin.

Lê di Mezopotamya jorîn de ku ev di heman demê de welatekî cotkarî û bazirganiya împeratoriya Mediya de ev dabeşkirina qetî û bi tevayî ji hev cûdakirî nahête dîtin. Hevdesaziya qewmê Med gelek ecêb e,



Institut kurde de Paris

ku pir dişive pergala bi prensîbên bingehîn ya *demokratiyê*. Mirov dikare bêje ev pergal "demokratiyeke federal" ya seretayî ye. Jiber ku di Mazdeîzmê de mirov wek di Brahmaniyan de ji çar avzêyên jihev cûda nehatiye dunyayê. Ew ji eynî "cot" û ji eynî "bav" çêbûne û girêdayî heman zagonê ne, jiber vê jî pir jihev cûda nîn in. Nîşaneyeke *"demokratîzma sereta"* xwe dide xuyakirin. Bo mînak, di pêş civakê de *Magbetan* (Mages), yanê *Serokê Civak û Destûrên* wî hene û ev serok ji nav destûran (şûraya bilind) dihêde pesendkirin.

Hemî jî mirşîdên ramana van prensîban in û neşên bê dadî bikin. Jiber ku ev girêdayî wê zagona ku ji bo herkes carî ye, dikarin biryaran bigrin. Zagonên gelemperî jî bingehên xwe ji *hizra wêjdanî* digrin.

Bo mînak wisa dibêje Zeradeşt:

*"Eger Mages (Serokê dînî) û Lijna wî (Desturên wî) te diparêzin û ji bo ku tu li mafê xwe xwedî derkevî, alîkariya te dikin, tu jî êtata wan bike. Lê eger ew zulmê li te bikin, tu jî ferweriya wan nas neke û hilweşîne."*

Ev bingeha hilbijardina demokratiyetê ye ku gel, bi şoreş, yan jî bi hilbijardinê ve dikare desthilatdariyên xwe hilweşîne. Eger Mages li feqîr û belengazan xwedî dernekeve, yanê nebe parêzvanê gel, *Destûrên* wî dikarin wî ji desthilatdariyê bixînin. Ev sistema di dema Berê Zayînê de ji bilî Mazdeîstan, li çanda Latîn Amîrka û Awustralyayê (di jiyana Astekiyan û Aborjînan de ) de hatiye dîtin. Lê mirov dikare bipirse ku ev sîstema wisa baş û nêzîkê mirovayetî, bo çi di

Institut kurde de Paris

wê demê de pêk nehat, yan jî bi ser ne ket? Bersiva vê pirsiyarê girîng e û gelek egerên vê yekê hene.

*Sedema yekem ew e ku, mirovayetî ji bo vê ramanê, hê amade nebû. Mazdeîzm, cûdabûnên di navbeyna mirov û çînan de kêm dikir û dixwest ji holê rabike. Lê ew tişt ji bo mirovayetî ne "baş" bû.*

Jiber ku mirov divê çinayetî avabike û newekheviyên çînan di navbeyna wan de bi kûrtir bike. Her çî qasî ji hêla etîk ve em vê yekê pir "xirav" bibînin jî, ji hêla pêdiviyên pêşveçûna mirovayetiyê de, pêwîstî bi *Sîstema Koledariyê* hebû. Qet ji aliyek ve paşvekişandina dîrokê ne bi derfet e. Mazdeîzm bi prensîbên xwe yên "romantîk" mixabin dibû sedema paşvekişandina dîrokê. Bi gotineke din, mixabin, zagona jiyana mirovayetiya wê demê û prensîbên Zeradeştî li hev nedihatin.

*Ev sedemeke gelek girîng e.*

Ji bo vê nihêrîna xwe em dikarin mînakekê bidin, ku di dîroka felsefe û ramanê de paradoksên wisa paradoksên wisa pir mezin û trajîk qewimîne: Di mijara stêrnasî (astronimî) de ji bo danasîna *Sîstema Roj-navendî* (ew sîstema ku Roj di navenda hemî planetên gerdûna me de dihête qebûl kirin), bûyereke wek ya lênehatina rewşa mirovayetî û ramana Mazdeîzmê rû daye. Dema ku Arîsto *Sîstema Erd-navendî* (ew sîstema ku Dunya wek navenda planetên gerdûnê dihête qebûlkirin) pêşxist, zanist û fêylêsofekî bi navê Arîstarkos ev sîstema Arîstoyî pûç kir. Jiber ku gelek çavdêrî û hesabên bîrkariyê Arîsto xelet derdixist. Bo mînak, dûraniya Mars ya ji dunyayê car carna digu-

herî. Lê li gor vê sîstemê diviyabû ev yek nebûya, jiber ku li gor vê nihêrînê, dunya di navendê de bû û planetên din jî di heman dûranî û bi heman sûretê ve di dewr û berên dunyayê de vedigeriyan. Li gor vê nihêrînê caran dûr û caran jî nêzikbûna Marsê nedihate şêrovekirin. Her wisa gelek aliyan ve jî xeletî û kêmasiyên aşkere yên vê sîstema Erd-navendî hebûn. Arîstarkos ev yek derxist meydanê û sîstemeke nû ya Rojnavendî pêşxist. Lê zanyariya wê demê û bi taybet baweriya şekil û çawatiya gerdûnê ya ji layê "fîzîk" a Arîsto rê nade ku ev sîstema rast bihête pesendkirin. Bo mînak, yek hinceta dijderketina vê sîstema rast ya Arîstarkosê ev bû; "Erd di navenda gerdûne de ye û bêtevger e. Jiber ku eger di dewr û berên rojê de bi tevger bûya, hemî behir dirijiyan, mirov û hemî hebûnên li ser rûyê erdê berev asîmanî ve diketin û diçûn." Bifikirin, ku ev hinceet çi qas bê bîrnasî ye û çi qas ji hemî rastiyên fîzîkê dûr e. Bes jiber hincetên wisa basît û bê bîrnasî ew sîstema hate redkirin û ev yek jî bû sedemeke mezin ya destpêkirina *serdema tarî* ya dûr û dirêj. Piştî du hezar sal, Kopernîkûs derket û dîsa ev nihêrîna Arîstarkosî xiste rojevê û bi gelek zehmetiyan jî bibe, mirovayetiya sedsala 15.-16 ev yek qebûl kir. Pesendnebûna ramana Mazdeîzmê ya wê demê, di serde jî heta bi sedansal hêrişa li dij Mazdeîstan jiber vê egerê bû, mirovayetiya wê demê ev raman û felsefeya Kurd ya mezin û bibingeh û bi hemî rengê xwe ve li gel mirovayetiyê, qebûl nekir. Bes mînakekê jî bi qasî xwe dikare me îqna bike, ku ramana Zeradeşt jî wek ya Arîstarkosî bi neheqî hatiye redkirin:

Institut kurde de Paris

Li gor ramana Zeradeşt zevaca mêrekî bi gelek jinan ne rast dihête dîtin. Berî her tiştî em dikarin bêjin ku ev yek fermana zagona hizra sincî bû û her kes jî diviyabû li gor vê prensîbî jiyaba. Lê piştî bi hatina sîstemên nû yên koledaran û dagirkeran, jinên qewmên binkeftî jî wek xanîmet dihatin bi karanîn, wek jin, wek cariye, wek xulam û kole dihatin xebitandin. Ev kevneşopî di dema îslam de jî berdewam kir û ew bi sedan cariye ji bo musilmanan hate caîzkirin. Di dawiyê de bi hezaran sal zulmeke mezin li ser jinan hate çespandin. Baş e; îro em dinihêrin di welatên pêşkeftî yên azad û demokrat de mafê jinan bi her aweyî dihête parastin û her wisa di wan welatan de zevaca piralî (pirjinî) hatiye qedexekirin. Nexwe ev fermana hizra exlaqî ya Mazdeîzmê, piştî du *hezar û pênc sed* sal ji nûve vegeriyaye berev mirovayetiyê û bûye destûreke bingehîn ya jiyana hemdemî.

Ramana Mazdeîzm ya zevaca *jinek û mêrek* pişt re hate red kirin, bi sed hezaran Mazdeîst hatin kuştin û pergaleke kolekirina karker, jin û zarokan bi hezaran sal berdewam kir. Lê îro ramana Mazdeîzm bi taybet di rejîmên pêşkeftî de wek xalên bingehîn dihêne çespandin; zevaca jin û mêrek piştî hezaran sal ji nûve ket rojeva dunyaya pêşkeftî.

*Giyan (Navîng-Cewer)*

*Di nav xwe de sê şiyaneyên (melekeyên) xwe hene:*

*Boe* - Di zarava Kurmancî de *bûye,* Kirmanckî de *biyo-biya* û di Soranî de *bûwe* ye û wateya *hişê jiyankirinê,* yan jî em dikairn bêjin hizra pêşî ya jiyanê dihemberîne.

Institut kurde de Paris

Em bi vê şiyaneyê ve difikirin û tiştên ji derveyê xwe dikarin binasin. Ev şiyaneyeke seretayî ye ji bo ku mirov bikaribe xwezayê nas bike û desthilatiya xwe li ser wê ava bike. Ev yek hêz û jêhatiyeke taybet ya mirov e ku ew xwe bi xwe dihête afirandin.

Ev şiyane *(boe)* ji bo pêşketina hizrê, rewşeke amedebûnê ye. Ji bo biryardana pêşî derfeteke *ceribandinê* ye. Fêylesofê ezmûnperist (amprîst) yê Îngîlîzî, John Locke ji vê yekê re dibêje, *pêşnasiyên seretayî* yên ku têgehiştina, bîranîn û zanîna hemî tiştan, ji vê şiyanê ve xwe bi bingeh dikin. Fêylesofê *bîrperist* (rasyonalîst) yê Fransî, Descartes ji vê re dibêje (zanînên a posteriori) *û* jiber vê jî, Descartes felsefeya xwe li ser zanînên *pêşezmûnê* (aprorî) ava dike. Jiber ku ew dibêje, *zanînên paşezmûnî* hin car alîkareke ji bo *zanînên rastî* bin jî, esil bi wan re, têgehiştina tiştan me dixe nav xeletiyên mezin. Jiber ku ji alîkariya wan zêdetir ziyanên wan digîhîje mejiyê me. Divê em daîm ji wan bi guman bin. Descartes di vî warî de heman wek Platon difikire û ti caran baweriya xwe bi hest û têgîhîştinên ji dunyaya derve nahîne ku bi piranî ew ji *zanînên paşezmûnên* me dihên avzêkirin. Lê zanînên *pêşezmûnê bêhtir* bi bawerî ne, jiber ku ew ji aliyê giyan ve û bi rêya pêjin dikevin nav bîra mirov.

Platon jî ev zanînên seretayî yên ku ji ezmûnan (ji gerdûna bînewaran-fenomenan) avzê dibin, ji bo zanyariya rastiya esas û bilind pir bi xeter didîtin û wan bi navê *doksa* bi kar dihanîn. Ji bo Platon jî zanyariya rast û bibawer bi tenê ji gerdûna îdeayan avzê dibin û ew jî bi tenê bi rêya aqil û bîrkariyê ve dikare bi derfet be. Jiber vê yekê di rastiya zanînan de



Institut kurde de Paris

jî li gor Platon têgehên cûda bi carî bûn; zanyariyên ji ezmûnan hatî wek *doksa* (yanê zanyariyên xeletî û bê bawer) û zanyariyên rast û dirûst jî têgeha *episteme* (zanî) bikar dihanî.

*Rûan (Derfeta xeyal kirinê û hêza darazdanê ye.)*

Em bi *rûanê* ve fikir û ramanên xwe berfireh dikin û derfetên têgehiştînê zêde dikin. Ev dibe sedema xwedîbûna qudretê. Rûan derfeteke nêziktirîn e ji bo têgehiştina rastiya cewerê. Jiber ku ev ji asta yekem ya nasîna rastiya cewer derbas bûye. Ev konaxa hanê, pireyekê ye ji bo derbasbûna ji *Boe* (nasîna seretayî) bo *Ferûer*(nasîna dawî û ya esil). Bi aweyekî din em dikarin bêjin, ku şiyane, hêza daraz kirina mirov e, dema ku zanîn ji vê konaxê derbas be, yan pûç dibe, yan jî dihête îsbad kirin. Eynî tişt di ramana Descartes de jî heye û pişt re ev yek bi "rêbaza karteziyen" hate binavkirin. Di felsefeya Îslamî de jî dikeve dewsa "mûdrîkeyê". Yanê ew pêşnas yan jî têbîniyên seretayî, di vê konaxê de dihêne "pîvankirin" û encam kirin.

*Ferûer (Cewerê Giyanî):*

Şiyaneya sêyemin, gelek balkêş e. Ev ji hebûna me ya maddî serbixwe ye. Bi gotineke din, her tiştên ku di vê gerdûnê de hene, tekez bi bandora *Ferûerê* xwe hene, berê hebûna xwe ev cewerê giyanê ava bûye û hebûna hemî tişt bi vê şiyaneya herî bilin ya ramanê ve dihête piştrastkirin.

Di Kurdiya îroyîn de *Ferûer*, wek ferwer, ferwerî dihête bikaranîn. Yanê desthilatiya herî li jor. Ev, bi vî

Institut kurde de Paris

rengî, seranser derbasê felsefeya Platon bûye. Bes Platon, ji vê re, yanê *Ferûerê* re navekî din lêkiriye: "*Îdea*" li gor Platon jî, berê afirandina her tiştên ku di gerdûnê de hene, "îdea" yen wan, yanê *ferwerên* wan hebûn. Îdea rastiyê dinûnerînin û eslê her tişt ew in. Fenomenan, (ew tiştên ku em dibînin, dibîhîsin, dihesin) her yek sûretek ji îdeayan werdigrin.

Dema mirov dixweze rastiya hebûnê hînbibe, dive xebateke mejîyî bike û xwe bigîhîne ev rastiya îdeayan. Hegel jî, ji vê re dibêje *Tîn* (Geist). Tîn dibe yekbûneke pîrozî di navbeyna hukmên aqlî yên hemî mirovan de û bi vî aweyeî mirovayetî xwe digîhîne qada jortirîn ya pêvajoya *Dîrokê*. Eger mirov xwe bigîhîne *Tînê*, yanê rastiya hebûna xwe ya herî dawî, êdî hemî pirsgirêkên civakî, aborî, jiyanî, siyasî ûwd, dikare çareser bike. Ji bo Hegel ev yek *rindiya hebûna gerdûnî* ye û bi tenê bi vê astê ve mirov xwe dibe xwedî *dewleta mitleq û ya dawî* (ku ew dewlet ya Keyseriya Prûsya ye). Di vê derê de cûdabûneke gelek mezin û giring dikeve navbeyna felsefeya wî û ramana Zeradeşt.

*Jiber ku "Keyseriyeke yeqîn û bêdawî" di ramana Zeradeşt de çênabe, ev dibe nakokiyek di "zagonên" xwezayê de ku ew her daîm bi guherîn û vegerîna bi ziddê xwe ve dikare berdewam bibe.*

Bo nûmûne, Hegel dibêje, ku êdî dîrok hatiye dawiya *demê* û ji vê zêdetir pêşveçûn çênabe, jiyana herî rind û rast, ev *Tîna Gerdûnî* ya Mitleq e û rewşa wê ya heyînî (mûsbet) jî *Dewleta Gerdûnî ya Mitleq* (Prûsya) e. Lê di ramana Zeradeşt de ev cûda ye, wek

Institut kurde de Paris

dewr û dor, rindî û xirabî, her yek demekê ferwerî dikin.

Li gor Zeradeşt, Aferînêrê Rindî, (Ahûra Mazda) di dawî de li ser gerdûnê hukim bike û di wê demê ti kesek li ser kesek din "ferwer" nebe. Em ji vê re, di zimanê felsefeya nûdem de dikarin bêjin *determînzma rindiyê* ku di vê mijarê de Marks gelek nêzikî Mazdeîzmê ye. Çawa ku ew dibêje dawiya mirovayetî, ji hêla aborî, siyasî û civakî de, wekheviya mirovan e. Konaxa dawî, *komûnîzm* e. Lê em dê paşê li ser vê mijarê rawestin, ku ji bo dawîanîna biyanîbûna mirov ya xwe bi xwe, divê ferweriya nemafdar, ya ku mirov li ser mirov diçespîne, ji holê rabe û *wêjdana gerdûnî* bibe zagona hemî mirovayetiyê.

Di vê babetê de Marksîzm gelek nêzikî felsefeya Mazdeîzmê ye. Bo nûmûne, rabûna milkiyeta taybet ya li ser ax, serwet û jinan de, demên gelek ji hev cuda de Zeradeşt û Marks eynî encamê pêş dibînin û vê yekê red dikin. Jiber vê hizra wekhevî, bêçînayetî û jiyana dadweriyê pir caran hêz û împeratoriyên dagirkeran li dij Mazdeîstan û her wisa wek nûneriyeta vê ramana bi "xeter" li dij miletê Kurd hêz hêriş û komkûjiyên mezin pêk anîn. Eynî tişt pir caran li dij Marksîstan jî hatiye kirin.

Institut kurde de Paris

# Felsefeya Çîn

## *Konfûçyûs (B.Z. 551-479)*



***Lû, begê warê Hostayî jê pirsiyar kir:***
***"Ez çawa dikarim, pesend û dilsoziya gelê xwe bi dest bixînim?"***
***Hostayî bersiv da:***
***"Piştgiriya mirovên rast û dirûst û bidad bike, mirovên xirab û berjêr jî biceza bike. Eger tu piştgirî bidî mirovên xirab û berjêr, rast û dirûstan jî biceza bikî, yeqîn tu dê dilsoziya gelê xwe wenda bikî û wê te rojekê hilweşînin."***

Institut kurde de Paris

Navê vî fêylesofî dîrokî yê esil Kung-fu-dse ye û ev jî dihête wateya "Kûngê hosta" û di zimanê Latînî de formeke wek "Confucius" girtiye û di zimanê me de jî wek "Konfûçyûs" hatiye xwendin. Em di derbarê jiyana fêylesof û mamosteyê mezin yê zanatî û exlaqî yê Çînî Konfûçyûs kêm tişt dizanin. Jiber vê jî gava mirovek hewil bide ku wek kesayetiyeke dîrokî wî bide danasîn, gelek zehmetiyan dikişîne. Balkêş e, ku wî di hemî jiyana xwe de bajar bajar, dever dever ji miorvan re behsa jiyaneke bi xwerindî û dirûstî kiribû û ji wan re şîret dabû ku divê ew çawa bijîn, çawa tevbigerin, helwesta wan ya li gel bûyer û kesan çawa be, lê em nikarin bêjin ku ew jiyaneke wisa jiyaye û weha tevgeriyaye. Hemin hin tişt em dikarin bêjin, lê

ew ji bo teswîrkirina fêylesofekî wisa mezin û dîrokî wê yeqîn kêm bimîne.

Berî her tiştî em dîsa jî xwe ji hin aliyan ve bi şans dihesibînin ku hem gelek gotin û beytên wî yên giran biha, hin berhemên wî yên li ser felsefe û helwesta çêyîtî heta me hatine. Em ji wan dest pê dikin ku vî hostayê mezin yê jiyanê, gelek şagirt perwerde kirine û şagirtên wî jî ne wek hin dibistanên felsefî, wisa beredayî û bohem, berevajî, bi perwerdeyeke bi dîsîplîn û xwendineke rêkûpêkî bûne xwedî zanyariyeke mezin û di rêvebirina dewletê de cîh girtine û kar û xebatên dîrokî pêk anîne. Jixwe vecîz û peyvên wî yên herî girîng li ser rêvebirina dewletê, kesayet û exlaqa rêvebiran û karmendên dewletê, helwesta wan ya li hember gelê xwe û dewra wan ya di sazkirina "civakê" de ye.

Bi mînak wisa dibêje hosta Konfûçyûs:

*Eger di welatekî de dadwerî û jiyaneke rêkûpêk serwerî bike, di wî welatî de ji bo karmendên dewletê qisawetkirina meaşê, tiştekî şermezariyê ye. Eger di welatekî de bêdadwerî û jiyaneke nerêkûpêk serwerî bike, di wî welatî de ji bo karmendên dewletê wergirtina meaşê jî tiştekî şermezariyê ye.*

Gava em bala xwe bidin ser Felsefeya Serdema Seretayî, wek destpêkirin, cûdahiyeke mezin di navbera felsefeya Yewnan û Çînî de heye. Felsefeya Yewnanî, wekî ku me berî niha behis kiribû, ziyatir ser hebûna gerdûnê bi *gengeşiyeke sirûştî* dest pê kir, yanê bingeha gengeşiya felsefeya Yewnanî bi çavdêriyan û nihêrînên wek encamên wan çavdêriyan û her wisa bi

pakijkirina bandorên ji ol û mîtosan hatî dest pê kiribû. Thales (ew nîv sedsal berî Konfûçyûs hatiye dunyayê lê di heman sedsalê jî jiyan e) û şagirtên wî Anaxîmandros û Anexîmenes bêhtir li ser gerdûn û hebûna wê felsefe dikirin û li dû madeya yekem diketin ku bi vî aweyî bikaribin bûyerên li ser gerdûnê fêm bikin. Jiber vê yekê jî zimanê felsefî yê fêylesofên Yewanî zelal û asan bû; wan dixwest jiyanê û gerdûnê fêm bikin. Lê Konfûçyûs û fêylesofên din yên Çînî (bo mînak, Lao tse û Taoîstên din, ku serkêşê vê ramanê Lao tse ye) nihêrînên xwe bêhtir li ser însan, dewlet, exlaq û siyaset ava dikirin û ev peyvên xwe jî wek bi zimanekî helbestî, xweşik û hinekî jî bi dijwarî dihanîn ser ziman. Jixwe ev em bandorên felsefeyên Çîn, Hînd, Yewnan û Kurd di warî de dikarin çavdêrî bikin ku ji layê ziman de jî ev yek xwe diyar kiriye. Bo mînak piştî fêylesofên Mîledî, fêylesofên din yên Yewnanî (ku piranî hemdemên Konfûçyûsî ne) ji layê zimanî de gihîştine hev, zimanekî hûnerî û dramatîk bikar anîn e. Lê dîsa divê em jibîr nekin ku bingeha vî zimanî jî, bêhtir di Rind Veda yên Bûda û Zenda Vesta ya Zeradeştî de hatibû avêtin. Belkî jî di ramanên van herdu pêyamber û fêylesofan de beşeke mezin ya dîndariyê jî hebû û ev zimanê helbestane ji wir dihat. Lê dîsa jî divê em bidin destnîşan kirin ku hem ji layê zimanê helbestane û hem jî di mijarên nirxdarî û *têgehên mafnasî* de (etîk û hiqûq) di navbera felsefeya van her çar deveran jî hevûdu bi bandor kirin.

Em dîsa vegerin ser peyvên Konfûçyûsî. Hostayê felsefeya sinc û nirxên mirovayetiyê di yelpazeyeke pir firevan de nihêrînên xwe diyar kirine. Bo mînak ji

bo hewildanên mirovan ya di derbarê xwe navdarkirinê de jî peyvên balkêş û bi nirx gotine:

Weha dibêje hosta:

*"Heta tu ji xwe re derd bikî, ku çima ji aliyê mirovan bi têra xwe nahêtî naskirin, ji xwe re de derd bike ku çima tu wek mirov nikarî hêz û jêhatiyên xwe xwedî derkevî û wan pêş bixînî."*

Di derbarê jiyana aborî û prensîbên tîcaretê, mafnasiya bazarê û her wisa jiyana gel ya rojane û borandinê de jî axiftinên girîng yên Hostayî heye. Bi taybet dewlemendî û feqîrî, kiryar û helwestên li gel van herdu rewşên ji hevdû gelek cûda jî em guh didine Hostayî, ku gelek tesbîtên wî pir nêzikî vê roja me ye; mirov xwe bi xwe dikeve şikê, ku gelo Konfûçyûs berî du hezar û pêncsed sal bingeha sîstema kapîtaîzmê dizanîbû, yan hîs kiribû: Weha dibêje hosta:

*"Eger bi rêyeke bi namûs dewlemendî bi derfet bibûya, min dê hewil bidaya û di vê rêyê de karê herî asan û herî dijwar jî bikira. Lê mixabin ji bo vê yekê min rêyeke saxlem û bi bawerî nedît. Jiber vê jî ez bes bi ya dilê xwe dikim û bes bi ya dilê xwe dijîm. Dewlemend dibim yan nabim, nizanim, lê yeqîn di rêyeke bi namûs de dimînim, vê dizanim."*

Di derbarê têkeliyên mirovan de û danûstanina wan ya di rêgeha jiyanê de jî Konfûçyûs ketiye nav gelek mijarên felsefî yên kûr. Bi taybet di gotineke xwe de mirov dikare bifikire û di wê fikirînê de jî pir mafdar

Institut kurde de Paris

be, ku gelo Konfûçyûs di heman demê de mamosteyekî psîkolojiyê ye?

*"Eger em sê kes bi hev re di rêwîtiyekê de bin, herdu hevalên min yên rêwîtiyê di heman demê de mamosteyên min in. Dikarim aliyên baş yên rêwiyek jixwe re mînak bigrim, aliyên xirab yên rêwiyek jî ji xwe dûr bigrim."*

Di derbarê şîretên rêvebirên dewletê de jî peyvên îbretî yên Hostayî hene û gelek rayedarên keyseriya mezin ya Çînî hatine û ji wî ders wergirtine. Di dîroka dûr û dirêj ya împeratoriya mezin ya Çînî de moreke mezin ya Konfûçyûsî heye (hemin hostayê wî Lao tse jî). Em dikarin texmîn bikin ku keyserên îmtperatoriya Çînê vê gotina wî qet ji bîra xwe nehavêtine:

*Lû, begê warê Hostayî jê pirsiyar kir:*

*"Ez çawa dikarim, pesend û dilsoziya gelê xwe bi dest bixînim?"*

*Hostayî bersiv da:*

*"Piştgiriya mirovên rast û dirûst û bidad bike, mirovên xirab û berjêr jî biceza bike. Eger tu piştgirî bidî mirovên xirab û berjêr, rast û dirûstan jî biceza bikî, yeqîn tu dê dilsoziya gelê xwe wenda bikî û wê te rojekê hilweşînin."*

Konfûçyûs bi gelek aliyan ve divê bihête şopandin, lê em di dawiyê de di derbarê wî de dikarin bêjin ku ew wek fêylesof, hosta, mamoste, siyasetvan, karmend û rayederek girîng yê împertoriya Çîn (bo demekê wezîrtiya dadweriyê jî kiriye) di dîroka dûr û dirêj ya Çîn de (heta îroyîn jî) û her wisa di heman demê de di dîroka felsefê de mora xwe hîştiye; bifikirin ku heta Şoreşa Çîn ya dawî (1945) û destpêka desthilatdariya



Institut kurde de Paris

Partiya Komûnîst ya Çîn, navê Konfûçyûs û Împeratoriya Çîn her dem bi hev re hatiye bikar anîn. Jiber ku, wekî ku me berî niha jî gotibû, Konfûçyûs jiyana xwe dabû wê bizavê ku ew bikaribe dersên felsefe bide, xwendekarên zîrek û xwedî xîret yên Çînî perwerde bike û wan ji bo pêşerojê bike bûrokrat û rêvebirê xwedî disîplîn û prensîb û ew ji bo împeratoriya Çîn xizmetên mezin bikin. Di dunyayê de fêylesofên bi vî rengî piştî çend sedsalan (bo mînak felsefeya Yewanî ji bo vê erkê diviyabû du sedsal borandiba. Bo mînak em vê armancê, yanê felsefe kirina bi armanca perwerdekirina karmend û bûrokratên dewletê, di dema sofîst û Sokratesî de dibînin û esil ev erk jî jixwe ancax di dema Arîstoyî de bi rêk û pêkî dihête pêkanîn. Jiber ku Sokrates hate darizandin û ev derfet bo wî nehate dayîn, her wisa gelek Sofîstan û Platon yê şagirtê Sokrates jî jiber ramanên xwe hatiun asteng kirin û heta Arîsto ev yek bi tevayî pêk nehat. Lê di dema Arîstoyî de û bi taybet dibistana wî ya bi navê "Lîse" de tam jî ji bo dewletê bûrokrat û fermandarên payebilind hatin perwerde kirin.)

Institut kurde de Paris

## Beşa Sêyem

### *Felsefeya Yewnanî ya Kevin*
*(Felsefeya Serdema Seretayî)*

Wekî ku me di destpêkê de jî diyar kiribû felsefeya rêkûpêk û ji zextên naveroka dîn û mîtolojiyan rizgarkirî di serdema Seretayî ya Yewnanî de rû daye. Gerçê di vî warî de gelek dîrokzanên felsefê di nav nakokiyeke mezin de ne. Hin ji wan îdea dikin ku "felsefe berî Yewnanî bi heman rengî dest pê kiribû lê nehatiye zelalkirin ku ev felsefe ji zextên dîn û mîtolojiyan rizgarîkirî ne yan na?"



Hinek ji wan jî vê nihêrînê reş dikin û dibêjin, "Na xêr, hem felsefe û hem jî zanistî berî serdema seretayî ya Yewnanî hemin hebûn; bi taybet li warên herdu çemên Firat û Dicle, Nîl, Misîsîpî, Ganj û Amazon û hin deverên din wek Çîn û Aborjînan felsefe û zanistî dest pê kiribû, lê wek bizaveke întellektûalîzma xwedî pergaleke rast û bi rêbazên bîrnasiyê ve ev bizav bi Thalesê Mîledî, fêylesofê Yewnanî dest pê kiriye." Û

ez bi xwe jî vê nihêrînê rasttir û maqultir dibînim. Lê di vê gengeşiyê de eger encamekê nehête wergirtin jî, cûdahiyeke mezin nahête meydanê; her wisa jixwe em behsa bizavên felsefî û zanistî, yên ku di nav dîn û mîtolojiyê de heliyayî bin jî dikin û hemin felsefeya serdema seretayî ya Yewnanî, yanê felsefeya xwezayî ya ku bi Thales ve dest pê dike, bi her aweyî cûdahiyan wan ji hev zelal dikin, ev yek erkeke girîng e ku her dîroknasek Felsefe divê ev cûdahiyê bi rengekî aşkere destnîşan bike.

Her wisa, ev qebûla me nayê wê wateyê, ku felsefeya Yewnanî safî ye û qet bandorekê ji kulturên li jor navborî wernegirtiye. Bilekîs gelek bandorên mezin û kûr hatine wergirtin: Me berî niha jî behsê kiribû ku bi taybet felsefeya Yewnanî hem di dema Helenî û hem jî di dema Helenîzmê de bandorên kulturên wek Mezopotamiya, Hîndîstan, Çîn û Misrê wergirtiye. Bo mînak; Herakleîtos, fêylesofê mezin yê xwezayî, hem di destnîşankirina guherîn û tevgerê de û hem jî hilbijardina madeye ewil (arke) de seranser ji Zeradeştî fêylesofê Kurd bandoreke mezin digre. Herakleîtos wek Zeradeşt dibêje "Bingeha kanûna gerdûnê dijberî û guherîn e." Her wisa pirsgirêka rind û xirab, xweşik û kirêt û exlaq bi heman rengî ji nav peyvên Zeradeştî derbasî Herakleîtos bûye. Di mijara madeya ewil de jî Herakleîtos Zeradeşt dişopîne û dibêje "agir" bingeha hebûna gerdûnê ye û wî pîroz dike. Jixwe di rûpelên pêş me de, gava ku me behsa sîstema ramanên fêylesofan kir, em dê yek bi yek tesîrên li ser wan destnîşan bikin.

Institut kurde de Paris

Jixwe îdîayeke wisa jî heye ku Zeradeşt li Babîlê mamostetî kiriye û Pîsagor û Herakleîtos şagirtiya wî kirine.

Belê gengeşyieke din jî ev e; dibêjin ji layê raman û felsefê de *Mûcîzeya Yewnanî* heye yan na? Di vî warî de jî gelek gengeşiyên di navbera nihêrînên cûda de xwe diyar dikin û ev gengeşî dîroka felsefê de cîhekî girîng dadigre. Hinekan dibêjin, ev peyîv ji nihêrîneke oryantalîzmê dihê û ronakbîrên rojavayê daîm bi gumaneke mezin li rojhilatê dinihêrin û bi vê peyvê ve dixwezin kultura rojhilatî nizm bikin.

Bi rastî ez ne di wê baweriyê de me ku pîlaneke wisa hebe; hemin tesîra orîyantalîzmê di vê nêzikbûnê de dibe ku hebe û tiştekî pir xelet jî nîn e. Lê rastiyeke din jî heye; tiştekî pir balkêş e ku di navbera salên B.Z. 600-500an de, belê di heman serdemê de li gelek cîhên cûda de ramanêr û fêylesofên mezin derketine û em hîna jî di felsefeya hemdemî de mora wan kesan dibînin û ev du hezar pênsed sal in ku bandora wan di dîroka felsefê de xwe bi me dide hîskirin.

*Li Çînê Konfûçyûs, li Hîndê Bûda, li Kurdistan Zeradeşt û li Mîledê jî Thales...*

Belê, ev zana û fêylesofên hemdemên hevûdu bi balkêşiyeke ecêb, di heman serdemê de zanayên bi tesîr bûne, dewr û berên xwe ronahî kirine û sîlsîliyeke dûr û dirêj fikir û ramanên xwe ava kirine. Bi taybet Zeradeşt di dîroka felfseyê de, ji Thales, Herakleîtos, Pîsagor, Anaxagoras, Demokrîtos, Empedokles heta felsefeya nûdem û fêylesofên wek, Kant, Jean Jacqûes Rousseau, Durkheîm, Saînt Sîmon,

Institut kurde de Paris

Hegel, Marx û Nîetzsche û gelek fêylesofên din yên girîng bi tesîr kirine. Bo mînak, *peymana civakê* ya Jean Jacques Rousseau, berî du hezar û pêncsed sal ji wî, ji aliyê Zeradeşt hatiye destnîşankirin û çareseriya yeqîn ya di têkeliya navbera mirovan de ev peyman hatiye qebûl kirin. Dîsa mijarên dîalektîk bi heman rengî ji aliyê Zeradeşt hatiye şêrovekirin û ji rêya Herakleîtos û Demokrîtos ev tesîr heta Hegel û Marx jî bedewam kiriye.

Jiber vê yekê, jixwe sedsala 6. ya B.Z. di dunyayê de li gelek deveran ev "mûcîze" pêk hatiye û bi rastî eger em bikaribin behsa *Mûcîzeya Yewnanî* bikin, ew mûcîze wek berdewam û encama vê "mûcîzeya" cîhên cûda ye. Hemin em dê vê mijarê bi taybet şêrove bikin, lê vê gavê em dikarin bi destnîşankirina rastiyeke din derbas bibin; jiber ku ev "mûcîzeya" ji Çîn, Hînd, Kurdistan û Mîled avzê bûye, bes li Yewnan bi rengekî rêkûpêk û bi berdewamî rûdaye, ji dû Thales re, bi dehan fêylesofên wek wî û ji wî jî bandortir derketine û di dîroka felsefê de rêçekê ji xwe re çêkirine. Lê ev "mûcîzeya" me li Çîn, Hînd û Kurdistanê wisa nebûye; wek dîn hêz û tarîqateke mezin ava bûye û di avabûna dînên semawî de jî bingehên kûr û berfireh çêkirine lê mecalek ji bo avakirina *dibistanên fêlsefî* de serkeftî nebûne. Cûdahiya felsefeya Yewnanî ya ji dinan ev e, û jixwe jiber vê yekê ye ku em niha di Serdema Sertayî de wek felsefeyeke berdewamî û rêkûpêk felsefeya Yewnanî ji xwe re dikin mijara navendî.



## *Thales*

*Dibistana Miledî*

*(B.Z. 640-550)*

Fêylesofê yekem yê Dîroka Felsefê dihête qebûl kirin, ew e. Ji aliyê din, em ji Arîsto hîn dibin ku ew yekemîn şirûştzan e jî. Jiber ku di destpêka felsefeya *Serdema Seretayî* de mijara bingehîn ya felsefe bi giştî *heyî* bixwe ye. Thales jî bi pirsiyarên "Gerdûn çi ye? Yekemîn heyî çi ye ku hebûnên gerdûnê jê peyda bûne?" dest pê dike. Wekî ku me berî niha jî behis kiribû, di felsefeyên Çîn, Hînd, Kurdistan-Mezopotamya û Misrê de hem mijarên mîtolojî û hem jî baweriyên dînî di nav mijarên felsefê de cîhekî girîng digirt. Ev yek jî, ji bilî pirsiyarên li ser hebûna şirûştê, pirsiyarên din yên mîtolojîk û dînî dixistin nav mijarê. Bi taybet di mîtolojiyan de rûdanên fantazî yên lehengan di mejiyê mirov de pirsiyarên cûrbecûr dibersivandin, ku ew divê ji bo jiyaneke xweştir û dilşadtir rêya başiyê hilbijêrînin. Ev şîreta evrayî jî pirsgirêkên "exlaqî" dixistin pêşberî însan. Jiber vê jî pirsiyar ne li ser "çi", berevajî li ser "çawa" û "divê çawa be" zêde dibûn.

Ev rewş û nihêrîna han jî mereq û qisawetên ramaneran vedigerand ser *helwest û kiryaran.* Êdî lêkolînkirin yan jî çavdêriya li ser bûyerên fizikî yên dunyayê paşve diket û ev car ramanêr bi hemî hêza xwe ve erka çîna oldaran (rûhban) digirt ser xwe. Jixwe jiber

Institut kurde de Paris

vê ye, ku di felsefeyên berî Yewnanî de derfet çênebûbû ku felsefeyeke spesîfîk û "dunyayî" xwe bide pêş. Gava mirov berî ku pirsiyar bike, *Gerdûn çi ye? Bingeha xwe ji kîjan heyî wergirtiye?* yekser bikeve nav mijara *Divê mirov çava bijî û bi kîjan erkên dînî û exlaqî bijî.* Wê çaxê jî meyla ramana fêylesofan pirtir vedigeriya ser erk û mîsyona oldariyê. Eve, yekem şoreş ya di dîroka felsefê de wisa dihête pejirandin, ku bi tevî Thalesê Miledî, pirsiyarên fêylesofan bi vekirî û zelalî li ser mijara şirûştê kom bûne. *Gerdûn çi ye? Madeya yekem (bi Yewnanî arke çi ye?*

Thales bersiva van pirsiyaran bi rengekî zelalî wisa dide: Ew dibêje yekemîn madeya ku gerdûn pê hatiye afirandin *av* e.

*Avzêya her tiştî av e.* Thales çawa û çima gihîştiye wê qenaatê, ku "av" bikare bibe bingeha hemî hebûnên Gerdûnê? Wekî ku Arîsto dibêje, ew qasî fêylesofbûna xwe, di heman demê de şirûştzanekî navdar bûye. Bi hêzî dihête texmîn kirin ku ew berî ku bersiva pirsiyarên li ser heyînê bide, çavdêriyên dûr û dirêj pêkanîne. Jixwe dîsa dihêta zanîn ku Thales geriyanên mezin pêkanîne. Gerçê di vê derbarê de agehiyên me ne îsbadkirî bin jî, îhtîmaleke mezin e ku ew seredaneke dirêj bo herdu malbendên mezin yên çandî yên wê serdemê kiriye: Misir û Babîl. Gava fêylesofekî wê demê seredana van herdu cîhên girîng yên warên şaristaniyê bike, bivê nevê hin çavdêriyên girîng divê pêk anîbin. Bo mînak, hem çemê Nîl û hem jî Firat û Dijle ji bo şaristaniyên wê demê pir girîng bûn. Nîl di biharan de aveke gumrah dihanîn heta navendên Afrîkayê û piştre gava ew av vedikişiya, li



Institut kurde de Paris

dû xwe re erdeke berfireh ya heriyê dihîşt. Misriyan jî bi vedena kenalan ew axa şil û bi adan dihajotin û berhemên pir dewlemend jê werdigiritin. Rêncberên Misrê van kar û xebatên xwe yên ziretê jî bi rêkûpêkî û her wisa bi ahengeke li gor şert û mercên mewsim û teqwîman pêk dihanîn. Wisa diyar e, ku Thales di vê bizava rêncberiyê de hêza avê dîtiye, ku ew çi xwedî qudreteke mezin e, ku erdeke li nav çolistanê gava aveke gumrah dît û pê xwe heta kokên xwe şil kir, çawa dibe xwedî rehm û adaniyeke bêserî û bêdawî. Ev yek dikare hizreke wisa têxe serê Thales ku di vê gerdûnê de her hebûn ji avê peyda dibe û xwe zêde dike. Heman rewş belkî bi hêzeke mezintir û xurttir li axên Mezopotamyayê jî carî bû, ku bi taybet navber û dewr û berên çemên Firat û Dijleyê wisa bi adan û bi berhem bûne, ku gelek seyahên ji wê demê heta vê rojê jî, bi behsa bereket û dewlemendiya Mezopotamyayê kirine. Jiber vê yekê, di bingeha felsefeya Thalesî de, bersiva "çi" ya yekemîn madeyê av e. Ew dibêje, destpêka her tiştî *av* e.

Dîsa Thales wek cîhê jiyana xwe jî di nav behrekê de dijiya. Girava Miledê, giraveke nêzikî Rojavayê Anatoliyayê bû, her wisa ev girav wek kolîniyeke tîcarî jî warekî navdar û dewlemend bû. Hemî hêz û navdariya wê jî, ji ber bereketa wê ya ji nav "avê" de dihat. Jiber vê hindê, Thales bi tenê nabêje her tişt ji avê peyda dibe, yanê ne ku bi tenê av arkeya (yekemîn madeya) gerdûnê ye, lê ew di heman demê de dibe sedem ku her tiştên di nav vê gerdûnê de hene û dijîn, ev hebûn û jiyanê ji avê werdigrin. Yanê ne ku av bi carekê di destpêkê de di hebûna gerdûnê de xwedî



Institut kurde de Paris

hêz bûye, ew di hemî pêvajoya hebûnê de jî, heta îro jî di nav vê pêvajoyê de ye û her hebûn yek bi yek di saya avê de hebûna xwe berdewam dikin.

Li vê derê em dikarin ramana xwe ya li ser aferîneriya avê berdewam bikin. Belê, Thales jî eynî wisa fikiriye, ku niha ji hizra me derbas dibe ew fikir: Eger av hem wek heyî ya ewil e û hem jî di hemî hebûnên di nav vê heyî ya bêdawî de (gerdûn) xwe wek aferîner bibandor dike, yanê her tiştan dihafirîne, wê çaxê divê em bizanin ku şirûşt, yanê heyî ya bêserî û bêdawî di heman demê de tiştekî jiyanbij e. Yanê ew her dem dijî. Bi vê jiyanê ve xwe zêde dike û bingeha vê jiyanê de jî av heye. Hêza avê hem wek xwezayî hêzeke jinyadar e û hem jî wek Xweda di her zerreyên vê gerdûnê de heye... Ev çavdêriya fizikî ya ku li ser mijareke metafîzîk jî xwe serwer dike, piştî sed salan di nav gelek dînan de, bi taybet dînên *Yekxwedayî* de jî bîrnasiya xwe (mantika) berdewam kiriye.

Bo mînak, Xweda di dînên *Yekxwedayî* de zindî ye, ew namre û di çarenûsa hemî heyiyên di gerdûnê de mora wî heye.

*"Xweda di her cîh û mekan de hazir û nazir e!"*

Hemin ev teoremeke dînî û dogmatîk e, lê bîrnasiya xwe û rêbaza vegotina pêşpirdeyên xwe ji prensîbeke zelal ya çavdêriya xwezayê werdigre, yanê ji Thalesê Miledî werdigre. Ji vê aliyê de jî em di felsefeya Thalesî de rengekî girîng yê ontolojîk dibînin: *Hedonîzm*, yanê *jiyanbijîtî*. Arkeya Thalesî (av) madeyeke wisa bihêz e ku ew dikare hemî gerdûn pê xwe bike hebûneke berdewamkirî, lê ji aliyekî ve jî ev arke



Institut kurde de Paris

wisa zînde û jiyande ye, ku her hebûnên berî niha û niha jî, yek bi yek di nav pêvajoya afirîneriya avê de xwe têxin nav pêvajoya hebûnê. Hemin di vê de hêza afirînerî ya avê bi tevayî li ser çavdêriyeke "zanistî" û zelal hatiye bingehkirin û aliyê wê yê mîstîk yan tune ye, yan jî qasî ku divê di ramaneke felsefî de hebe, heye. Lê ev bîrdozî dîsa bi heman halê xwe ve ketiye nav dînên yekxwedayî, ku Xweda, hem di her cîh û demê de ye, hem jî di nav hemî pêvojya hebûnên di gerdûnê de dewra xwe dibîne. Bo mînak, her zayîn û her mirin yek bi yek bi mudaxeleya Xwedayî pêk dihê. Di vê de jî Hedonîzmeke evrayî (pîrozî) xwe diyar dike, ku tesîra Thales yeqîn tê de ye.

Dîsa bi peyva Thales ya "Her tişt bi avê dest pê dike" yan jî "Av destpêka her tiştî ye" me dibe ser mijareke din ya bîrnasiyê jî: Nexwe fêylesofên ewil yên dîrokê, wek pirsgirêk, mijara destpêkê pir girîng dibînin. Yanê madem her tişt bi avê dest pê dike, wê çaxê em bi rihetî dikarin bifikirin ku destpêkeke vê gerdûnê heye. Jiber ku di fêylesofên ewil yên xwezayê de (Thales, Anaxmandros û Herakleitos ji wan in) û bi taybet di rêbaza ramana Thales te ev yek hebû, ku qet tiştekî di vê gerdûnê de ji nebûnê peyda nabe, qet tiştek ji hîçî nayête afirandin. Madem ev pêşpirdeya han dibe bingeha vê ramanê, gelek xwezayî ye ku ew fêylesof ji bo destpêkê "madeyek" hilbijêre û heta erk û fonksiyona hêza Xwedayî bide vê madeyê. Belê ev hêza destpêkî yanê Xwedayî di ramana Thalesî de "av" e.

*Her der bi Xwedayan ve tijî ye.*

Institut kurde de Paris


Bi vê ontolojiya xwe ya şirûştî ve Thales, em pir bi rihetî dikarin bêjin ku di heman demê de materyalîstekî yekem e. Jixwe Arîsto ji bo felsefeya vê serdemê peyva "Felsefeya Ontolojîk" pêkanîye ku ev binavkirin îdîaya me ya li jor ya di derbarê Thalesî de piştrast dike. Jiber ku wî, hêza jiyandariya avê tesbît kiriye, ew dizane ku av wek *tovek bêserî û bêdawî* di nav her hebûnan de bi cîh dibe û wan hem dike tiştekî heyî û hem jî berdewama hebûn û zêdebûna wan diqewimîne, nexwe ew Xwedayek Xwezayî ye. Bi vê aliyê xwe ve jî em dikarin bêjin Thales bingeha bîrsaziya ontolojîk ya îdealîzmê jî ava kiriye. Jiber ku ev pergala felsefeya xwezayê wisa zelal û wisa tevlîhev e, ku gava we wek erka yekem û heyî ya ewil, avê ji navenda gerdûnê derxist û di dêlva wê de hêz û heyiyeke "abstrak" (mûceret-neronî) bi cîh kir (bo mînak Xweda), êdî qet astengiyeke namîne ku hûn felsefeya xwe bi tevayî li ser prensîbên îdealîzmeke hişk ava bikin. Jixwe em dê piştî çend fêylesofên girîng bibînin ku ramanêr û fêylesofên bi rêbaza Thales lê sedan sed li dij wî kesên îdealîst jî di vê felsefeya sereta de xwe bidin baldarkirin (bo mînak Parmenîdes û Pîsagoras). Çend taybetiyên girîng yên Thalesî hene ku divê em bêyî ku behsa wan bikin derbas nebin.

Thales qasî ku di jiyanê de li dewr û berê xwe û her wisa heyiyên li ser rûyê erdê û rûdanên fizîkî çavdêrî kirine, belkî jî ji wan jî zêdetir û bi îhtîmamtir li asîman jî gelek çavdêrî pêk anîne, li ser rewş û cîhên stêran û meteorên hizir kiriye. Jiber ku ew li Misrê û Mezopotamyayê jî gelek fikrên astrolojî bihîstîne û li

Institut kurde de Paris

ser wan dest bi lêkolînan kiriye. Dihête îdîakirin ku ji hin kevirên meteoran yên ku ketine, Thales fikir kiriye ku agir di derveyî vê planeta me de jî heye û bi taybet hin stêr û roj bi tevayî ji agir hatine afirandin, agirekî ku her dem û heta bêdawî xwe bi xwe tevdigere û gur dibe. Wekî tê zanîn, di çavdêriyên asmanî de ew qas serkeftî bûye ku di sala 585 ya Berî Îsayî wî texmîn kiriye ku kîjan rojan dê roj bihête girtin.

Çend teoremên girîng yên Thalesî jî hene ku ev hem di dîroka zanistî û hem jî felsefê de gelek bi bandor in:




*1. Çap çemberê wek du qetên wek hev dabeş dike.*

*2. Vekerên sêbana wekhevdukenar heman qasî hev in.*

*3. Vekerên berevajî yên du xetên ku hevûdu dibirin, qasî hev in.*

*4. Eger taban (kenara bin) û herdu vekirên cînar bihête dayîn, em dikarin wê sêbanê bixet bikin.*

*5. Li gor teoremeke din ya Thalesê Miledî, nokteya E li ser xeta AC de nebe jî, li hundir yan jî li derve bibe jî, ev formûla han rast e CB/BA=(AB^t-BD^t)^(1/t)/ED û (t=1) e.*

*6. Vekira ku koşeya wê li ser çemberê be û çapa çemberê jî bibîne, ew vekira tîk e.*

***Ferhengoka Erdjimêrî***

*sêban: şekla sê kenar*
*sêbana wekhevdukenar: Sê kenara hevkenar*
*sêbana tîk: Sê kenar a ku du kenarên wê li hev tîk çikiyayî ne*
*çarban: şekla bi çar kenar*

Institut kurde de Paris

*çarbana wekhevçarkenar (kare)*

*çarbana parelelkenar: çar kenara ku kenarên wê yên li hember hev parelel in.*

*çarbana tîk: Çar kenara ku kenarên wê yên hemî li hev tîk in.*

*çarbana bêserûber: Çar kenar a ku kenarên wan bi bêserûberî li hev çikiyayî ne û qet vekireke wan û kenarek wan ne wek hev in (yamûk).*

*pêncban(pênc kenar), şeşeban(şeş kenar), heftban(heft kenar), heştban(heşt kenar)*

*gilover: çember*

*giloverqeh: daîre*

*malbend: nokteya navendî ya çemberê*

*nîvdar: xeta ji malbend ta nokteyeke ser çemberê*


*dunîvdar: xeta ku ji malbendê derbas dibe û du nokteyên çemberê digîhîne hev.*

*têkdet: xeta ku bes nokteyeke ser çemberê re derbas dibe*

*kirîş: xeta ku bêyî derbasbûna ji malbendê, du nokteyên çemberê digîhîne hev*

Institut kurde de Paris


Bi vê mabestê diyê em tiştekî girîng bînin ser ziman ku fêylesofên xwezayê yê bi destpêka Thales û her wisa dû wî re jî gelek fêylesofên Yewnanî bi îhtîmameke mezin li ser bîrkarî û erdjimêrî (geometrî) xebat kirine. Hemin ya girîng ne bi tenê serê xwe ev xebat e; jiber ku berî wan jî xebateke dûr û dirêj yên Misrî û mezopotamyiyan (Babîliyan) hebû. Bi taybet Misrîyan li ser erdjimêrî û Babiliyan jî li ser matematîk û hesibandinê de pir zîrek bûn û gelek pirsiyarên girîng yên van zanistiyan çareser dikirin. Lê cûdahiyeke mezin ya Yewnaniyan ji wan herdu malbendên mezin yên çandî hebû: Li Misrê li ser



erdjimêrî, li Mezopotamya jî li ser bîrkarî pêşketineke mezin diqe-wimî, lê di van herdu cîh de jî ev xebat bes ji bo bersivandina pê-diviyên rojane dihate kirin. Em bêjin di çêkirina pîramîdan de û her wisa Babîliyan jî di hesibandina roj û şevan de, di çareser-kirina pirsgirêkên sewiyeya erazî û karê zîreatê de ji zanistiyên bîrkarî û erdjimêrî bi kar dihanîn. Lê Yewnaniyan ji pêdiviya rojene bêhtir wek qisaweteke întellektûelî û mereq nêzikî van zanistiyan bibûn û her wisa yek bi yek çareserkirina pirskirêkên bîrkarî û erdpîvaniyê ji rewşa reqemean derxistibûn û kiribûn fikir û formûlên ramankirinê.

Bo mînak, di hesibandina dûraniya dunya, roj, heyîv û stêran de ev zanistî bi kar anîbûn û bi taybet erdjimêrî wek zanistiyeke sîstematîk di Yewnanîyan de pir pêş ketibû. Ew qas ku hema hema di navbera erdjimêriya Euklîdes yê fêylesofê Yewnanî û erdji-mêra îroyîn de cûdahiyên gelek biçûk hene. Her wisa bîrkarî û erdjimêrî di heman demê de bûbû rêbaz, heta bîrnasiyeke girîng ya mijar û pirsgirêkên felse-feyê. Wekî dihête zanîn û em jî di rûpelên pêş de bi giranî li ser bisekinin ku bi taybet Sokrates û Platon girîngiyeke mezin dan bîrkarî û erdjimêrîyê. Heta Platon piştî salan gava *Akademiya Felsefê* vekiribû, wî dê li ser deriyê wê de wisa binivîsiya:

*"Yên bîrkariyê nizanin nikarin ji vê dergehê bikevin hundir."*



## *Anaxîmandros*

*(B.Z. 610-545)*

Duyemîn ramanêrê serdema felsefeya Yewnanî Anaxîmandros e û ew bi xwe jî şagirtekî Thalesî bû. Di rêbaza fikirkirina ser mijara heyînê de ji gelek aliyan ve mamosteyê xwe şopandî ye. Qe nebe, di pirsgirêka objektîvîzmê û zelalkirina pirsgirêkên xwezayê de ew jî wek mamosteyê xwe rêgeheke zanistî û çavdêriyê pêk aniye û şêroveyên bi xûrafeyên mîtolojîk û olî nexistiye nav vebêjên felsefeya xwe. Heta ew di vî warî de ji mamosteyê xwe bêhtir ronahiyeke mezin afirandiye û gavên pêştir avêtine.

Em di derbarê Anaxîmandrosî de xwedî gelek zanyariyên ronîkirî ne û ev jî dîsa di saya Arîstoyî de bûye. Arîsto behsa berhemeke girîng ya Anaxîmandrosî dike, ku li gor wê berhemê wisa diyar dibe, ku ev ramanêr li ser pirsgirêkên erdnîgarî û astronomiyê gelek rawestiyaye.

Ev ramanêr hewildaye ku nexşeyeke rêkûpêk ya dunyayê çê bike, şikilê asîmanî bixet kiriye, xebatên di derbarê mezinahiya dunya û dûraniya navbera erd û asîman de çavdêrî û lêkolînên kûr pêk anîne. Navê berhêma wî ya ku ev mijar tê de dihêtin gengeşîkirin jixwe xwe dide diyarekirin ku Anaxîmandros taybetiyeke mezin daye bûyer û rûdanên xwezayê: Navê berhema wî "Li ser Xwezayê" ye. Ev ramanêrê Yewnanî jî meyla xwe daye ser pirsgirêka "madeya ewil"

Institut kurde de Paris

ku bikaribe pê biryareke zelakirî bide ku gerdûn ji çi hatiye avakirin yan jî afirandin. Wekî me berî niha jî gotibû, Thalesê mamosteyê wî gotibû ku bingeha hemî hebûnên di gerdûnê de av e û her tişt ji vê arkeyê hatiye afirandin. Lê Anaxîmandros di vî warî de ji mamosteyê xwe cûda bûye, fikir û rêbazeke cûda pêş xistiye.

Anaxîmandros piştî ew qas *çavdêrî* û lêkolînên li ser bûyer û rûdanên xwezayê, dîtiye ku *av* nikare bibe madeya yekem ya gerdûnê. Hemin di ramankirina Thalesî de bîrnasiyeke rêkûpêk hebû, ku wî difikirî, eger beşeke mezin ya vê dunyayê av be, zeryayên (oqyanûsên)mezin ev dunya seranser dorpêç kiribe, nexwe di bingeha heyînê de diviyabû ku madeyeke pir berfireh, bêserî û bêdawî hebe ku reşayiya dunyayê di nav vê bêdawîtiyê de wenda bibe.

Lê Anaxîmandros heta vê konaxê jî tevlî mamosteyê xwe bibe jî, hevoka dawî wî ji mamosteyê xwe vediqetîne. Ew dibêje, av her çi qas hebûneke mezin û gumra bibe jî nikare bibe madeya ewil. Jiber ku madeya ewil divê bêdawî be, yanê qet hebûnekê nekaribe bibe tixûba wê heyîna bingehîn. Lê wekî Thales bi xwe jî îqrar dike ku di nav oqyanûsan de reşayiyên *(contînent)* mezin hene. Nexwe di nav gerdûnê de her heyî bi heyîneke din dihête bisînorkirin. Jixwe gelek normal e ku her heyî, heta her nav û bernav, her têgeh gava bihête behiskirin, ew di heman demê de bi berevajiya xwe jî bi xwe re dike nava ramankirinê.



Institut kurde de Paris

Bo mînak, te gava got *sar*, di sînoreke wê de *germ* heye; te gava got *mezin*, di sînoreke wê de *biçûk* heye, gava te got *av*, di sînoreke wê de *reşayî* (erd) wê dest pê bike. Wê çaxê her heyî (av jî) çi qas mezin û berfireh dibe bila bibe, bi tevî xwe berevajiya xwe jî bi xwe re digerîne. Wê çaxê ew taybetiya ku bibe bingeha hemî heyînên gerdûnê wenda dike. Jiber vê yekê em nikarin yek heyî ji nav gerdûnê bigrin û ewê bikin *madeya yekem*.

Anaxîmandros di zelalkirina vê pirsgirêkê de rêgeheke din dibîne û dibêje, yekemîn heyî ya gerdûnê, yanê ew tiştê ku bikaribe ji bêserîtî heta bêdawîtî bibe destpêka hemî hebûnan, *apeiron* e.

Berî her tiştî, em vê têgehê hinekî vebikin: Bi Yewnanî ji peyva *peras* hatiye afirandin. Peras, yanê tiştê bisînor, bi mehdût. Di Yewnaniyê de a îlaweya negatîvî ye, yanê ne bi sînor, ne bi tixûb. Di zimanê me de tam bersiva vê têgehê *bêdawîtî* ye.

Anaxîmandros, ev têgeh xistiye nav têgehên felsefî û ev yek di dîroka felsefe de şoreşeke mezin dihête qebûl kirin. Wî gotiye, madem madeyeke herî berfireh jî eger di dawiyê de rastê berevajiya xwe tê û êdî derfeta afirandina heyînan jê dihête wergirtin, wê çaxê ew madeya ku dê bibe avzêya hemî hebûnan, divê bêdawî be, yanê *apeîron* e. Jiber ku *bêdawîtî* tevgereke wisa ye ku ew her tiştî bi berevajiya xwe ve digre nav xwe û heta pê re tevdigere û ev tevger hemî heyiyên bihidûtkirî dikare biafirîne. Bêdawîtî, yanê *apeîron* gava her tiştî dihafirîne, di heman demê de dibe aferînerek berevajiya heyiyan jî; wê çaxê êdî ew pirsgirêka

Institut kurde de Paris

mezin ya ku Thales ketibû tê de, ji ortê radibe. Di gerdûnê ji bilî *apeîron* qet tiştekî tune ye ku di vê tevgerê de were pêşberî wê û bibe berevajiya wê û wê tune bike. Bi rastî jî di ramaneke bîrnasiyê de mirov pir bi hêsanî dikare qebûl bike ku eger em avzêyeke bêserî û bêdawî ya heyînên gerdûnê bigerin, divê ew tişt bêdawî be, yanê apeîron be. Gava me ev formûla hanê di pirsiyarên felsefî de bi rengekî bîrnasiyê ve meşand, em dikarin di dawiyê bêjin ku gerdûn bêdawî ye, jiber ku arkeya wê apeîron e, yanê ew arke (madeya yekem) bixwe bêdawî ye.

Her çi qas di vî warî de qisawet û mereqa Thales jî pir girîng be û wî mijarên Xweda û Gerdûn vegerandibe *Arke û Gerdûnê;* wek nav, peyva apeîron jî ewil car ji aliyê Anaxîmandros hatiye bikar anîn.

Anaxîmandros li gor meşandina bîrnasiya felsefeya xwe vê mijara apeîronê, yanê pirsiyara ku apeîron çawa dikare bibe avzêya gerdûnê û afirandina hemî hebûnan, wisa şêrove dike:

Li gor Anaxîmandros, *apeîron* madeya ewil û bingehîn ya gerdûnê ye. Jiber ku ew bêsînor e û di heman demê de nediyar e jî. Ew ji derveyî cîh û mekan e, yanê nikare di mekanê de bicîh be, jiber ku bê sînor e, lê mekan bi sînor e. Baş e, ew bi kîjan aweyî hebûna xwe pêk tîne? Ew di nav her heyî de wek heyiyeke zeliqîye heye û wek avzêyeke ti car xilas nabe xwe berdewam dike.

Jiber ku ew di nav her heyî de xwe di berevajiyên wê de dabeşkiriye; nexwe hem "wek ew bixwe û hem jî dijew bixwe" bi tenî ew dikare xwe bide berdewam



Institut kurde de Paris

kirin. Bo mînak di nav agir de hem wek germ û hem jî berevajiya wê sar pêkve tê de ye û ev hêz û avzê bê sînor e; apeîron xwe di nav her tiştî de dabeşdike û ev dabeşkirin bixwe sedema aferîn û berdewama hebûnê ye. Taybetiyeke din ya apeîronê jî ev e, ku ew nediyar e, yanê em bi sehkirinê ve nikarin wê fêm bikin, jiber ku taybetiyeke wê ya bê dîtin, hîskirin, sehkirin, bihîstin tune ye. Yanê *apeîron* rastiya heyî ya bixwe ye, ne ku şekil û forma wê. Bi vî aweyî Anaxîmandros mijareke din xistiye nav felsefê, ya ku di pêşerojê de Platon wê bigre û pêş bixîne; *gerdûna bînewarî* (gerdûna fenomenal) û *gerdûna heyîna rasteqîn* (gerdûna îdeayan). Ev ji hev cûda nin, em dikarin diyardeya heyînê seh bikin, bi hestên xwe fêm bikin, lê em rastiya wê bi tenê rêya bîrê ve dikarin têbigîhîjin. Jiber ku hin rastiya heyî hene ku em wan bi tenê aqil dikarin têbigîhîjin. Ev fikir dê me bibe heta îdeayên Platon. Platon jî piştî salan vê mijarê vebikole û heyiyan wek fenomen (bînewar) û îdea (hizir) dabeş bike û bêje ku esil rastî îdea ne.

Anaxîmandros dibêje, ji bo ku tek tek heyî yan jî tişt bihêne afirandinê, bêdawîtî, yanê apeîron ew xwe li berevajiyên wan tiştan dabeş dike. Berî ku ev dabeşkirin pêk bihê, tiştên sar û tarî, tiştên germ û ronî ji hev veqetiyane. Ax sar û tarî ye, as (hewa) germ û ronî ye. Li gor wî, dunya di navenda gerdûnê de ye. Erd ne rastber e û ne jî bê tevger e. Di vî warî de jî Anaxîmandros gavek girîng davêje û dunya wek gloweriyeke silîndîrî difikire; berayiya vê silîndîrê ji bejna wê dirêjtir e û ew di valahiyeke bêdawî de bêyî ku xwe bi tiştekî din girê bide, wisa bi serbestî heta

bêdawî tevdigere û vedigere. Jiber ku tiştekî di malbendiyê de divê xwe bi hêzeke din girê nede lê her tişt bi girêdayî wê tev bigere.

Jiber vê şêroveyên vî feylsesofê xwezayî, Arîsto dibêje ku Anaxîmandros eslen *şirûştzan* (xwezazan) e. Bi rastî jî Arîsto di vê biryara xwe de mafdar e, jiber ku Anaxîmandros bêyî ku hêzeke dînî yan jî mîtolojîk tevlî karê xwe bike, dixweze gerdûnê nas bike. Dîsa em pê şareza ne ku ew hewil daye ku tevger û bûyerên xwezayî li gor bîrnasyiyeke rêkûpêk binase û şêrove bike. Lê dîsa jî di şêroveya wî ya di derbarê gerdûnê de du noktayên metafîzîkî (ji derveyî nihêrîna fizîkî) hene û ew jî di dîroka felsefê de wek destpêk dihête destnîşan kirin. Yek ji van ev e; *apeiron*. Berî wî, mamosteyê wî Thales ji bo madeya yekem ya gerdûnê peyva avê bikar anîbû, ku av destpêka hebûna gerdûnê ye. Lê tiştekî destpêk diviyabû bêdawî bûya, lê ne wisa ye. Av madeyek bisînorkirî ye û di ser de jî, cîhê ku av xilas dibe, reşayî yanê ax dest pê dike, yanê av dihête "tune" kirin û ev car madeyek berevajî dest pê dike. Nexwe destpêka made ya gerdûnê divê bêdawî be û bi karekterek ve divê nehête bisînorkirin. Qet taybetiyeke wê tune be, qet formeke wê tune be, jiber ku ter teybetî û karekter di heman demê de zidê xwe jî dihîne meydanê, ew çax jî ew made êdî nikare bibe madeya yekem. Lê *apeîron* ne wisa ye; ew bê şekil e, bê form e, bê taybetî ye; bes heye û her tişt bi hebûna wê peyda dibe. Piştî ku ew hebe, êdî heyînên din xwedî şekil û formê dibin, jiber ku her heyînên berdewama wê bi sînor in, lê apeîron bixwe bê sînor e. Ji layê fîzîkî de ev yek nehête îsbat

Institut kurde de Paris

kirin jî, dikare di derbarê hebûna gerdûnê de bîrnasiyekê bihebîne, bi bingeh bike. Lê ev yek di heman demê de mijara metafîzîk e di felsefê ye. Di vê mijarê de *apeîron* wek tiştekî bêserî û bêdawî xwe dide nasandin, ev yek girîng e ku di dîroka felsefê de mora xwe dide berdewam kirin.

Ya din jî, apeîron ne tiştekî mehdûtkirî, tayînkirî û destnîşankirî ye. Yanê bi tevayî mûceret e; bi vî aweyî em dikevin nav pirsgirêkeke nû, da çawa bi derfet e ku tiştekî bê sînor û bê form û nediyar bikaribe piştî hebûna xwe, xwe têxe nav pêvajoya hebûna gerdûnê û êdî hemî heyînên ji wê peydabûne, berevajî, ku ew bi şekil bin, bi sînorkirî bin û tiştekî diyarkirî bin.

Girîngiya Anaxîmandros ev e, ku di dîroka felsefê de pirsgirêkên fizîk û metafîzîk di nav hev de dide gengeşîkirin. Eslen Anaxîmandros di heman demê de dihête binavkirin ku ew di mijara felsefê de rêbazên xwezayî bikar anîne, çavdêriyeke şirûştî ji xwe re kiriye bingeh û jiber vê jî mijarên felsefê de bandorên mîtolojî û dînan rakiriye. Dîsa jî em dikarin bêjin di warê peyva apeîronê de du cûre rêbazên metafîzîk bi kar anîne; yanê pirsgirêkên felsefî ya metafîzîk di binavkirina têgeha apeîronê de xwe diyar dikin: 1. Apeîron ne karekter e, ne form e û ne jî naverok e, jiber ku gava yek ji wan be, mecbûren ew dê taybetiyeke form yan jî naverokî îhtîva bike, ew çax jî nikare bibe tiştê ewil (arke) jiber ku taybetî yeqîn bi berevajiya xwe ve heye û ev yek jî apeîronê bisînor dike; lê diviyaye ku arke bê sînor be. 2. Apeîron wek tevgereke bê serî û bê dawî di nav her hebûnê de tevdigere.

Institut kurde de Paris

Thales dunya wek formeke *rast û gilower* tehayûl kiribû û ev (kûrs-doterek) di valahiya gerdûnê de heta bêdawî diziviri. Lê Anaxîmandros di vî warî de ji mamosteyê xwe vediqete û dunya wek *sîlîndîreke* taybet, ya ku, ew ji layê berayî ji bilindiya xwe dirêjtir e dibêje û her wisa, dunya ya ku ew tehayûl dike, wek ya mamostê xwe, ew jî di nav valahiyeke mezin de heta bêdawî dizivire. Jiber ku dunya di malbenda gerdûnê de dihête hizirkirin, ew di vê tevgera xwe de bi serê xwe ye û girêdayî çi hêzekê nîn e. Arîsto, Axaîmandrosî wek zanayekî şirûştî qebûl dike û bi rastî di vê nihêrîna xwe de jî gelek mafdar e. Jiber ku heta dema Anaxîmandros gelek bûyerên xwezayî bi hincetên dînî û mîstîzmê dihatin şêrovekirin, lê wî ev yek red dikir, bilekîs, hemî bûyerên xwezayî dixwest bi rêgeha çavdêriyeke mazbûd şêrove bike û dîsa sedemên van bûyeran ji nav yasayên şirûştê derxîne.

Bo mînak heta dema wî bûyera birûskê bi rengekî dînî dihate vegotin. Li gor vê vegotinê, Xweda ji mirovan bi hêrs dibe û birûsk çê dibin. Lê wî, sedemên birûskê, tavên rojê, dengên ewran bi rêbazeke zanistî şêrove kir.

Dibe ku gotinên wî ne rast bin, lê rengê şêrovekirinên wî zanistî bûn.

Institut kurde de Paris



## *Anaxîmenes:*

*B.Z. 550-495*

Anaxîmenes sêyemîn fêylesofê Dibistana Mîledî ye û ew jî şagirtê Anaxîmandros bû. Jiber ku di sala B.Z. 494 de Mîled ji aliyê artêşên Pers hate dagirkirin û li vir kevir li ser kevir nehîştin, ev dibistan jî bi dawî bû. Şagirtên vê dibistanê jî berê xwe dan bajar û warên dîtir da ku bikaribin perwerdeya xwe ya mayî berdewam bikin. Jixwe ev belavbûn jî, em dê di rûpelên pêş me de bibînin ku dibe sedema pêşke-tinên cûda û felsefeya xwezayî ya Dibistana Mîledî bi felsefeyên cûda yên warên din li hev bibandor dibe û fikir û hizrên nû û balkêş di dîroka felsefê de rû dide.

Anaxîmenes jî wek herdû mamosteyên Mîledî Thales û Anaxîmandros kir û çavdêrî û şêroveya xwezayê da berdewam kirin û jiber vê yekê jî, berhema wî ya ku bi rêya Arîsto em nas dikin, wisa bi nav kiribû; *li ser Xwezayê.* Li ser hebûna gerdûnê û şeklê dunyayê wî jî gelek hizrên nû da diyarkirin. Anaxîmenes ji layekî ve nêzikî Thales bû û ji mamostê xwe Anaxîmandros dûr ket. Thales ji bo heyîna sereta *avê* dest nîşan kiribû, yanê di gerdûnê de her tişt li gor rewşa avê dihate guherîn û her tişt li avê vedigeriya. Anaxîmenes gavek din avêt û got, heyîna sereta *as* (hewa) e. Jiber ku as yanê hewa li gor avê, bêhtir pir e û cîhekî mezintir û berfirehtir werdigre.

Institut Kurde de Paris

Hemin li gor xwe Thales jî mafdar bû, jiber ku av jiyanê teze dikir, jiyanê dida berhemandin û bi rastî hebûna avê di xwezayê de dibû sedema bi berfirehî berhemandinê; lê gava Anaxmenes asî bi avê da berhevkirin, as bêhtir kûncal bû ku bibe madeya yekem. Jiber ku av ji bo hemî jiyandeyan girîng bû, lê as hem girîng û hem jî şerta yekem ya jiyanê bû. Yanê bê as jiyandeyan nedikarîn du lez jî bijîn. Yanê di warê girîngiyê de as ji *avê* elzemtir û acîltir bû. Her wisa as di heman demê ew ne bi tenê heyîneke girîng, wek rûh, heyîneke şerta yekem bû, jiber ku bê ruh (bê giyan) jiyan nabe. Mirov gava dimre, jiber ku bê henas e yanê bê giyan e: Gelek balkêş e ku di Kurdî de têkeliyeke bîrnasiyeke ecêb heye di navbera as (hewa) û henas (nefes) de. Yanê ev peyv berdewama hev in. As di derveyî me de heye û em bê wî (di Kurdî de as nêr e, av jî mê ye) nikarin bijîn, jiber ku ew di me de "henas" (nefes) çê dike. Yanê as û em gava dibin yek, henasê ava dikin. Henas jî di me de dewra giyanî dibîne, yanê em bi henas dijîn û dibin xwedî giyanî. Gava as nebe, henas nabe, henas nebe giyan jî nabe, yanê em dimrin û jiyan tune dibe. Anaxîmenes jiber vê yekê as yanê hewayê daniye bingeha gerdûnê.

Her wisa, sedemên din yên Anaxîmenesî hebûn ku ew bi wan ji xwe re hincetên xwezayî çêbike û as bike bingeh. Berî her tiştî as wek avê ne bi sînor e, ew bêsînor û hemî gerdûn di nav asî de bi cîh dibe. Her wisa *bûyerên asî* (asîmanî) ji bûyerên avê erjengtir û bibandortir in. Av dibe derya, di deryayê de pêl radibin, lê sedema yekem ya bipêlbûnê jî tevgera asîman bi xwe ye, yanê ba û bager e. Her wisa ba û

Institut kurde de Paris

bager ji hemî bûyerên avê zexmtir û mezintir in, ji wê jî wêdetir, bûyerên asîmanî di heman demê de sedemên bûyerên avê ne. Jiber ku madeya yekem bê bingeh be, yanê qet tiştekî nebe ku arke xwe bi wê bide girtin, bilekîs her tiştên di gerdûnê de ji bo hebûna xwe pêdivî bi arkeyê bin û ji bo vê tarîfê jî herî kûncal as (hewa) ye.

Bi vî aweyî Anaxîmenes gavekî din davêje pêş, mijara wî ne bi tenê bi heyîn ve bisînor e; ew êdî bi têgeha xwe ya nû (henas) mijareke din xist nav felsefê; jîndebûn û jiber vê jî dest bi tasnîfê kir. Ji bo Anaxîmenes hemî heyîn berî her tiştî, wek jiyande û nejiyande dihête tasnîfkirin. Bi vî aweyî rêya heyîna jiyande, yanê biyolojî hatibû vekirin. Jixwe em dê bibînin, ku di pêşerojê de Arîsto behsa fîzîka jiyande bike û ev yek dê bibe bingeheke girîng ya hemî tasnîfên xwezayiyê. Wekî ku dihête zanîn tasnîfa rêkûpêk ya xweza û jiyandeyan bi zanistiya Arîsto de hatibû destnîşan kirin û ev jî yekem bandorê ji vî fêylesofî digre.

Wekî me diyar kir, Anaxîmenes, jiber ku hemî şêroveyên xwe ji nav bûyerên xwezayê dide destpê kirin, bi rastî ew di heman demê de şirûştzanekî rêkûpêk e jî. *Di pêvajo û sedemên çêbûna gerdûn û hemî madeyên din* jî rêbazeke wî ya dirûst heye. Anaxîmenes dibêje, as tiştî herî berfireh, bêserî û bêdawî ye û jiber vê yekê gava ew rewş û formên xwe diguherîne, made û formên din jê ava dibin. Bo mînak, as heyîneke wisa ye, ku ew hem sihêl (gewşek) e û hem jî şidiyayî ye. Gava pir sihêl dibe, vedigere agir û dûmanê û dibe bûhar. Bûhar jî gava dişide vedigere ewran û ewr jî gava di nav xwe de dişide vedigere avê û dibe baran.

Institut kurde de Paris

Gava av jî dişide, vedigere heriyê, herî dişide vedigere çiya û zinar û keviran. Bi vî aweyî Anaxîmenes dixweze pêvajoya hebûnê bi destpêka sihêlbûn yan jî şididyayîbûna asî ve tarîf bike. Hemin di vê tarîfê de dikare pirsgirêk hebe, lê ji bo pêvajoya hebûna gerdûnê de bala we jî dikare bikişîne, ku di şêroveyên Anaxîmenesî de qasî misqalek jî şêroveyên mîstîzmê û dînî tune ye, serranser û rasterast xweza dîsa bi bûyerên xwezayî dihête naskirin û ev yek di zayîna zanista mûsbet pir girîng e û jixwe em dê tesîrên vê girîngiyê di dersên me yên pêş de bibînin.

Institut kurde de Paris



## *Pîsagoras*

*(Pyhtagoras - B.Z. 570-496)*
*û layengirên wî Pîsagoriyan*

Wekî me berî niha jî diyar kiribû, Anaxîmenes fêylesofê sêyemîn û di heman demê de dawî yê *Dibistana Mîledê* bû. Jiber ku Îraniyan berî salekê ji mirina wî hatin û ev bajar dagir kirin. Serdema tîraniyê dest pê kir û Dinistana Mîledê jî belav bû. Xwendekarên dibistanê jî berev bajar û welatên din belav bûn. Ev yek ji layê bi dawîbûna dibistaneke girîng ya felsefî de bandoreke xirab çê kir, lê ji layê din ve jî, fêylesof û xwendekarên ku jiber vê hêrişî dagirkeriya Persiyan çûn cîgehên din, bandoreke din ya çêyî pêk hat, bîr û boçûnên vê dibistanê bi vê hincetê ve jî bibe di deverên din de hat naskirin.

Lê di vê serdemê de (sedsala 5.) hizir, bîr û baweriya Yewnaniyan jî berev guherîneke girîng diçû. Ev guherîn bi çend xalan pêk hat:

1. Piştî belavbûna Dibistana Mîledê, belkî rengekî neyînî be jî, bîrûbaweriyên mîstîk û olî jî ketin nava felsefeyê. Tesîra şerên Yewnan û Persiyan, karesatên mezin û her wisa ji nûve dagirkeriya tîranan di hizra xelkê Helenî de bandoreke neyînî çêkir, ji nûve vegera berev dîn û mîstîsmê pêk hat.

2. Guherîneke din jî li ser zimanê Felsefeya Yewnan de çêbû. Heta niha fêylesofên vê dibistanê bi zimanekî

sade û nivîsîna bererast (nazim) şêroveyên di derbarê hebûn, çêbûn yan jî naveroka made û gerdûnê de dinivîsin, lê êdî ziman û naverokeke nû dest pê kiribû. Bandora wêje û dramaya nû ya Yewnanî li ser fêylesofan jî xwe dida diyarkirin û êdî wan ne bi zimanekî sade û sererast, berevajî bi zimanekî giran û helbestî berhemên xwe dihafirandin. Peyvên helbestî, aforîzmayên kûr û tevîneke zimanekî giran rêbaza nivîsînê dadigirt.

3. Ji aliyekî jî drama, hûner, mîtolojî, wêje û felsefe di nav hev de diket, lê dîsa jî bingeha van hemiyan rengê xwe bi felsefeyeke kûr dida diyarkirin.

4. Di vê serdemê de tiştekî din xwe da xûyakirin: Mijara giyan û derbasbûna di navbera mirov û ajalan de. Bi rengekî din em dikarin bêjin ku êdî hem exlaq û aforîzmayên dînî û hem jî beytên mîstîk yên olî xwe di nav ramanên fêylesofan de dida serwerkirin. Berî niha di Dibistana Mîledê de bingeha ramanên felsefî bi rengekî madeperistî dihate destnîşankirin. Her wisa hebûna bingehîn ya gerdûnê dihate gengeşîkirin, lê êdî di vê serdemê de pirsiyarên wisa xwe danbûn pêş: "Mirov çima heye?" "Gerdûn çima hatiye afirandin?" "Ji bo jiyaneke dilşad mirov divê çawa bijî?" "Giyan û laş çi ne? Kîjan hebûneke bungeh e. Kîjan ji wan hebe jiyan, tunebe mirin dest pê dike?" Yanê fêylesofên vê serdemê ya bi piranî vegeriyan hizreke bîrewariyê (îdealîzmê, yanê ew bawer dikin ku bîr ji tişt girîngtir e û bingehtir e).

*Di destpêka wan de jî Pîsagoras heye.*

Institut kurde de Paris

Pîsagoras fêylesofekî Îyonyayî ye. Berî Zayînê di sala 570an de li girava Sîsamê hatiye dunyayê û di sala 495an de jî li Metapontûmê çûye ser dilovaniya xwe. Serokê terîqeta xwe, fêylesof û mamosteyê bîrkariyê Pîsagoras ji gelek layen ve di dîroka felsefê de cîhekî taybet û girîng digre. Berî her tiştî, dihête îdîa kirin ku peyva fêylesofî cara yekem ji aliyê wî hatiye bikar anîn. Yanê wî cara yekem gotiye ku "Ez fêylesof im." Jiber ku li gor baweriya wî, mirov çi caran nikare xwe bigîhîne *rastiya ferwerî* (hikmet, yanê ew rastiya xwe hukma xwe di ser gerdûnê de desthilatdar dike, yanê rastiya esil), jiber ku ew rastî jixwe cewerê *aferîner* (Xwedayî) bixwe ye, jiber ku hêz û şiyana mirov ti caran têrê nake ku xwe bigîhîne wê rastiya berz. Jiber vê em mirov, *benî adem* bi tenê xwedî wê şiyanê ne ku bikaribin li dû wê rastiya berz re lêgerînan bikin; belê hêza me mirovan bes ji bo lêgerîna rastiyê têrê dike.

Yanê em ew kes in, ji bo ku lêgerîna rastiyê pêk bînin, dikarin hemî armanca jiyana xwe têxin vê rêgehê. Jiber vê lêgerînê jî evîneke bêdawî divê, bawerî û hesreteke bê dawî divê, ev jî evîna rastiya berz *(evîna Hikmetê)*. Di *bîrnasiya* vê ramanê de ev heye: Mirov nikarin bibin zana, ew zanatiya ku ferweriya rastiya berz dike, Xweda bixwe ye û jiber vê jî em bi tenê dikarin evîndar bin, evîndariya rastiya serberz. Jiber vê jî, di peyva fêylesofiyê de jî ew wate heye: *Evîndariya Zanatiyê*

Felsefeya Pîsagor ji gelek layen ve nûyatiyên girîng û dîrokî di hindurê xwe de dide jiyandin. Her çi qas li gor şêrovekirina gerdûnê ji Mîlediyan paş ketibe jî (yan jî em bêjin gavek paş be jî) ji gelek layan ve jî




Institut kurde de Paris

mijarên felsefê bi wî û layengirên wî zengîntir û berfiretir bûne. Di felsefeya wî de hem baweriyên Yewnanî yên wek ola Orphik (ev nav ji navê dengbêjekî efsanevî yê bi navê Orpheusî dihê) û hem jî ola Hind (Bûdîzm) û hem jî raman û ola Mazdeîzmê heye. Li van hersê baweriyan de jî koça giyanî heye û jiber vê jî kesên di nav van baweriyan de bûn, goşt nedixwerin û xwînê qurban nedikirin. Bo mînak, mirov bi xwerina goşt ve dikaribû bibe kûjer û nêçîrvanê xizmek xwe jî. Jiber ku ew goşt dikaribû di heman demê de bibe goştek ji canê xizmek mirov. Wekî dihête zanîn ev yek di heman demê de bingeha wejeteryanîzmê (gîhaxwîrî) ye. Lê Pîsagor vê ramana xwe bi rêgeheke bîrnasiya felsefeya xwe dida xwendekarên xwe. Her çi qas di dîroka felsefê de navê Pîsagor pir caran wek "oldarek zana, serokê terîqeteke sûfî" were bi navkirin jî, ew fêylesofekî girîng e jî. Jiber ku ji bilî baweriya wî ya rûhanî û gelek fantaziyên wî yên di derbarê koça giyanî de, rêbazên bîrkariyê ve şêroveya gerdûnê pêk dihîne û bingeheke bîrewariya ramanên xwe di nav pergaleke kûr de dide sazkirin, ew di heman demê de fêylesof û zanist e jî. Em dê di rûpelên pêş me de bibin şahid ku Pîsogoras hem bi teoremên xwe yên bîrkarî û erdjimêrî, hem bi bîrnasiya felsefeya xwe bîrperistî (îdealizm) û hem jî bi baweriyên terîqeta ku wî ew afirand û demeke dirêj jî di jiyana Yewaniyan, Îtaliyan û her wisa dema Romayiyan de jî bi bandor bû, di bîr û boçûnên gelek fêylesofên mezin yên nûdem de jî rêç û şûnên xwe hîştine. Heta bo demekê jî terîqeta wî di jiyana siyasî de jî desthilatî kir û gelek deveran de rêvebiriya siya-

Institut kurde de Paris

setê jî meşand. Lê heman siyaset bû belayê serê wî û layengîrên wî.

Jiber ku cîhê jiyana wî ketibû bin ferweriya tîranekî bi navê Polykrates, mecbûr mabû, welatê xwe terikandibû. Li koloniyeke Yewnanî ya nêzikî başûrê Îtalî ya bi navê Kroton bi cîh bû. Li wir terîqeta xwe sazkir û dest bi belavkirina bîr û baweriya xwe kir. Di demeke kin de bi ser ket û gelek layengîrên wî çêbûn. Li Krotonê bo demeke mûayen jî ketin nav jiyana siyasî û terîqeta wî ya olî di rêvebiriya Krotonê de bi bandor bû. Lê piştî demekê gelê wî bajarê serîhilda û hem hember rêvebiriya dewletê û hem jî li hember terîqeta Pîsagorasî serîhildaneke mezin qewimî û terîqeta wî hat hilweşandin û ew jî mecbûr ma û ji wî bajarî çû.




Pîsagor û layengîrên wî bi piranî wek zanayên bi sinc yên endamên terîqeteke bi prensîb dihatin naskirin lê esil navê wan *bîrkarzan* (matematîkzan) bû. Di dîroka felsefê de ji bilî wan çi kesek tune ye ku hem fêylesof bin û hem jî bi wateya fêylesofiyê ve bi navê *bîrkariyan* bihêtin naskirin. Hemin di vê binavkirinê de helwesta wan ya bi prensîb û rêbaza wan ya "hejmarî" ya di şêroveya gerdûnê de, bi bandor bûbû.

*Girêdana Pîsagoras:*

Pîsagoras şêroveya hebûna gerdûnê bi zimanê bîrkariyê ve şêrove dikir, jiber vê yekê jî sîstema hejmaran bi kar dihanî. Teoremeke wî ya pir bi nav û

Institut kurde de Paris

deng heye ku li gor pêşbirdeyan wî ev teorî ji Misriyan wergirtiya. Ya rastî em nikarin seranser bêjin, wergirtin, lê em dikarin texmîn bikin ku di ser vê teoremê de dikare çavdêriyên wî yên li Misrê û her wisa pîramîdên Misrê bibin xwedî îlhameke zanistiyê.

Li gor vê teoremê *di formeke sêkenar de kareyên du kenarên dîk qasî kareya kenara hember kenarê ye* û ji vê yekê re dihête gotin; *Girêdayiya Pisagoras.* Ev zanistiya wî ya xûrt û kûr di heman demê de îlhameke mezin çêkiriye û felsefeya layengîrên wî heta demên dawî xwe berdewam kiriye. Lê kêmasiya me ya herî mezin ew e ku em di derbarê jiyana vî fêylesofê mezin de yan pir tişt nizanin, yan jî eger bizanibin jî bi piranî bi guman in. Jiber ku berhemên wî yên bixwe gelek kêm gihîştîne me, her wisa gelek berhemên bi navê wî hatine danasînkirin, di dawiyê de hatiye fêmkirin ku ev berhem bixwe jî ne yên wî bûne, yên xwendekarên wî bûne.

Pîsagoras berî şagirtê Pherekdeys bûye. Piştî ku mamostê wî çûye ser dilovaniya xwe, ev car perwerdeya xwe ya felsefî li cem Hermodamas wergirtiye. Di berhema fêylesof Antihop ya bi navê *"li ser yên di xwerindiyê (fazîlet) de bilind dibin"* de dihête diyarkirin ku Pîsagor gelek deveran geriyaye û çûye Misrê û zimanê wan fêr bûye. Dîsa dihête îdîakirin ku çûye welatê Babîl û bo demekê xwendkariya Mazdeîstan (Zerdeştiyan) jî kiriye. Jiber ku em di derbarê jiyana wî de ne xwedî belgeyên saxlem in, em nikarin di derbarê wan pêşbirdeyan de biryara rastî yan jî nerastiyê bidin. Lê em tiştekî baş dizanin, ku bandora

Institut kurde de Paris

zanistî, raman û baweriya Misir û Mezopotamya li ser felsefeya Pîsagorî de bi vekirî xwe dide nîşandan.

Nûyatiyeke Pîsagoraas jî ev e; berî wî, fêylesof ji bo şêrovekirina gerdûnê heyîneke berbiçav, binasî wek *av*, hewa yan jî heyîneke mûceret lê dîsa jî heyîn, wek *apeîron* pêk dihaînin, lê Pîsagoras yekser ev hemî red kirin. Li gor Pîsagoras, her madeyek ji vê dunyayê bi serê xwe hebe jî, ew nikare bi gelemperî bibe bingeha gerdûnê. Gerçî wan agir pîroz didît û ev yek jî ji felsefeya Kurd Mazdeîzm (ramana Zeradeştî) derbasî hizra wî bûbû, lê dîsa jî Pîsagor "agir" wek madeya yekem ya gerdûnê (arke) qebûl nedikir, jiber ku qet madeyek bi serê xwe vê erkê nikare bi cîh bîne; jiber ku hebûna gerdûnê xwedî ahengeke *bîrkarî-erdjimêrî* ye (Yewnaniyan bi bîrkarî re mijûl bibin jî, wan erdjimêrî dixist bingeha matematîkê, ji ber ku ji bo hejmar bixwe ne, ew pergala ku bi rêya hejmaran hatiye şêrovekirin û bi vê yekê re jî forma dunyayê hatiye zelalkirin, ew pergal bixwe girîng e û ew jî erdjimêrî (geometrî) bi xwe ye.

Di derbarê asîmannasiyê de jî bi rastî bîr û boçûnên Pîsagoriyan gelek girîng e; heta eger hin fikrên wan di wê demê de hatiba qebûlkirin, belkî *Serdema Tarî* (Serdema Skolastîk) qet nedihatiba jiyandin jî. Jiber ku di wê serdemê de Yewnaniyan gerdûn wek hebûneke wek daîre (glower lê rastber, wek sînî) qebûl dikirin û dunya jî dixsitin navenda gerdûnê. Her wisa mecbûren wan qebûl dikir ku roj di dora dunyayê de dizivire. Ev fikir paşê ji layê Arîsto hate qebûl kirin û heta Ronesansa Awrûpa, yanê nêzikî 2000 sal ev fikra xelet hate qebûl kirin û paşê ji aliyê Kopernîkûs (P.Z.

Institut kurde de Paris

1475-1543) hate redkirin. Lê hizra Kopernîkûs ya ku bû sedema hilweşana bingeha felsefî ya Serdema Tarî (Skolastîk), eslen tâ di dema Pîsagoriyan de ji aliyê layengîrekî wî yê bi navê Archytas hatibû parastin. Ihtîmaleke mezin e ku Kopernîkûs bi xwe jî ji vî zanayî sedema sereta ya Yewnanî hayîdar bûye. Jiber Archytasê Pîsagoriyen îdîa kiriye ku dunya ne navenda gerdûne de ye, lê roj wisa ye. Roj di navendê de ye û dunya jî tê de hemî planet û stêr di dora rojê de vedigerin. Mixabin ev fikir wê çaxê nehatiye qebûlkirin, jiber ku sîstem û bîrnasiya pêşniyaza Archytasî her çi qas rast û dirûst be jî, bi yasayên fîzîka wê demê dihêne zanîn bi hev nedikir û yasayên fîzîkî yên dunyayê pir basît dihêtin qebûl kirin. Ev yasa hizra Archytasî faşil derdixist. Bo mînak; li gor fîzîka wê demê; dunya ax e û giran e û jiber vê jî divê navendê de be û bê tevger be. Lê roj agir e û sivik e, jiber vê li jor û di dora dunyayê de daîm tevdigere. Jiber ku zanista fîzîk wê demê bi vî rengî bû, mekanîk û basît bû, nedikarî bingeha astronomiya Archytas îsbad bike. Jiber vê yekê ev hizra rast hate terikandin û sîstema astronomî ya Batlamyûs (layengîrî Arîsto) hate qebulkirin.

*Pîsagoras nûyatiyeke din jî anî felsefê...*

Heta dema wî, fêylesofên Yewnanî *monoîst* bûn, yanê ew arkeya wan yek bû û ev yekîtî bingeha hebûna hemî gerdûnê bû. Lê Pîsagoras û layengîrên wî di şêrovekirina gerdûnê de pergaleke dûalîst ava kir. Li gor Pîsagoras gerdûn ji dualiyan hatibû avakirin, bo mînak; *yek û pir, tek û cot, rind û xirab, jêhat û nejêhat, rêkûpêk û tevlîhev...* Li gor wî, çawa ku "yek"



Institut kurde de Paris

bingeha hemî hejmaran û rêkûpêk e û hemî hejmaran digre nava xwe, wisa jî di gerdûnê de ahenga hejmarên tek û cot heye, eger 1 nebe 2 jî nedibû, 3 nebe 4 jî nedibû. Bi vî aweyî Pîsagor bingeha sîstema ramana xwe bi hejmaran saz kiriye û di dawiyê de şêroveya gerdûnê ya bi ahenga hejmaran (erdjimêrî) bi rêbazeke hest û sehkirinê ve (sense) pêk aniye. Jixwe di piraniya fêylesofên vê serdemê de (bo mînak Herakleîtos jî) dualîst in di vê naveroka felsefeya wan de bandoreke bi hêz ya Zeradeştî heye...

Pîsagor dibêje *"Gerdûn di sîstema hejmaran de ahenga dijberên hev in..."* (Vegotineke pir nêzik ya Zeradeştî). Em dikarin di dawiyê de di derbarê Pîsagorasî de hin tiştên kin û girîng bêjin, yek ji wan ev e, ku Pîsagoras ji fêylesofekî wek fêylesofên *Dibistana Mîledê* ziyatir alîmekî mîstîk û zanistekî matematîk e. Jixwe piştî mirina wî tîlmîzên wî wek "bîrkariyan" dê bihêtin binavkirin. Girîngiya nihêrîna Pîsagoras ew e ku ew cara ewil ji derveyî madeyeke ji nav gerdûnê, "yasayayek" bîrkariyê xiste bingeha hebûnê û ew wek arke qebûl kir. Li gor wî arke ne av, ax, agir yan jî as e, bingeha gerdûnê ji ahengiya hejmaran ava bûya. Jiber vê yekê jî di warê zanistiyên bîrewariyê de jî Pîsagoras û şopgerên wî gelek kefşên nû pêk anîn, yek ji wan têgehên wek, "kare" karekok, sêkenar, veker (açi), *hîpotenûs* û gelek teoremên bîrkariyê xistin nav dîroka felsefê. Ji aliyê din ve jî, di derbarê sinc û kiryarên mirovan de jî xizmeteke wan ya taybet çêbû. Bo mînak, li gor felsefeya Pîsagoras divê mirov di jiyana xwe de xwedî karektereke mazbûd be û jiber vê jî divê ahenga xwe ya laşî û giyanî biparêze. Wan bawer dikir ku

Institut kurde de Paris

piştî mirinê giyanê mirov ji laşê mirov derdikeve û derbasî jiyanbijek din (ajalek) dibe. Eger mirov di jiyana xwe de xwedî karektereke rast, xwedî sinc û ahengê nebe, û tevger û kiryarên xwe de eger xirabiyê bike serwer, ew dê piştî mirina xwe dê di ajalek herî xirab û ketî de jiyana giyanê xwe bide berdewam kirin. Jiber vê jî Pîsagoras û terîqeta wî goşt nedixwerin û qurbaniya xwînê nedikirin. Her wisa ev yek ji ola Hînd û baweriya Mazdeîzmê derbasî nihêrîna Pîsagoras û şopgerên wî bûbû.

Em dê di rûpelên pêş me de di beşa Dibistana Elea û behsa Parmenîdes û Zenonê Kibrisî de behsa nihêrîn û jiyana Pîsagorî bikin. Lê wek destnîşaniyeke dawî, em dikarin bêjin, taybetmendiyeke din ya herî girîng ya Pîsagoras ev e ku ev gelek bandor li ser fêylesofên girîng yên wek Sokrates û Platon kiriye; ku li gor Pîsagoras fêylesofî ne zanatî bixwe ye, jiber ku çi kes nikare zana be; zanatî karektereke berz ya Ferweriyê (rastiya desthilatdar- Hikmet) bi xwe ye û ev yek jî payebilindiyeke mezin e ji bo mirovan; jiber ku Hikmet karektera herî balkêş ya *aferîner* (Xweda) ye; jiber vê yekê fêylesofî ew tişt e ku ji bo evîna wê desthilatdariyê dikare bide jiyandin (vê Hikmetê, ku divê em bizanin ev peyîv, yanê Hikmet, ji peyvan Erebî ya bi wateya desthilatdarî, yanê hikûm- hikûmdarî tê). Fêylesof ew kes e ku ji bo evîna vê desthilatdariya bêdawî bide jiyandin û bi xwe jî yekem car ji ber vê armancê gotiye ku *"Ez fêylesof im!"*

Em dê bibînin ku hem Sokrates, hem Platon û hem jî di pêşerojê de jî alîmên xiristiyan û îslam ev peyîv wek têgeheke efsûnî xistine nav ramanên xwe û bi

Institut kurde de Paris

sedsalan ev têgeh dane gengeşîkirin ku bihête pejirandin.

Pîsagor û şopgerên wî kesên ansîklopedîk bûn û ew ji bo ku prensîbên bingehîn yên "terîqeta" xwe bi zelalî bidin destnîşankirin felsefe kirine û ji bo vê bizava xwe jî, bîrkarî, exlaq û mûzîk wek rêbazên pîroz pêk anîn e. Wan di navbera ahenga hejmaran, di heman demê de di navbera dengan de jî dîtine û dihête îdîakirin ku wan di dema xwe de bi vê bizavên xwe ve serkeftî bûne ku dengên melodiyan û ahenga di navbera dengan de yek bi yek hesab kirine û gelek aletên mûzîkê jî afirandine. Jiber ku ew her bizavên xwe yên ramanî bi hebûna ahengeke di navbera hejmaran de tesawir dikirin û caran di vî karê xwe de jî pir pêda diçûn. Wekî ku di navbera hejmarên cot û tek de jî têkeliyeke bi vî rengî ava dikirin û ev hesasiyet ew birin heta ahenga di navbera deng û cîhên ser perdeyên hacêtên mûzîkî. Bi vî aweyî wan di çêkirina aletên mûzîk û têgîhîştina di navbera dengên mûzîk û perdeyên ser hacête de serkeftî bûn û ev yek di pêşxistina çêkirina aletên mûzîk de gelek tesîrên erênî kiriye.

Institut kurde de Paris



## *Herakleîtosê Efesî*

*(B.Z. 535 - 475)*

Ji bo lêkolînerek dîroka felsefê Herakleîtos fêylesofekî pir girîng e. Yan jî em wisa formûle bikin wê baştir be; ji bo felsefe du têgeh pir girîng in; ya rastî ji girîngiyê jî wêdetir e; jiyanî ye. Yanê eger ev herdu peyîv nebin, felsefe jî belkî dê nebûya; *hizirperistî* (îdealîzm) û *madeperistî* (materyalîzm). Eger em ev herdu peyvên girîng wek du stûnên jiyanî yên felsefe qebûl bikin, ku dîroka felsefe eslen di navbera van herdu stûnan de derbas bûye, em wê çaxê fêm dikin ku bi rengî dîroka felsefe bi Herakleîtos û dijberê wî Parmenîdesî dest pê dike. Jiber ku dîroka felsefê di heman demê de dîroka nakokiya hizirperistî û madeperistî ye û ev herdu fêylesof nûnerên herî zelal û herî tund yên van herdu cereyanên felsefê ne. Jiber ku ew nakokiya navbera wan dîroka felsefê wisa girtiye bin bandora xwe, em dikarin bêjin ku ew pêşbirdeyên wan yên berî du hezar û pêncsed sal berî, mîna ku ji girîngî û ehemiyeta xwe qet tiştekî wenda nekiriye, heta bi heman têgeh û peyvên xwe yên wê demê, heman hemî di dîroka felsefê de xwe carî kiriye û mirovayetî mîna ku bi gengeşiya van herdu felsefeyan hatiye "perwerde" kirin.

Em dê paşê di mijara Parmenîdesî de berfirehtir li ser hizirperistiya wî rawestin, lê felsefeya Herakleîtos wisa bi zelalî û tundî li ser nihêrîna prensîbên made-

Institut Kurde de Paris

peristiya dûaliktî (materyalîzma diyalektîk) hatiye avakirin ku gava dora Parmenîdesî hat, wî hemî felsefê xwe sedan sed li ser dijayetiya Herakleîtosî damezrandiye û bi vî aweyî jî di dîroka felsefeya hizirperistiyê de bûye destpêkeke qet ti caran nahête îhmalkirin. Hemin berî wî jî û dû wî jî gelek fêylesofên hizirperist hebûne, lê qet yek qasî Parmenîdesî mafê destpêkê heq nakin. Di vî warî de Herakleîtos jî em dikarin bêjin Parmenîdesekî materyalîst e.

Girîngiyeke din ya Herakleîtosî ev e, ku di nav fêylesofên serdema seretayî yên Yewnanî de (heta di hemî dîroka felsefeya wê serdemê de) bandora herî mezin û bi bingeh ya Zeradeştî di felsfê xwe de daye jiyandin ev kes e; Herakleîtos.

Institut kurde de Paris

Berî her tiştî Herakleîtos wek tişteya (madeya) ewil yanê arke, wek Zeradeşt difikire û "agir" dixe bingeha hebûnê û wî pîroz dibîne. Lê dîsa jî ji bo Herakleîtos, "agir" temsîla wê yasayê dike, ku esil bingeha gerdûnê ji yasayeke gerdûnî dihête avakirin; navê wê jî "logos" e. Ev logos wisa difermîne;

*Her tişt diguhere*

Herakleîstos dibêje, bingeha gerdûnê ji yasaya guherînê hatiye avêtin; jiber ku tevger sedema hebûna gerdûnê ye û di vê tevgerê de du layên dijber di nav şerekî bêdawî de ne û di saya vî şerî de hebûn xwe berdewam dike.

Di vî warî de jî bandoreke mezin ji ramana Mazdeîzmê digre û wisa dibêje; tarî û ronî, baş û xirab, rast û çewt... her tişt bi berevajiya xwe ve dikare hebe;

jiber ku hebûn bi vî şerî dijberiyê ve mûmkûn û navê vê yekê jî diyalektîk e (hebûn dualî ye û bi tenê şerê dualîtî dikare hebûnê berdewam bike).

Li gor Herakleîtos di gerdûnê de her tişt di nav tevgerê de ye û her tişt di nav her demê biçûk de jî diguhere û qet tiştekî ji vê guherînê nikare xwe rizgar bike, nexwe qet tiştekî tekez (mutleq) nîn e; lê tiştekî heye ku ew qet naguhere(!) û heta bêdawî wek xwe dimîne; belê ew jî "guherîn" bixwe ye; yanê guherîn ti caran wê neguhere yanê nesekine û tevgera xwe ya guherînê heta bêdawî berdewam bike.

Hemin ev nihêrîn sîstemeke heyînasî(ontolojî) çê dike, lê bi vê yekê re namîne û bi xwe re sîstemeke zanyarnasî(epîstemelojî), bîrnasî(mantik) û nirxdarî (etîk) ava dike. Jiber vê yekê jî di dîrokê de fêylesofekî tune ye ku di van xalên felsefî de yan li cem yan jî li hemberî Herakleîtosî de cihê xwe negre.

Herakleîtos dibêje, her tişt diguhere û ev tevger bêdawî ye. Wisa diguhere ku mirov nikare du caran bike nav çemekî. Jiber ku cara duyem eger tu bikevî çemî, avên çemî yên di leza ku tu ketibûyî herikîn û guherîn û niha avên nû diherikin. Lê bes av neguherî, heta ku tu cara duyem bikevî wî çemî, tu bixwe jî êdî ne ew kesê ku berî lezekê ketibûyî wî çemî. Guherîn wisa, bi lez, bi tevger û bi tekezî xwe diwelîdîne û ditevgerîne.

Herakleîtos ji bajarê Efesê bû, di wan deman de Efes bajarekî Yewnanî yên ji layê tîcaretê ve gelek pêşkeftî bû, ji layê siyasî jî gelek bi pirsgirêk bû. Ji aliyekî ve daîm hêrişên Persiyan diqewimîn û gelek

Institut kurde de Paris

ziyan ji van hêrişan dihate dîtin, ji aliyê din ve jî di nav xwe de daîm dijberiyeke tund ya partiyên demokrat û arîstokrat hebû. Herakleîtos jî bo demekê têkeliya xwe bi rayedarên rêvebiriyê ve çêkirbû û keyserê arîstopkrat gava ji aliyê hêzên demokrat bi darê zorê ji serweriyê hate daxistin û bicezakirin, ev bûyer li ser kesayetiya Heraklêîstosî de bandorên mezin çêkir: Ji aliyekî ve wî felsefeyeke materyalîst û diyalektîk ava kiribû û ev yek di heman demê de şerekî mezin ya li dij mîstîzma keyseran bû, li hember dîn û efsaneyan bû, yanê xizmeta gelê îhtiyadî bû; lê ji aliyekî ve jî Herakleîtos gel biçûk didît û felsefeya xwe mîna ku ji bo arîstokratan dinivîsîne, zimanekî giran ya felsefî û edebî bikar dihanî. Heta demekê, ji layê zimanê felsefî û nivîsandina "aforîzmayên" xwe de ew qas pêda çû ku êdî gel nedikarî wî fêm bike, bi tenê kesên hilbijarde û rewşenbîr dikaribûn wî fêm bikin, jiber vê yekê jî ew forma nivîsandina wek tarîtî dihate nirxandin û her wisa jiber vê jî, di dema xwe de navê wî jî wek "Herakleîtosê Tarî" hatibû guhertin.

Parmenîdes gotibû "Heyî heye, lê hebûn tune ye. Heyî he ye, lê tevger û guherîn tune ye." Herakleîtos jî berevajî wisa digot: "Heyî he-bûn e û hebûn jî tevger û guherîneke bêdawî ye."

Li gor Herakleîtos gerdûn her lez, her lezik diguhere, lê ev tevger û guherîn ne bînewarî (fenomenal), ceweri ye û jiber vê jî têgihiştina tevger û guherîna gerdûnê bi âqil, bi bîr dihête fêmkirin. Bo mînak, di dîtinê de mirov seh nake ku guherîn heye, lêem dikarin bi tenê bi rêya aqlê xwe wê rastiyê bidin destnîşankirin. Jiber vê jî, wî wisa difikirî ku gel bi

Institut kurde de Paris

aqilê xwe tevnagere, ji bo gel ev bizav zehmet e, ew bes bi hest û sehkirinan tev digere û jiber vê yekê jî ew dê daîm xeletiyan bike û rastiyê nas neke; heta pir caran gel xeletiyê wek rastî, rastiyê jî wek xeletî dibîne û her dem bi manîpîlasyonekê ve rû be rû ye. Lê çîna arîstokrat, kesên rewşenbîr ne wisa nin, ew bi hest û sehkirinan ne, ew bi rêya aqilo û bîrnasiyê ve bûyeran dinirxînin û di sedem û encamên bûyeran de pêywendiyan çê dikin û xwe digîhin rastiyê. Jiber vê yekê, wek bînewarî ew çem bi heman reng û formê bihête dîtin jî, yên bi aqil û bîrnasiyê ve nêzik dibin, dikarin tesbît bikin ku her tişt wek wî çemî diherike û diguhere.

Li gel fêylesofên wê demê, gelek ji wan monoteîst (yekayetî) bûn (bo mînak Parmenîdes), Herakleîtos hem pluralîst (piraniyetî) û hem jî dualîst (dualiyetî). Wî digot, belê *tek* heye, jiber ku *pir* jî heye û çawa ku tek û pir di nav heman hebûnê de xwe didin berdewam kirin, wisa jî her tiştên wisa dijber di nav şerekî bê dawî de hene û ev yek wan caran di nav hev de û caran jî jihev dûr de dide berdewam kirin. Bo mînak, pir nebe tek jî nabe; çewt nebe rast jî nabe; tarî nebe ronî jî nabe. Madem wisa ye, em dikarin bêjin ku her tişt yan jî her heyî, di navbera form û ceweren dijber de her dem dihên û diçin. Hebûn mîna agirekî ye û her berdewam e û her tişt dîsa di dawiyê de vedigere xwe; hebûn bê dawî ye û jiber vê yekê jî tunebûn tune ye; jiber vê yekê jî Herakleîtos wisa bawer dikir ku her tişt ji agir peyda bûye û dîsa vedigere cîhê peydabûna xwe, yanê vedigere agirî.

Institut kurde de Paris

Li gor Herakleîtosî, jiber ku gel ji bo keşifkirina vê rastiyê nikare aqilê xwe bikar bîne, ew her dem li gor çavên xwe, hestên xwe tev digere û ti caran wê rastiyê jî fêr nebe; jiber vê yekê jî wî gelî biçûk didît û ji bo wan jî navekî lêdikir; *gel bir e.*

Bi taybet piştî hilweşana serweriya dostê wî yê li Efesê, Herakleîtos wisa bawer dikir ku eger gel bibe desthilatdar, zordariya ku ji aliyê gelê nezan dihête kirin, sed caran ji dîktatoriya arîstokrat û zanayan pir pir xirabtir e. Jiber vê yekê jî ew dij demokrasiyê bû. Di vî warî de em dê di pêşerojê de bibînin ku fêylesofê girîng yê Yewnanî Platon, ku ew jixwe wek feylesofekî hizirperist dij Herakleîtosî bû, lê wî hem girîngiyeke mezin dida Herakleîtosî û ji hin aliyan ve jî diket bin bandora ramanên wî. Bo mînak Platon jî di derbarê rijîma arîstokrasî, dewlet û demokrasiyê de wek Herakleîts fikirye û wisa gotiye; eger gel pir nezan be, di wî welatî de rijîma herî xirab demokrasî ye; jiber ku ew demokrasî di dawiyê de vegere kaos û zordariyeke pir bi xeter. Di welatê ku nezan pir in, divê arîstokrat û zana dewletê bi rêve bibin. Eger gel perwerde bû û nezaniya xwe tunekir, nexwe ew dikare tayîn bike ku bi kîjan rijîmê ve û çawa xwe bide birêve kirin; ji bo wî gelî jî hewce nake ku mirov rijîmekê jê re dîkte bike, jiber ku ew dê rijîma herî baş û rind bo xwe tercîh bike.

Mirov gava rewşa niha ya dunyayê çavdêrî dike, dibîne ku di van ramanên xwe de hem Herakleîtos û hem jî Platon ji gelek layan ve hatine şopandin. Yanê ew pirsgirêka pergalên rêvebirinê hîna jî dihête gengeşîkirin.




Institut kurde de Paris

Bo mînak, hûn vê gavê li Kanada, Brîtanya, Almanya ûwd. kîjan metodê bikar bînin jî gel îhtîmaleke mezin ya bi dilê xwe bike û kîjan partî jî bihên desthilatiyê, ew dê mecbûr bin ku "xizmeta" wî gelî bikin. Jiber ku di desthilatiya wan de dewra nihêrîna gel pir mezin e. Lê di welatên 3. yên Afrîka û bi teybet Rojhilata Navîn de û gelek welatên wisa de çep yan jî rast, bi piranî bi despotîzmê ve (destêzorê) ve dihêtin birêvebirin û jiber vê yekê jî her guhertina desthilatiyên van welatan bi xwîndariyeke trajîk diqewime.

Institut kurde de Paris

## *Parmenides*

*(B.Z. 515 - 460)*



*"Tu bi xêr hatî ey xortê delal, yê ku ajotvanên nemir bi te re bilî dibûn û di rêwîtiya te de, mehînan tu anî li wî cîhê ku em li wir in. Di vê rê de çarenûseke xirab ya ku li benda te be tune ye û ev rê ne ew rê ye ku piraniya mirovan li wê derê ji xeta heq û dadweriyê derdikevin. Tu dê li vê derê her tiştî, wî dilê bê lerzîn, yê ku rastî û nihêrînên mirîndarên ku di nava wan de qet baweriyeke rast tuneye, di dewr û berê wî de digerin, bibînî."*

Ev aforîzmaya neronî û heta bixwezî mîstîk û edebî ya Parmenîdes e û jixwe ji van çend peyvên bingehîn jî mirov bi hesanî dikare fêm bike, ku ji bo Parmenîdes pir tişt bi rastî bê nirx in û her ew li dû rastiyeke ku "her mirîndar li dewr û berê wê de digere" jiyana xwe bihurandiye.

Berî niha jî me hinek îfade kiribû ku Parmenîdes fêylesofekî pir girîng yê dîroka felsefê ye; berî her tiştî em pir bi dilrihetî dikarin bêjin ku ew di dîroka felsefê de destpêka hizirperestiyê (îdealîzm) ye. Bixwe nûnerekî navdar yê Dibistana Eleayê ye ku wek me berê jî behis kiribû, pêşengiya vê dibistanê ji layê bîrkarzan, fêylesof û serokterîqet Pîsagoras û şopgerên wî bûn. Girîngîdayîna ramanê, xwedîderketina "yekanîtî" û dijderketina "tevger", "guherîn" û "piranîtî" bingeha felsefeya vê dibistanê bû, lê dîsa jî hin

Institut kurde de Paris

fêylesofên vê dibsitanê heta astekê ev têgeh jî bi kar dihanîn, hin ji wan tevgerê, hin ji wan jî piranîtî wek "rastiyeke" rêgeha duyem ya bînewariyê (fenomalîzm) qebûl dikirin, Yanê bingeha nirxandinên wan bi rêgeheke *bîrperistî* (rasyonalîzm) be jî, hin encamên ceribandinan jî (*ezmûnperestî:* emprîsizm) di felsefeya xwe de dihanîn qada gengeşiyê.

Yanê heta Parmenîdesî *hizirperistî* (îdealîzm) û *bîrperistî* (rasyonalîzm) bi şêweyeke wisa saf û zelal nehatiye sîstematîze kirin. Parmenîdes di vî warî de seranser dijberiyeke mezin li gel Herakleîtosî dike û heta ji aliyekî ve hem nirxeke mezin dide fêylesofiya wî û hem jî, ji aliyekî ve jî bêyî ku nav bide, hemî sîstema felsefeya wî li gor xwe pûç dike û pirsgirêkên mirovayetiyê davêje ser felsefeya Herakleîtos.

Dîsa jî yek nokteyek heye ku Parmenîdes di nihêrîneke de digîhî vî dijberê xwe yê bêeman û ev yek pir girîng e: Herdu fêylesof jî eslen rasyonalîst in, herdu jî gerdûnê wek dubeş dinirxînin; gerdûna fenamenal û gerdûna cewerî û herdu jî dibêjin fêmkirina bînewariya gerdûnê bi seh kirin diqewime û em bi ceribandinan wê nas dikin û em cewera gerdûnê bes bi rêya aqil û bîrnasiyê ve dikarin fêm bikin û ev fêmkirina me ya duyemîn rast e; ya din yeqîn me dixeletîne.

Baş e, gelek tişt bi hev re parve kirinê, lê gava gerdûna bînewarî û gerdûna cewerî kîjan e? Gava we ev pirsiyar ji van herdu fêylesofan kir, hûn dibînin ku di felsefeyên wan de bes yek nokte jî tune ye ku ew li dij hev nebin, hevûdu red û înkar nekin. Jiber vê ye ku



Institut kurde de Paris

piştî wan gava Platon behsa wan dike, girîngiyeke mezin dide gengeşiya wan û dibêje, di dîroka felsefê de girîngtirîn û cidîtirîn gengeşî û dijberî di navbera Parmedîdes û Herakleîtosê de qewimî ye:

*Ev dijberî di heman demê de bingeha dijberiya ya di navbera Felsefeya Hizirperistî (Felsefeya Îdealîzmê) û Felsefeya Madeperistî (Felsefeya Materyalîzmê) ye.*

Li gor Herakleîtosî gerdûn ji aliyê yasayeke bi navê *Logos* dihête bi rêvebirin û ev yasa bi xwe jî guherîn e. Her tişt diguhere lê em vê yekê bi tenê bi rêya aqil dikarin fêm bikin. Jiber ku ji aliyê bînewariyê em nikarin fêm bikin ku guherîn heye yan tune ye. Parmenîdes jî bileksî wî dibêje: Ne tevger, ne guherîn û ne jî dijberî rast e; ew hemî bi tenê îllîzyon in û bes xeletîneke me ya hestî ne. Jiber ku bes em bi rêya aqil dikarin fêm bikin ku bingeha gerdûnê nagûhere, rastî daîm, yek e, bê tevger e û nayê guhertin. Lê piranî, tevger û guherîn bi tenê xeletî ye, xeletiyeke me ye ku em wisa fêm dikin.

Di felsefeya Parmenîdesî de bi rastî îdîayên pir ecêb û caran jî "tewşo-mehwşo" hene; yanê gava mirov cara ewil dibihîse, wisa dihête mirov lê di heman demê de bingeheke saxlem û xurt ya bîrnasî û rêbaza felsefeya wî ya îdealîzmê jî heye.

Parmenîdes bi tundî dij derdikeve û dibêje, ku dîroka felsefê bi xeletiyan ve tijî ye. Ji *Dibistana Mîledê* bigre heta dema wî kîjan fêylesof behsa hebûn û pêvajoya hebûnê kiribe, ew sedansed dikeve nav dijberiyeke mezin ya bi xwe re. Jiber ku di gerdûnê de hebûyîn ne mûmkûn e; hebûyîn pêvajoyek e ji hîçî

Institut kurde de Paris

berev heyî; lê ev yek berî her tiştî ji prensîbên aqilê re ne rast e; *jiber ku heyî he ye, tuneyî jî tune ye;* ew qas. Heyî bi heyîna xwe tekez e û nayê guhertin, tuneyî jî jixwe ne tişt e. Jiber vê yekê tevger jî tune ye; eger em behsa tevgerê bikin, em dikarin bikevin nav xeletiyeke mezin; tevger ew e ku tiştek di mekanê de û demê de ji cîhekî berev cîhekî din, ji demekê berev demeke din cîh û dema xwe biguherîne; wê çaxê ev cîh û dem guhertin prensîba heyî ya gerdûnê re dij e; heyî nikare hem he be û hem jî ne be. Gava tişt cîh biguherîne, dihête wê wateyê; ew tişt li cîhekî he ye û gava çû cîhekî din, ew dem û ew cîhê xwe yê berî de tune ye êdî; lê li cîh û dema nû de he ye; yanê hem he ye û hem jî tune ye; ev yek nabe û eger em bi vê rêbazê ve çi zanyarî bi dest bixînin, ji serî de em dê bikevin nav dijberî û bêmantiqiyeke mezin. Jiber vê yekê tevger û guherîn berî her tiştî li dij rêbaza aqilî ye û di gerdûnê de jî qet heyînekê nikare dij bîrê be. Jiber ku naskirina rastiya heyînê bi tenê bi rêbaza bîrê ve bi derfet e. Madem wsia ye, em dikarin bêjin ku guherîn û tevger bes îllûzyon e, xwexapandina hestên me ne. Ji bo yekanî û piranî jî hem tişt carî ye: bingeha heyîna gerdûnê yek e; jiber ku yê gerdûn afirand jî yek e, nayê guhertin û bê tevger e. Jixwe piranî bi xwe têgehek e bê mantiq e û dij aqil e. Bo mînak, eger em heyînê hem bi yekanî, hem jî bi piranî dabeş bikin, belê wek zahirî du tiştên wisa bo me xûya dibe, lê yek ji wan xwexapandin e; jiber ku piranî dij bîra me ye, ew çax ya rast yek e; piranî jî bes em dikarin bêjin ku "fenomeneke yekî ye, yanê piranî bînewariya yek e. Felsefeya xwe bi baweriyeke olî bibingeh dike û wisa

Institut kurde de Paris

dibêje Parmenîdes; Xweda yek e, gerdûn yek e û nayê guherîn û bêtevger e; lê piraniyên li gerdûnê, yên ku bi me zahir dibin û tevger û guherîna ku bi me xwe dihêt seh kirin; seranser bi xeletî sehkirineke hacim û cewerê Yek û Bêtevgerê ye: Em ji van sehkirinên xeletiyan (pir û guherîn) dikarin bikevin nav hewildaneke aqlî û mantiqî, gav bi gav, ast bi ast ji xeletiyan xwe azad bikin, ku ev yek jî bi tenê xebateke hizrî û îdeal mûmkûn e û di dawiyê de em dê xwe bigihînin ew hêza yek, tek, bêtevger û bêguher, ku ew jî Aferînerê gerdûnê ye (Xweda). Herwisa Parmenîdes ji vê hewildanê jî bizava felsefe qebûl dike. Jixwe em dê dû re bibînin ku xwendkarê wî yê bi navê Zenonê Kibrisî di vê bîrnasî û bingeha felsefeya bîrperestiya Parmenîdesî pêdaçûneke mezin dike û hemî jiyana xwe dide wê hewildanê ku tevger seranser qet nîn e; ji bo vê jî ceribandinan (balkêş e, bi rêya ceribandinan pirsgi-rêkeke hizrî çareser dike) diyar dike ku çi caran kêwrûşk di pêşbirkê de dê nekaribe ji kûsiyekê derbas bibe. Jiber ku gava kûsî û kêwrûşk bikevin pêşbirkê û kêwrûşk hinekî awans bide wê; kêwrûşk ji bo ku xwe bigîhîne kûsiyê, divê bi lez bireve; lê ew çi qas bi lez direve bila bireve, heta ku ew xwe bigîhîne kûsiyê, di wê demê de yeqîn kûsî jî (kêm jî bibe) rêyekê meşiyabe. Divê kêwrûşk ewê rêyê jî biçe; lê kêwrûşk heta wê rêyê biçe, dîsa kûsî hinekî din rê meşiyabe; ev car kêwrûşk ji bo ku xwe bigîhîne kûsiyê, ewê rêyê jî bimeşe divê. Welhasilî em vê çûyînê heta bê dawî dikarin bidin berdewam kirin. Li gor vê mantiqe kêwrûşk ti caran wê xwe negîhîne kûsiyê.

Institut kurde de Paris



## *Empedokles*

*(B.Z. 490-430)*

Bi gelek aliyan ve di dîroka felsefê de cîh û nirxa Empedoklesî pir mezin e. Berî her tiştî ew fêylesofekî ansîkopedîst e. Yelpazeya zanyariya wî gelek fireh e; ji ol û baweriyên mîstîk heta sedemên tevgerên madeyan, ji arkeyên gerdûnê heta hizra siyaset û exlaq, ji çêbûna gerdûnê heta astronomî sînoreke pir fireh ya zanyariya wî heye. Gelek dîroknasan ewî kesek oldar û pêyamber jî dihesibînin. Her wisa, jiber gelek navdarbûna xwe jî di derbarê mirina wî de gelek gûftûguh hatine kirin, gelek çîrokên fantazî hatine çêkirin û ev yek jî bûye sedema ku gelek agehî di nav hev de bikevin û ew jî ne zelal bin. Hinekan dibêjin ew jiber zanatî û pîroziya xwe çû û xwe gîhand Xwedayên Yewnaniyan, hinekan jî dibêjin ew ji aliyê gel hatiye avêtin bo Çiyayê Şewatê yê bi navê Etna.

Her çi dibe, ji gelak aliyan ve ev fêylesof hêjayî lêkolîneke mezin û kûr e.

Berî her tiştî taybetiya Empedokles ya ji fêylesofên berî xwe, ev e, ku ji aliyekî ve zanistekî şirûştî ye û ji vê hêlê ve nêzikî Dibistana Mîledî ye, li layê ramanên xwe yên dînî û hizhra bîrnasiya xwe ya di derbarê xwedayan de jî nêzikî Dibistana Elea û Parmenîdesî ye. Lê dîsa girîngiyeke wî ya mezin ew e, ku ew di derbarê madeya ewil ya (arke) gerdûnê de, şoreşekê pêk aniye; hem temamkirina her çar madeyan de û

Institut kurde de Paris

hem jî guheztina wan yekûdu de bi rastî nihêrîneke bihêz pêkaniye ku zanistiya îroyîn gelek jê sûd wergirtiye.

Wekî me berî niha jî gotibû, Thales ji bo arke, peyva "av", Anaxîmenes "as", Herakleîtos jî "ar-agir" bikar anîbû, yanê li gor ji van her fêylesofan yek made-yek arke bû; lê Empedokles got, ku qet yek ji wan bi tenê serê xwe nikare bibe madeya bingehîn ya gerdûnê. Wî jî axê jî xist nav van hersê madeyan û got, ev çar made pêkve madeyên bingehîn in û ev gerdûn bi tevayî ji aliyiyê van herçar madeyan hatiye dagirtin.

Divê em li vê derê tiştekî destnîşan bikin, wekî ku xwendevan jî seh dike, di destpêkê de meyla fêylesofên Yewnanî bi tevayî ser madeyê ye û ew ji xwe re meram dikin ku gerdûn çawa û bi kîjan madeyê ve çêbûye; Thales, Anaxîmadros û Anaxîmenes bi vê hewildanên xwe ve zanistên şirûştî ne û di bingeha hebûnê di gerdûnê de sedemên mîstîk û olî nafikirin û hemî sedem û arke dîsa di nav gerdûnê de ye û hebûnekê ye. Lê piştre (bi Pîsagoras û Dibistana Elea Parmenîdes, Xenofanes û Zenon) hem di şêrovekirina gerdûnê de ji madeparêzî dûrketin çêbû û her tişt bi ramaneke bîrnasî û olî ve hate şêrovekirin. Her çi qas gelek aliyan ve hatibin rexnekirin û nehatibin pejirandin jî, tesîra Dibistana Eleayê gelek berdewam kiriye; heta ew nihêrîna wan ya mîstîk û ramana wan ya bîrnasiyê, piştre li ser fêylesofên materyalîst jî bandorên mezin çêkiriye. Eve Empedokles, Anaxagoras û Demokrîtos ji van in. Ev fêylesofan di şêroveya gerdûnê de xwedî hizreke madeperist in lê ji hin aliyan jî tesîra Dibistana Eleayê jî li ser wan heye.

Empedokles li ser pirsgirêkên hebûna gerdûnê, têkeliya madeyên bingehîn ya di navbera xwe de, taybetiya rojê, hêyiv û stêran çavdêrî kirine û gelek tiştên balkêş jî gotine. Bo mînak ew dibêje, ji rojê tav derdikevin û em di saya wan de tiştên din dibînin. Lê ji bo dîtin ne bi tenê roinahiya ji derve, divê çavê me jî bikaribe bibîne; çavê me dibîne jiber ku ew jî ji agir hatiye çêkirin û çavê me jî hinek ronahî dide der. Jiber vê yekê em dikarin tiştên ji derve bibînin. Dîsa ew îdîa dike ku gelek axên dunyayê berî niha di bin behrê de bûn, lê paşê behir vekişiyan û ax derketin meydanê. Jiber ku ew di gelek çavdêriyên xwe de madeyên wek fosîlên haywanên behrê li serê çiyan de dîtîbûn.

Empedokles dibêje di gerdûnê de nirx û hebûna bingehîn nagûhere (Parmenîdes jî wisa digot) lê tevger heye (Parmenîdes digot ew jî tune ye û li vir Empedokles ji wî vediqete). Jiber ku tevger heye; ev her çar made qet tir car kêm û zêde nebin jî, yanê hejmara hebûna wan ya di gerdûnê her dem eynî bimîne jî; ew di navbera hevde cîh diguherînin û tev digerin. Gerdûn jiber ku ji yekbûn û paşê veqetan van herçar madeyan ava bûye: Lê Empedokles di heman demê de pirsiyar kiriye ku kîjan hêz e, ku van herçar made caran dihîne cem hev û wan dike yek, û kîjan hêz e ku wan ji hev vediqetîne?

Empedokles bersiva vê pirsiyarê dide:

Evîn û Nifret...

Belê evîn ax, av, as, arê dihîne cem hev, nêzikî hev dike û ji wan yeketiyeke gerdûnî ava dike; lê nifret jî wan dîsa ji hev vediqetîne.




Institut kurde de Paris

Dîsa ji layê tibbiye jî Empedokles lêkolînên balkêş kirine û wisa dibêje: Çawa ku gerdûn ji van her çar madeyan ava bûye, her wisa jî însan jî ji van her çar madeyan avabûye; eger di her însan de ev her çar made bi têra xwe û li gel ahenga hevûdu hebin, ew însan zindî ye; lê caran yek ji wan madeyan kêm yan jî zêde dibin, ew çax mirov nexweş dikevin. Bijîşkî jî ji nûve ahengkirina laşê mirov e; yanê kîjan made kêm be ewê bidî, yan jî kîjan made pir be ew ê ji laşê mirov werbigrî, ew mirov ji nûve zindî û tendûrîstî dibe û jiyana xwe berdewam dike.

Heta Empedoklesî, fêylesofan yan bi madeyeke bingehîn yan jî bi sedemeke mûceret dixwestin ku hebûna gerdûnê vebêjin, lê piştî demekê ev vegotin ji bo berfirehkirina mûhayileya mirov ya di derbarê felsefê de têrê nedikir û Empedokles bi vê nihêrîna xwe ya ser hebûna gerdûnê rêya felsefe û şirûştê baştir vekir û heta em dikarin bêjin, ku piştî Empedoklesî fikrên girîng yên di derbarê "atomê" de çêbûn û di vê yekê de tesîra wî gelek e.

Ev bandora Empedoklesî di Anaxagorasî de vegere keşifkirina "her arkeyên, her tiştên ku di Gerdûnê de hene û ew bêhejmar û bêdawî dikarin parçe bibin. Ev rêbaza vegotina *arkeyê* di Demokrîtosî de jî têgeha "atom"ê bîne rojevê.

Institut kurde de Paris



## *Anaxagoras*

*(B.Z. 500-429)*

Ji sê fêylesofên girîng yên dû dibistanên Mîled û Elea yên ku ji gelek aliyan dijhev, yek jî Axagoras e. Herduyên din jî Empedokles û Demokrîtos in. Taybetiya hevbeş ya van hersê fêylesofan ev e ku ew bandoreke mezin ji van herdu dibistanan wergirtin. Ji aliyekî ve ew zanayên xwezayê ne û dixwezin bûyer û bûyînên gerdûnê di nav şertên fizikî de binirxînin, ji vî aliyê ve di bin bandora dibistana Mîledî ne, lê di heman demê de bi taybet Empedokles û Anaxagoras, di tevgera gerdûnê de hêzeke evrayî û dînî hizir dikin û ev jî bandora Parmendîdes e. Demokrîtos, em dê di rûpelên pêş me de bibînin ku di vî warî de ji van herdu fêylesofan cûda rêyekê bişopîne; ew seranser materyalîst e.

Anaxagoras li Anatoliya Rojava li bajaroka Klazomenaî dihête dunyayê. Ji malbateke arîstokrat e û jiber vê yekê jî di nav derfetên berfireh de hatiye perwerde kirin. Di derheqê wî de dihête gotin ku wî hemî derfetên xwe yên dewlemendiyê ji bo rêya zanyariyê xerc kiriye.

Tam di dema pêşkeftina xwe ya warî fêylesofiyê de diçe Atînayê (ku wê demê ev seredan û li wir bicîh bûn ji bo zanayan wek kevneşopiyeke bi nirx bû) û li wir bi cîh dibe. Demeke dirêj têkeliya Anaxagoras û keyserê Atînayê Perîklesî xurt bûye û ev bûye sedem

Institut kurde de Paris

ku Anaxagoras di nav rayedarên dewletê de dewreke mezin bibîne. Li gor dîrokzanan ew mamosteyê gelek rayedarên mezin yên dewletê bûye, heta dihête gotin ku şagirtekî wî jî Sokrates bûye. Jixwe em dê paşê bibînin ku ji gelek aliyan Platon behsa Anaxagoirasî bike û gelek pesnê wî jî bide. Bi rastî jî em dikarin bêjin berî Sokratesî eger çend zanayên mezin û girîng hebin, yek ji wan jî Anaxagoras e.

Di dema Perîklesê de Atîna gelek pêş ketibû. Hêrişên Persiyan hatibûn berteraf kirin, bajar ji nûve dihate avakirin, û Perîkles jî ji bo xweşikkirina bajarî nirxeke mezin dida pêkervanan, hûnermendan û zanistan. Jiber vê yekê jî ji bo Anaxagorasî jî derfeteke mezin ya pêşbirina ramanên xwe yên fêylesofî bi dest ketibû.

Dîsa piştî demekê ew dê li wir hin ramanên xwe di derbarê roj û stêran de aşkere bike û jiber vê jî, ji aliyê dewleta Atînayê bihête darizandin. Heta ew dê ancax bi rev û fîrarbûna ji Atînayê jiyana xwe ji ber xetera mirinê rizgar bike.

Lê tiştê girîng û balkêş ew bû, ku li Atînayê dîn û dewlet di nav hev de bûn; yanê ew Xwedayên ku dihêtin bawerîkirin di heman demê de Xwedayên fermî yên Atînayê bûn. Jiber vê yekê eger kesek rexne yan jî dijberiyeke tund li dij yek ji wan Xwedayan kiriba, ne ku bes jiber bêdînî, di heman demê de jiber bêyasayî û dijdewletî jî dihate darizandin û pir caran ev sûc bi îdam dihate encamkirin. Anaxagoras jî di derbarê Rojê de hizreke xwe ya zanistî anî ser ziman û got "Roj ne Xweda ye, ew bi tenê agir e agir." Û jiber

vê jî hate darizandin û bi tûndî hate sûcdarkirin. Wî jî di dawiyê de fêm kir ku dê bihête kuştin, ji Atînayê revî û xwe rizgar kir. Jiber ku ew "sûcê" ku lê dihate îstînad kirin, sûcekî mezin yê siyasî bû jî û li gor rayedarên dewleta Atînayê, wî hem li dij Xwedayekî mezin û hem jî sîstema siyasî ya dewleta Atînayê binpê kiriye û ev yek heta kaosê dikare berdewam bike. Jixwe di her dewletê de ev yek wek yasayeke nayê gengeşîkirin dihête çespandin; gava yasa û ahenga sîstema dewletê bihête lerzandin, ew sûcê hilweşandina wê dewletê dihête hesibandin, ma îro jî heman tişt ne carî ye!

Anaxagoras dibêje, belê qet tiştekî ji tunebûnê çênabe û qet tiştekî heyî jî tune nabe û guherîneke wisa jî ne bi derfet e. Di gerdûnê de esas li ser vê yasayê hatiye pêkanîn. Di vî warî bandoreke pir mezin ya Parmenîdesî li ser wî heye; Lê ji aliyê din ve jî di gerdûnê de tevger heye. Ev tevger ne hebûn yan jî tunebûna tiştan e, lê ev tevger heye û ev tevger, wekî ku Empedokles jî digot, biyekbûn yan jî jihevveqetana çarhebûnên bingehîn pêk dihat; yanê li gel hev hatina tiştan û dîsa ji hev vetqetanan ve made dihatin çêkirin. Lê Anaxagoras gavekî zêdetir avêt û ev gav di dîroka zanistê de cîhekî mezin wergirt û heta gelek dîrokzanên zanistê dibêjin, Anaxagoras bi aweyekî destpêka kîmyayê pêk aniye. Jiber ku Anaxagoras dibêje, ne çar madeyên bingehîn (av, ax, as, ar), lê di gerdûnê de çi qas tişt hebin ew qas jî madeyên bingehîn (arke) hene; arke ew tişt e ku her heyînên di gerdûnê de di dawiya dawî de tovê xwe ji wî werdigre. Ji bo ku em vê bîrnasiyê fêm bikin, wisa difikire; her heyî eger

Institut kurde de Paris

heta parçeya xwe ya dawî bihête hûrkirin, parçekoka herî biçûk, eve ew tişt arkeya wê heyiyê ye; Empedokles digot ji însan bigre heta her tişt ji çar hebûnan hatiye avakirin; Anaxagoras jî dibêje, naxêr, wek ev her çar hebûnan, bi bêhejmaran hebûnên bingehîn hene û evna ti caran tune nabin, jixwe ji tunebûnê jî nebûne hebûn. Ew hene û heta parçekokên xwe yên dawî jî hûr dibin. Gerçê Demokrîtos seranser navekî lê bike û jê re bêje "atom" lê Axagoras jê re ev nave nedabe jî, wî bîrnasiya atomê fêm kiriye û zaniye; jiber vê yekê Anaxagoras di heman demê de wek despêkerekî zanista kîmyayê dihête hesibandin.

Mezintiyeke Anaxagorasî jî ev e, ku hem ji aliyekî şêroveyeke zanistî li ser hebûn û tevgera heyînên bingehîn yên gerdûnê dike û ev yek bandoreke Herakleîtosî ye û hem jî dibêje di gerdûnê de hebûn û tunebûn wek bûyer naqewimîn, qet tiştekî ji tunebûn nabe hebûn, ji hebûnê jî tune nabe; ev yek jî bandora Parmenîdesî ye. Hemin ew pirsiyar dike ku arkeyên bêdawî yên gerdûnî bi kîjan şeklî yan jî bi hêza kîjan heyînê ve dihêtin berhevkirin yan jî qetandin? Yan jî em wisa pirsiyar bikin, kîjan hêz ev nêzbûn û dûrbûn, yekbûn yan jî qetanê organîze dike? Empedokles ev pirsiyar bi du pêyîv ve şêrove dikir; evîn û nifret. Lê Anaxagoras ji vî warî de jî cûdatir difikire û dibêje; "Belê Xwedayek heye û ev Xweda wek Yasa ye û navê wî jî Nûs e. Ev yasa hemî kaosa vê gerdûnê dikare vegerîne kosmosê, yanê madeyên herî biçûk yên bêdawî bi hêza vê Nûsî ve dihêtin berhevkirin yan jî veqetan.

Anaxagoras ji bo şêrovekirina bi rêya bîransiya Parmedîdes û Herakleîtosî de jî dîsa çareseriyeke ecêb pêk dihîne û wekî ku em bikarin bêjin, ji gelek alyian ve ev herdû feylesofên sedansed dijber di hin nokteyan de dixweze bigîhîne hev. Anaxagoras jî hizra Parmenîdesî qebûl dike û dibêje, rast e; rastiya esil û bingehîn ya gerdûnê (ew parçekoka herî biçûk ya bêhejmar û bêdawî) bi rêya hest û şekirinan nayêtin fêmkirin; hêza sehkirinên mirov têrê vê yekê nake; jiber vê yekê rastî bi bîrnasî û aqil ve dikare bihête şêrovekirin; ew tiştên ku em seh dikin û bi hestên xwe werdigrin, bo mînak, deng, reng, şekil û likdan, sehkirina nermî yan jî hsihkiya tiştan bi tevahî mirov dikarin bixeletînin; lê werkî din jî çareyek me nîne, em mecbûr in ev hêzên xwe bikar bînin; belê ev hêzên me têrê nakin ku em rastiyê bi rastî fêm bikin, nas bikin, lê ev hêzên me dikarin me hinekî hêzikî rastiyê bikin. Em bi dîtin, bi çavdêrîkirin, bi bêhinkirin, bi likdan, bi bihîstin dikarin di derbarê rastiyê de hin pêşzanînan bi dest bixin û bi wan re jî em dikarin rêgeheke bîrnasî û aqilane têxin pêş xwe û lêkolîna xwe ya di derbarê rastiyê de kûrtir bikin. Nexwe bi hestan lêkolîn bi têra xwe me nabe ronahiya rastiyê lê bê wan jî em nikarin dest bi lêgerîna rastiyê bikin.

Wekî dihête zanîn ev yek di heman demê de rêbazeke girîng ya li gel hev anîna raman û rêbazên (rasyonalîzm) hizirperestî û ceribperestiyê (emprîsîzm) ye û di vî warî de em çi qas pesnê Anaxagorasî bikin xwedî maf in.

Anaxagoras, di behsa naveroka hebyînên gerdûnê de, zindî û nezindî, bîrnasiyeke "pro-atomî" dike û

Institut kurde de Paris

wisa dibêje; "Li gel hatin yan jî veqetan çar hebûnên bingehîn tişt nayên fêmkirin; jiber ku her heysî madeya xwe ya ewil heye, bingehîn heye; bo mînak em ji goşt ava dibin, arkeya goştî heye, arkeya xwînê, hestiyê, camê, kevirê, hesinê, penbûyê, welhasilî arke yanê madeya herî biçûk ya her tiştî heye; ew gava bihên cem hev û yekbûneke ava bikin, ew tişt ji aliyê hestên me dihêtin fêmkirin, lê arke bixwe ti caran bi hestên me nayên sehkirin. Em goştî nas dikin, ev yek bi hestên me dihête hasilkirin û em ev car bi rêya aqilî dikarin bikevin nav rêbaza peydakirina arkeya goştî. Yanê hem ceriban din û hem jî rêgeha bîrnasiyê yanê bizava aqilane di gel hev dihêtin bikar anîn û ev yek di heman demê de niha jî wek rêbazeke zanistî dihête pesend kirin.

Di Empedoklesî de yên madeyan ditevdigerîna û wan yek dike yan jî ji hev cûda dike hêza evîn û nefretê bû; jiber ku di ramana Yewaniyan de kevneşopyeke girîng heye ku ew dixwezin her bû û bûyerên di gerdûnê de bi zindîtî, bi berbiçavî bikarin şêrove bikin; tarîfên neronîkirî y anê mûcerret ji bo forma ramankirina fêylesofên Yewnaniyan ne karekî rast bû; belk,î jî jiber vê kevneşopiuya wan e ku felsefe di axên Yewnan de pêş ket. Jiber ku di çandên din de pir caran pirsgirêkeke felsefî êdî gava nehatiba şêrovekirin, yekser bi rêyeke dînî û mîstîk û efsaneyî dihatin pesendkirin û rê li ber hemî gengeşiyan dihate girtin. Lê Yewnaniyan dixwest ku her şêrove bi hizir û berbiçavî bihêtin ronîkirin; jiber vê yekê jî fêylesofên dema Antîk yên Yewnanî hema hema her tişt bi zîndîkirin, biberbiçavkirin çareserkirine.

Anaxagoras jî dibêje; ax bi avê ve bibe yek herî derdikeve meydanê; lê ew bi serê xwe nikare bibe pêkerek yan jî xaniyek; ji bo ku ew bibe xanî yan jî pêkerekê, divê hostayekî xanî yan jî pêkervanek hebe; eve li vê derê Anaxagoras dibêje, Xwedayekî bi navê *Nûs* ku ew eslen ji bo wî wek yasa ye, yasaya oarganîzekirin û sazkirinê ye, heye û ew madeyan saz dike. Lê cûdahiyeke mezin ya Anaxagoras ya ji teolojiya Parmenîdesî heye; ji bo Parmenîdes Xweda di heman demê de aferîner e, yek e, anyê guhertin û bêdawî ye. Anaxagoras di vê derê de guhertinekê dike û jixwe qiyamet wisa derdikeve; ew dibêje, Xweda (Nûs) ne aferîner e, jiber ku qet tiştekî ji nebûnê nabe hebûn, ew bes sazkirin dike, hosta ye, yaniyê çêdike; lê kevir, herî û av jixwe heye. Nûs şekil dide heriyê, heriyê ji nûve naferîne.

Em dê bibînin ku Demokrîtos dijberiyeke mezin bike û vê bîrnasiya sazkirinê serûbin bike.

Institut kurde de Paris



## *Demokrîtos*

*(B.Z. 460-371)*

Em bi rihetî dikarin bêjin, ku Demokrîtos yek ji mezintirîn û girîngtirîn fêylesof û zanayê Serdema Yewnana Kevin e. Ji bo vê peyva me çend delîl û diyardeyên mezin hene. Yek ji wan Demokrîtos di şêrovekirina hebûna gerdûnê û tesbîtkirina madeya destpêkî (arke) de şoreşa yekem ya felsefe û zaniyariyê pêk anî. Jiber ku heta Demokrîtosî çi fêylesofekî nekaribû ev tesbîte bike. Gerçê ji gelek aliyan ve em dikarin bêjin hin fêylesofên wek Anaximendros bi peyva "apeiron", Anaxagoras "madeyên biçûktirîn û bêdawî" nêzikî vê tesbîtê bûbûn jî, yekem car bes Demokrîtos bû ku bingeha heyîneyên di gerdûnê de (zindî yan jî nezindî) wek arke bi navê "atom" bi nav kir û ji wî pê ve ne bi tenê pirsgirêkên ontolojîk yên felsefê de, di heman demê de di derbarî şêroveyên şirûşt û kîmyayî de jî gelek rê û rêbazên vebûn û heta destpêka zanistên xwezayî yên bi pergal û rêkûpêk bi vî şoreşê ve geş bû. Demokrîtos peyva "pom" bi Yewnanî (yanê parçebûn) bi pêvengka neyînî "a" (di zimanê me de "na") lihevanî û têgeheke nû ya zanyarî û felsefê afirand; Atom, yanê parçeya herî biçûk ya tiştekî, ku ew parçe êdî ji wê û pê ve nahête parçekirin. Bi gotineke din, heyîna destpêkî ya her tiştî. Bi rastî jî îro di kîmya ya modern de jî ev peyîv dihête bikaranîn û heta Einstein jî dunya di wê baweriyê de bû ku "atom" nahêtin parçekirin, lê Einstein ev nihêrîn guhert û êdî niha ew jî dihête

Institut Kurde de Paris

parçekirin. Lê nihêrîna Demokrîtos heta Einstein (yanê 2400 sal) li ser fikir û ramana zanyar û fêylesofan de serwerî kir.

Wekî me berî niha jî behis kiribû, fêylesofên dema Dibistana Eleayê yên wek Empedokles, Anaxagiras û Demokrîtos ji aliyekî ve berdewama Dibistana Mîledî ne, lê alyiekî din jî bandoreke mezin ya Dibistana Elea ya ku dijberî Mîledî bû, wergirtibûn. Demokrîtos li gor herduyên din kêmtir bibandor bûye û ji aliyê din ve jî bi helwesteke bingehîn em dikarin bêjin nihêrîna Elayê serûbin kiriye. Demokrîsto jî wek herdu fêylesofan dibêje (ev yek tesîra Dibistana Eleayê ye), heyîneya bingehîn ya gerdûnê bêsînor e, nahête bisînorkirin, war nabe, tune jî nabe, nayê guhertin jî; lê ew (atom) bi sûreteke bêsînor û bêdawî di nav tevgerekê de ye û ev tevger atomê bi atomên din dike yek û caran jî vediqetîne; ev yek wek guherînan li me dihêtin diyarkirin. Di pisgirêka tevgerê de bi aweyî ji herdu fêylesofan jî vediqete: Empedokles tevgera madeyan bi tesîra peyvên evîn û nefret, Axagoras jî bi yasaya evrayî (Xwedayî) ya bi navê "Nûs" ve dida şêrovekirin. Jiber ku çar hebûnên Empedokles û madeyên herî biçûk yên Anaxsagorasî bi serê xwe nedikarin tevbigerin û heyîneyên din ji yekbûna wan teşkîl be, yan jî ev teşkîl bi veqetana wan parçe be. Jiber ku belavbûn kaos, yekbûn kosmosê ava dikir û derbasbûna gerdûnê ji kaos (tevlîhevî) berev kosmos (rêkûpêkî) bi bandora evîn û nifret, yan jî bi yasaya Nûs dihate pêkanîn. Lê Demokrîtos di vê babetê de jî (ku gelek girîng e) şoreşeke din çêkir û got; "Tevgera atoman bi serê xwe ye û qet hêzeke îlahî yan jî evrayî

Institut kurde de Paris

tune ye ku wan atoman bide tevgerkirin. Ew bi tedayeiyeke xwe bi xwe li hev diqelibin û dîsa bi tedayiyeke bilekîs ji hev vediqetin. Ji bo ku vê yekê bide destnîşankirin, ji xwezayê jî mînakên xweşik: Mînak, gava em bederê de dixebitin, bi dirganê ve ka û genimê ku tevlîhev in, berev bayê dihavêjin, jiber ku genim giran di cîhê xwe de dikeve û ka jî jiber hêza bayê berev dûraniya direşe. Piştî demekê em dibînin ku genim di cîhekî de, ka jî di cîhekî din de li hev civiyayî kom bûne. Dîsa ji bo pêlên deryayan yên berev peravên xwe jî ji bo vê mînakê şêrove dike: Pêl ji binê deryayê bi hêzeke mezin berev peravê tev digerin û gava em li peravê behrê dinihêrin, kevirên wek hev, yên biçûk û bi pahn hemî li cem hev civiyayî ne. Tedayiya pêlên deryayê kevirên di nav behrê de jî gava dihîne peravê ev rêkûpêkî xwe dide diyarkirin. Wê çaxê em dikarin bêjin, ku lihevketina atoman û veteqetina wan jî tevgerekê ku ew daîm di nav rêkûpêkiyeke xwe bixwe dihafirînin.

Atom, li gor şekil, deng û reng nahêtin sehkirin, jiber ku ew ewqas biçûk (zerre) ne ku hestên me nikarin wan seh bikin, lê ew gava kom dibin û madeyekê teşkîl dikin, em bi hestên xwe reng, deng, hişk yan jî nermbûna wan seh dikin. Atomên giran berev navdenda mekanê, yên sivik jî berev asîmanê ve hil dikişin. Bo mînak, ax giran e û di navendê de ye, atomên avê jî giran û bi tevger in û ew di ser rûyê erdê de diherikin; lê atomên agir sivik in, alaw û dûyên agirî (hewa) jî berev jorê hildikişin. Arîsto ev bîrnasiya tevgerên madeyê ji Demokrîtos werdigre û bi heman bi vî şeklî bikar dihîne. Jixwe navenda sîstema

zanyariya xwezayê ya Arîstoyî jî li ser vê bîrnasiyê ava dibe û heta Ronesansa Awrûpayê jî ev nihêrîn hikûm dike. Di dîroka zanistiyê de ji vê nihêrîne re *fizîka bi çawatî* (la physique qualitative). Di vê zanistiya xwezayî de vebêjîna bûyer û tiştên xwezayê bi taybetiyên çawayetî dihête pêkanîn. Pirsiyara vê zaniyariyê ya li ser bûyer û tiştan ev bûn: "Kevir çawa ye? Giran e." "Hewa çawa ye? Sar e." Yanê taybetiyên wek giran-sivik, sar-germ, mezin-biçûk, bilind-nizm, xwar-rast ûwd. Lê di fizîka modern de, ku piştî Newton ev zanistî dest pê kir, êdî ev taybetiyên li ser çawatî carî nîn e, li hemberî wê êdî taybetiya qasîtî bû prensîba bingehîn; û ji vê re jî "fizîka qasîtî" (la physique quantitative) dihête gotin. Pirsiyarên vê zaniyariyê jî wisa ne:

"Kevir çi qas giran e? 20 kîlogram e." "Hewa çi qas sar e? Qasî 20 derece sar." Eve em dikarin bêjin destpêka fizîka bi çawatî bi Demokrîtos hatiye destpêkirin lê bi saya Arîstoyî jî ev zanistî bi rêkûpêkî hatiye bi pergal kirin. *Fizîka bi qasîtî* jî bi Newtonî ve dest pê kir û li gel guherînên bingehîn bi Einstein jî hat asta herî bilin ya bi navê *fizîka atoman.*

Bi tesbîta tevgera atoman ya "xwebixwe" Demokrîtos di dîroka felsfê de wek fêylesofekî "materyalîstê atomparêz" dihête binav kirin. Bi rastî jî wek pir navên mezin û bêhempa Demokrîtos ev nav jî heq kiribû.


Demokrîtos dibêje, atom bê deng, bê reng in, sar û germ jî nîn in, jiber ku taybetiya van atoman ancax bi hestên însan yan jî heywanan dihête sehkirin. Ji bo ku dengê atoman divê guhên ku dibihîsin divên, ji bo

Institut kurde de Paris

rengên atoman çavên ku dibînin divên, ji bo sar yan jî germbûna wan laşên zindî yên hîs dikin divên. Lê mezintî û biçûktî ya wan, şeklê wan hene û ew hişk in jî. Jiber ku ew tevdigerin û nayên bi bandor kirin û nahêtin nifûz kirin, tune nabin û nayên afirandin jî; ji bo ku ew tev biherin hêz û ruhekî jî navên; atom di valahiya bêdawî ya cîhûdem (cosmos) tevdigerin.

Demokrîtos bi gotineke xwe ya pir girîng bingeha hin nihêrînên ku di dema nûjenî de wê bibin revaçên felsefê dihavêje; ew dibêje: "Em divê ji lîteratûra xwe ya felsefî de cîh nedin du tiştan; "rastberî û armanc" (coincidence and purpose). Jiber ku ew di gerdûnê de tune ne. Di gerdûnê de ne armanc û ne jî rastberî heye;

Institut kurde de Paris



bi tenê diviyaneke (nécessité) bê giyan û bi tevger heye.

Demokrîtos bi herdu têgehên girîng yên ku ew daye bingeha prensîba gerdûnê (xwezayê), *bêgiyanî* û *bitevgerî* di pêşerojê de wê bibûya prensîbên girîng yên zanistiyên nûdemî; mekanîzm (mécanisme) û determînîzm ji van herdu peyvên dihête avzê bûyîn. Jiber ku Demokrîtos di nihêrîna xwe ya mekanîzmê de cî-

hekî vala di gerdûne de nahêle û jixwe ew dibêje "valahiya *cîhûdem* (feza) bi atoman ve hatiye tijî kirin" û jiber vê ew valahî jî wek heyîneke tijî kirî vedibêje. Jiber ku di cîhûdem de qet valahî tune ye, yan jî em bêjin ew cîhên vala bi yekser bi atomên *bêgiyan û bitevger* dihêtin tijî kirin, nexwe di gerdûnê de her *bûyer û heyî* dibin sedem û encameke bûyer û heyiyeke din. Jiber vê yekê sedem û encam di nav gerdûnê de her dem û heta bêdawî hevûdu dubare dikin; jiber vê jî merceke bo rastberiyê namîne. Eger merceke bo rastberiyê (tesadûfî) nemîne, nexwe di gerdûnê de armanc jî, yanê tevgereke bi giyan jî tune ye; tevger mekanîk e û heta bêdawî wisa dihête berdewamkirin; jiber ku her tevger di navbera du tiştên (atomên) cûda de wek sedem û encam rû dide; bi vî aweyî em dikarin bêjin ku sedem û encam hatine diyardekirin û êdî guhertin û veguheztina wan yan bi layê tesadûfî yan jî bi viyan bes xemgîn û binkeftî dike. Jiber vê yekê mirov di vê jiyanê de çi qas bêdeng, bi aheng û sakîn bijî, pêşî li hemî bengînî û coşiyên xwe bigre ew qas dikare dilşad û bi hizûr bibe.

Taybetiyeke mezin ya Demokrîtos jî ev e; li gor ku em ji kevneşopiyan hîn dibin (Arîsto jî behsê dike) ku Demokrîtos şagirtekî girîng yê Leukîpposê Abderayî bûye û ev fêylesof di sedsala V. ya B.Z. de jiyaye û esil destpêka nihêrîna atomê ya vî mamosteyê Demokrîtosî bûye. Leukîpposî gotiye, ku parçeyên wisa biçûk yên madeyan hene ku mirov ti caran nikare wan bi çavan bibîne, jiber vê yekê divê em wê muxaleya xwe de bidin wênekirin û bifikirin ku zerreyên madeyan bêdawî bêhejmar in. Eve Demokrîtos hemî nihêrîna

Institut kurde de Paris

xwe wek demareke zirav û bingeheke qels ji vî mamosteyê xwe girtiye û ewê pir pêş biriye.

Em dikarin bêjin, ku Demokrîtos di şêrovekirina gerdûnê de hemî sedem û argûmanên olyariyê (teolojî) red kiriye û seranser vegotin û bidelîlkirina berbiçav ya di derbarê bûyer û heyîneyên gerdûnê de, bi taybet di derbarê destpêka tevgerên atoman de şêroveyeke *derolî* (secular) û *tekezdar* (specific), yanê bê bandora ol û bi aweyekî vekirî pêk aniye. Dîsa em ji kevneşopiyan dibihîsin, ku gelek berhem û nivîsên Demokrîtosî hebûne, lê ji ber ku hin desthilatdaran ji wî hez nekiriye û ji ramanên wî yên materyalîst tirsiyane, berhemên wî dane wendakirin; her çi qas nehatibe îsbatkirin jî, jiber em di derbarê Demokrîtosî de gelek tişt dizanin û ew bi xwe jî demeke pir dirêj (a niha jî) li ser dîroka raman û felsefê de bandoreke mezin hîştiye. Demokrîtos fêylesofekî wisa mezin û bi bandor e ku her fêylesofên dû wî re hatine, mecbûr mane ku behsa wî û ramanên wî bikin. Em van zanyariyên di derbarê wî de bi piranî bi vî aweyî hîn dibin.

Di destê me de hin peyvên xweş û afarozmayên bi hêz yên ku di derbarê nihêrîna exlaqî û nirxî de hin agehiyan dide me hene. Ji wan yekê de em dizanin ku Demokrîtos gelparêz e û dixweze mirov di nav rewşeke bidad û azad de bijîn. Bo mînak di nivîseke xwe de wisa dibêje...

Institut kurde de Paris

## *Çend hilbijarde ji Aforîzmayên Demokrîtosî*

*Ew kesên ku çavdêriya zulmê dikin û mudexele nakin, ew ji zaliman bêexlaqtir in.*

*Bizîşk xirabiyên laşê mirov, zana jî xirabiyên giyanî sax dike.*

*Xweza û perwerde nêzikî hev in; jiber ku perwerde mirov diguherîne, pêş dixîne û ev yek dibe sedem ku mirov ji xwe re xwezayeke din biafirîne.*

*Erk dibe sedem ku mirov bêdadî neke. Qe nebe mirov bêdadiya xwe bi nihêrîna erkê ve dikare birawestîne.*

*Yên me dilşad dikin, ne hêzên laşê me û ne jî dewlemendiyên me ne. Yên me dilşad dikin, bes kiryarên dirûstî û xwevêkêşaniyê ne.*

*Yên ku bêdadî dikin, ji yên ku bêdadî dîtine, xemgîntir û bijantir dibin.*

*Eger tu hewil bidî, kesek ku xwe baqil dizane perwerde bikî, baş bizane ku ew dem û keda te hemî vala çûn.*

*Gelek mirov, qet nezanibe jî baqilî çi ye, jiyaneke baqilane dimeşînin.*

*Eger guh bidin gotinên min, eger gotinên min fêm bikin, pir caran ew dê wek mirovên bi şeref tev bigerin û bi vî aweyî ew dê xwe ji gelek kiryarên xirab dûr bikin.*

*Bidestxistina malê dunyayê ne tiştekî xirab e, lê bidestxistina malê dunyayê bi rêya bêdadî, berjêrtirîn xirabî û kesayetî ye.*

*Ajalên baş bi hêza xwe ya laşî diyar dibin, mirovên baş jî bi bilindiya kesayetiya xwe.*

*Nekirina bêdadî tiştekî baş e, lê têrê nake; divê mirov li dij bêdadî jî raweste.*

*Mirov divê bi xeletyên xelkê şa nebe, lê bi xeletiyên xwe xemgîn bibe.*

Institut kurde de Paris


## *Ferhengoka Têgehên Felsefî*

**awe:** form, şekil
**ar :** agir, adir, azer, ader, adir, atesh, fer
**arxwe:** arke, made ewil, cewerê gerdûnê
**bînewarî**: fenomenal, nazarî, görüngüsel
**bînewarnasî:** Fenomenoloji
**bîrdozî**: îdeolojî, faraziye
**bîrkarî:** matematîk, riyaziye
**bîrnasî**: mantik, logik
**bîrperistî** (rasyonalîzm)
**can:** yekbûna jiyan û giyan di heyiyek de
**çavçewsanî:** îllûziyon
**çesbandin**: tatbîq kirin, pratik kirin
**cewer:** tîn, arke, madeya bingehîn
**cîwandarî**: estetîk, felsefeya hûnerî (sanat felsefesi)
**dadwer:** hakim,
**dadyarî:** edalet
**dadyar:** adil
**destnîşankirin**: delîl kirin, îsbatkirin
**dihemberîne**: tekabûl dike
**dîmensazî**: kompozîsyon
**derolî :** sekûlar, bi aweyeyekî dûnyevî, ne ayînî
**desting**: hacêt, wasîte
**diyardekirin**: îqnakirin
**dûalîktî** : diyalektîk
**ewk**: şey
**ezmûnperistî**: emprîsizm
**tişt**: şey
**felsefeya têgehdanetî**: felsefeya konseptûalîzmê
**ferûer :** di ramana Zeradeşt de îdea, tîn, cewer
**ferwerî:** desthilatdarî, serwerî, hikûmdarî, hikmet
**heyînasî** : ontolojî, metafîzîk, felsefeya heyînî, heyîşînasî
**heyînde**: potansiyel
**hizirperistî:** îdealizm

Institut kurde de Paris

**kardiger**: makîne
**kesane:** mûşexas
**madeperistî**: materyalizm
**mafnasî**: hiqûq
**meşkî:** maqûl
**mirin:** veqetana jiyan û giyan di heyiyek de
**mirovbernasî:** antropolojî
**naveperistî**: nomînalîzm
**neronî**: mûceret
**nihêrîngeh**: perspektîv
**nirxenasî**: aksiyolojî, felsefeya nirxan
**ontolojî:** heyînasî
**pêveng**: îlawe
**pêşbirde:** îddîa
**ramyarî:** fikrî, hizrî
**rêkûpêk**: bi sîstem,
**pergal:** sîstem
**rêbaz:** metod
**rêbaznasî :** metodoloji
**ronakdem** : ronesans
**sincdarî:** etîk, felsefeya sincî
**şêlûbîn**: mûceret
**ta-qasî**: guheztina tiştan bi hemnirxê ve
**têgeh:** mefhûm
**tevin**: sazkirina raman û bûyerên fantazî
**xwerindî** : fazîlet
**erdber**: zemîn
**paşkolînasî:** arkeolojî
**tekezdar:** specific, diyarkirî, vekirî
**tevgirîf:** kompleks
**venavkirin:** tarîf kirin
**zanyarnasî**: epîstemoloji
**zelalbîn** mûsbet

Institut kurde de Paris




[18]"At *Jarmo, in what is now Iraq, discovery of an evolution from wild grain to cultivate grain has made it possible to determine that the first known agricultural economy, replacing an older food-gathering economy, appeared in about 8,000 B.C. Archaeologists dated each layer of sediment by the carbon 14 method, assigning an age to each pottery fragment and bone splinter--and even grains of wheat more than ten thousand years old. The inhabitants of Jarmo had inventive minds. In layers dating from 8,000 B.C., archaeologists have found flint chips which seem to have been mounted on wooden handles to form primitive sickles. Thus situating the appearance of the first human civilization in 8,000 B.C. at Jarmo and also at Jericho.*"

The earliest evidence of settlement of **Jericho** on this site is dated (*by radio-carbon tests*) to the **seventh and sixth millennia B.C.**, when a prepottery **Neolithic** town was built there. A strong city wall, mud-brick and stone houses, plastered floors with reed mats, and clay figurines of animals and the *mother goddess* show that the civilization was not crude. Of special

Institut kurde de Paris

## *Berhemên jêderî:*


1. *Dîroka Felsefe (Navê* ***bi Tirkî, Felsefe Tarihi), Macît Gökberg,*** *Remzî Kîtabevi, Sitenbol,*

2. *Di Misir û Mezopotamiyan de Mathematik û* ***Astronomi, (bi Tirkî,*** *Mısır ve Mezopotamyalılarda Matematik ve* ***Astronomi) Prof. Aydin*** *Sayili, Pirtûkxanê Zanîngeha Ziman û Dîrok Ceografî,* ***Enqere***

3. *Tekamûla Felsefê (Navê eslî bi Tûrkî Felsefenin* ***Evrimi), Macît*** *Gökberg, Remzî Kîtabevi, Sitenbol,*

4. *Ferhenga Felsefî (Navê wî yê , bi Tirkî, Felsefe* ***Sözlügü), Orhan*** *Hançerlioglu, Remzî Kîtabevi, Sitenbol,*

5. *Ansiklopediya Fêylesofan (bi Tirkî Filozoflar* ***Ansiklopedisi), Cemil*** *Sena, Remzî Kîtabevi, Sitenbol, cilda 4.*

6. *Ferhenga Dinilîkî-Tirkî, Malmisanij, Wêşanên Deng, 1992, Sitenbol.*

7. *AVESTA 1 Vendidat, Dr. M.Siraç Bilgin, Wêşanên Instîtûta Kurdî, 1996, Köln.*

8. *A History of Science, Cilda 1. Beşa Down of Science û* ***beşa*** *Mesopotania, George Sarton, Weşanên Oxford,* ***London, 1956. (Bi*** *Kurdiya wê, Dîroka Zanistî, cilda 1. Beşa Berbanga Zanistî û Beşa Mezopotmia).*

9. *Zorocaster and History of World. E.E. Hezfeld,* ***Cilda 2., Princeton,*** *1947.*

10. *Ansiklopediya Fêylesofan (bi Tirkî Filozoflar* ***Ansiklopedisi), Cemil*** *Sena, Remzî Kîtabevi, Sitenbol, cilda 4.*

11. *ZendAvesta, cilda 2. ji Ansîklopediya İslamî*

12. *Ansiklopediya Fêylesofan (bi Tirkî, Filozoflar Ansiklopedisi), Cemil Sena, Remzî Kitabevi, Sitenbol, 1976, cilda 4.*

13. *Gotara Prof. Esîn Kahya, ya li ser Aristo û Îbnî Sîna, di Govara Zanîngehê Ziman û Dîrok-Ceografî, Wêşanên eynî zanîngehê, 1991, Enqere. (Navê Govarê bi Tirkî: Dil ve Tarih Cografya Fakültesi Dergisi, 1991, Ankara) AnimalAristo Teles û Qanûn, Îbnî Sîna, ji Erebî bo Tirkî ya wê, ji hêla Prof. Dr. Esîn Kahya hatiye wergerandin.*

14. *Ferhenga Felsefî (Navê eslî, bi Tirkî, Felsefe Sözlügü), Orhan Hançerlioglu, Remzi Kitabevi, Sitenbol, 1984.*

15. *Dialogan 1. Platon, Remzi Kitabevi, Sitenbol. (Navê bi Tirkî, Diyaloglar1), çapa wergera wê ya Tirkî, 1977.*


Institut kurde de Paris

16. *Avzêya Newekheviya di Navbera Mirovan de Jean Jaques Rousseau (Navê pirtûk a bi wergeriya Tirkî: İnsanlar Arasindaki Eşitsizligin Kaynagi) Sitenbol, 1981, çapa yekem.*

17. *Mukadimme - İbni Haldûn*
18. *Bati Felefesi Tarihi*
19. *Meleklerin Küllerinden - Andrew Collins - Avesta Yayınları*
20. *Felsefe Tarihi - Ahmed Cevizci*
21. *Etika-Aristoteles*
22. *Dewlet - Platon*
23. *Xweparêziya Sokrates - Platon*
24. *Also Sprach Zarathustra - Fredrich Nîetzsche*
25. *Kritik der praktischen Vernuft - Immanuel Kant*
26. *Kritik der reinen Vernuft - Immanuel Kant*

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris



Em gaveke din bavêjin; *fêylesofê Kurd Zeradeşt,* yê ku ew di heman demê de yek ji fêylesofên sereke ye û gelek fêylesofên Yewnanî, wek Herakleîtos, Pîsagoras, Demokrîtos, Empedokles ûwd. jê bi bandor bûne û di pirsiyar û bersivên vê mijarê de jê sûd wergirtine. Bo mînak, pirsiyara bingehîn ya wê serdemê ev bû: *Gelo yekemîn heyî ya bingeha gerdûnê avakirî çi ye?* Bersiva Thalesê Miledî *av,* ya Anaxamandros *bêdawîtî*(apeiron), ya Anaxîmenes *as*(hewa), ya Pîsagor û Herakleitos jî *agir* e û di dawiyê de Empedokles *axê* jî dixe nava van madeyan û *her çar heyînên bingehîn* wek madeyên sereta (arke) yên gerdûnê dihêne pesend kirin, di binhega avabûna gerdûnê de çar hebûnên bingehîn hene; *ax, av, as, ar.* Ev dest nîşana girîng ya felsefî bi heman şêweyî, dused sal berî Empedokles, ji aliyê Zeradeşt hatibû vegotin û bibingehkirin. Lê cûdahiyeke girîng hebû: Li gor Zeradeşt ar (agir) yekem aferîner bû û piştî du hezar salan bi teoriya Kant-Laplace ev pêşdîtina mezin ya Zeradeşt bi rêbazeke zanistî hate piştrast kirin.

Institut kurde de Paris

ISBN 978-3-945956-11-3